

HELWEST

Kovara Çand û Edebiyata Kurdî

NEWROZA WE PÎROZ BE!

N
E
W
R
O
Z
A

W
E

P
Î
R
O
Z
B
E



N
E
W
R
O
Z
A

W
E

P
Î
R
O
Z
B
E

NEWROZA WE PÎROZ BE

*Hejmar / No: 3 * * * * Sal / Year : Adar - 1996*

JHELWEST

Kovara Çand û Edebiyata Kurdî

Utgivare

Modern Kultur Förlaget

Xwedî

Weşanên Çanda Nûjen

Ansvarig/Berpirsiyar

Birêvebirê kovarê

Lokman POLAT

REDAKSIYON

N. Zaxûranî

Gabar Çiyan

Dawê Xanê

M. Yilmaz

L. Polat

K. Ronî

Hejmar : 3

Sal / Year : Adar - 1996

Çap : Baran Trykerî

Abonetî

Salok : 170 Kr.

Postgîro : 9 13 31 — 9

ISSN — 1400 - 9404

Berpirsiyariya her nivîsê, ya
nivîskarê/a wê ye.

Navnîşan / Adress:

Tensta Alle 43 - 2tr.

16364 Spånga /Sweden

Tel / Fax:08-7618433

NAVEROK

* 2 - Nameyên xwendevanan

* 5 - Bi xwendevanan ree.....

* 11 - Newroza We Pîroz Bel

* 13 - Edebiyata welatî

* 15 - Romana Kurdî.....

* 17 - Analîza Rexnê -Rohat

* 24 -Edebiyat-N. Zaxûranî

* 30 - Nivîsa Yaşar KEMAL

* 34 - Hevpeyvîn - H. Metê..

* 39 - Edebiyata Kurdî.....

* 42 -Kesên Birûmet-G. Çiyan

* 44 -Du Dîtin..... - L. Polat

* 49 - Nivîskar X. Dihokî....

* 56 - Rastnivîsîna Kurdî.....

60 - 80 -Û Gelek Nivîsên Din.

NAMEYÊN XWENDEVANAN

Ji Kovara HELWESTê re

Min di rojnameya **RONAHÎyê** de anonsa nûhderketina kovara **Helwestê** dît. Bala min kişand. Wek Kurdek, weşanên Kurdî bala min dikşîne. Kovara **Helwest** jî, ji bo ku bi Kurdî ye loma gelek bala min kişand.

Ji bo xebat û xizmeta we ya di hêla çandî û edebî de, ez ji we re sipas dikim. Digel hemû zehmetiyan ji welat gelek dûr bê rawestandin weşandina kovarê karekî hêja ye. Ji bo ku we kovarek weha xwerû bi zimanê Kurdî û kovarek çandî, edebî derxistiye û xistiye xizmeta me xwendevanan ez we pîroz dikim.

Ez pênc (5) sale ku ji bo bîrûbaweriya xwe di zindanê de radizim. Ji bo xwendina girtiyan divê gelek berhem hebin. Di hepisê de xeynê xwendin û nivîsandinê tiştek din nayê kirin. Ji bo wê jî berhem û çavkanî pêwîst e.

Em li gor îmkanên xwe weşanên Kurdî dixwînin. Ji wan gelek feyde dibînin. Ez bawerim ku, hûn dê hemû weşanên xwe (kovar

û pirtûk) ji me re bişeynin.

Di kar û xebata we de serkeftin

Bi silavên biratiyê.

Halîl KAN

Hepisxaneya BURSAyê

Birayê Delal !

Digel pîroziya **HELWEST** û silavên germ re jî, serkeftinê dixwazim. Bo alîkariyê çî ji destên min, bê ez teksîrî nakim, ez dikim. Nivîseke ji bo rexne jî dê hazir bikim.

Medenî / Belçîka

Birêz berpirsiyarê kovara Helwest

Bi dazwaziya ku hûn baş bin, merhaba... Em vê nameyê ji we re ji hepisxaneya Metrîsê dinivîsînin. Em girtiyên doza rêxistina **ÎBDA-C** yê ne. Daxwaza me ev e ku ,em hevûdu binasin. Ji bo vê em dixwazin bibin aboneyê kovara "**HELWEST**". Em rica dikin ku hûn li gor protokolê me bikin abone.

Di qoxûça me de xebata çandî, civakî û hunerî tête kirin. Ji bo vê

Nameyên Xwendevanan

xebata me, dê kovara **Helwestê** ji bo me bibe çavkaniyek û dê gelek feydeyê wê bigihîşe me.

Hejmarên kovarê ku hûn ji me re bişeynin, dê di hepisxaneyê de pirraniya wan yên ku xwendevanên unîversîteyê ne û gelek ji wan jî ji unîversîte mezûn in - 24 kes- dê ji kovara **Helwestê** feyde bibînin.

Em navnîşana xwe li jêrê dinivîsînin. Niha nameya me ewqas e. Em ji niha ve ji we re sipas dikin. Em di kar û xebata we de, ji we re serkeftin dixwazin.

Halis Turan
Hepisxaneya METRÎSê
Qoxûşa IBDA-C yê.

JI KOVARA HELWEST RE

Hevalên hêja!

Min di rojnameya **RONAHÎ** de xwend ku hûn kovareke nû ya bi navê **HELWEST** derdixin. Ez dixwazim bibim aboneyê kovarê. Ji vê yekê ez ji we rica dikim, ku hûn bihayê abonetiyeke yeksalî ji min re binivîsînin, da ku ez kani-bim diravê abonetiye ji we re bişînim. Ez li benda bersîva we dimînim, û silavên herî germ dişînim.

Bimînin di xweşiyê de.

Forrest E. McMunn / Almanya

Ji kovara Helwest re

Hejmara yekem min ji R. Xoce, yê ku li Baselê rudine temîn kir û ez dixwazim abone bibim. Bi keremên xwe ji min re qartên abonê yên kovarê çendêkan bişînin, belkî çendek kesan dika-rim aboneyên Helwestê bikim...

Em li benda hejmara duyemîn in. Bi dil germî, silav.

K. Polat / Swîsre

Hevalên hêja!

Ji kerema xwe re min bikin aboneyê kovara **Helwestê** û ji min re hejmarên ku heta niha derketine bişînin. Ez dê mafê abonetiye ji we re bişînim.

Bi silavên dostaniyê.

K. Îlhan / BERLÎN

Birayên hêja

Piştê gelek silavan, şadiya we ji yezdanê mezin dixwazim. Xeber hate nîk me ku hûn û dostên xwe kovareka çandiya Kurdî diweşînin.

Heger ku hûn bikaribin ji min re kovarê bişînin baş e. Heger kovar bête welat, dê di nav welêt de bête naskirin. Ez pîroziya we di weşana Helwestê de dixwazim.

Herbijîn.

Ehmed Şerîfî / MEHABAD

LÊBORÎN

Xwendevanên delal!

Di her rojname û kovaran de şaşîtiyên teknîkî û teshîhî dibin. Di kovara HELWESTê de jî xeletiyên weha dibin. Carna navê nivîskarên kovarê bi xeletî têne nivîsandin, carna di şûna navekî din de navek din têne nivîsandin. Mirov kontrol jî dike, lê carna hinek xeletiyên nabîne. Piştê ku weşan ji çapxanê derdikeve hêj mirov dibîne ku gelek şaşîtiyên teknîkî û teshîhî hatine kirin. Carna em nivîsê kontrol dikin, lê dawiyê em spartina nivîsê di datayê(kompîtorê) de nakin, nivîs wek xwe, wek berê dimîne.

Di kovara Helwest hejmara duyem de nivîsa ku peyva "Fînt" têde derbas dibû, ji alî me ve hatibû kontrolkirin û rastkirin. Lê di dema mîzanpajê de me dîsa nivîsa berê -a ne kontrolkirî- weşandiye. Me li pêşiya peyva "Fînt" a Swêdî "xweş e" nivîsibû. Di Kurmancî de peyvên "baş e", "xweş e", "xweşik e" cuda tên pêkanîn. "Xweşik" jî bo tiştên zindî têde bi kar anîn, wek keçik xweşik e. "Xweş" jî bo xwarinê têde gotin. Wek mînak; ev xwarin xweş e. Ji bo kovar û pirtûk û rojnameyan dibêjin "baş e".

Di Swêdî de jî weha ye. Mesela "Fînt mat" -Nanê xweş-, Vacker flicka-keçika xweşik-, û "Bra bok"-Pirtûka baş-, têde gotin. Bila xwendevan ji bo şaşîtiyên teknîkî û teshîhî li me biborin, me bibexşin. Divê xwendevan bizanibin, yên ku kovara HELWESTê diweşînin profesyonel nînin, amator in. Di karê amatorî de jî gelek xeletî û çewtî têne kirin. Di hêla rastnivîsê de gelek zehmetiyê me hene. Em yên ku kovara Helwestê diweşînin zimanzan nîn in, em pîsporên ziman nîn in. Di nav Kurdan de jî bûye adet hertiştî li gor pîvana zimanzanîyê dinirxînin. Rexneyên ku têne kirin hemû jî li gor pîvana zimanzanîyê

ye. Di kovarê de dîtînen ku têne pêşkêşkirin, munaqeseyên ku têne kirin nanirxînin. Xeletî û çewtiya van dîtînan nabêjin, rexne nagrin, diçin di nav bîst hezar peyvên de peyvek digrin destê xwe û bi wê peyvê re dileyizin, rexneyan li pêkanîna wê peyvê digirin.

Xwendevanekî me got :

—«Kovara Helwestê bi îdîaya ku ew kovara munaqesê û rexneyê ye derketiye. Ev cesareteke gelek mezin e. Hetanî niha tu kovareke Kurdan bi îdîayeke weha dest bi weşana xwe nekiriye, vê cesaretê nîşan nedaye.»

Ev gotînen xwendevanê me rast in. Lê, xuya dike ku hinek kes dixwazin vê cesareta me bişkinin. Gelek astengiyan derdixin pêşberê me. Ew bi hinek kirînen xwe dixwazin moralê me xirab bikin. A dilê wan (daxwaza wan) ew e ku kovara Helwestê neyê weşandin. Li gor hinekan "xeynê Kurdînivîsa kovarê tu tişteki kovarê yên baş tune ye". Mirov ewqas jî bêînsaf, bêwîjdan nabe. Başî û xirabiya kovara Helwestê li holê ye. Li gor pîvanên hesûdî yên hinek mirovan kovara Helwest baş yan jî xirab nabe.

Ciwanmêrek nivîskar e(!), pirtûk diweşîne, goya bi edebiyatê re mijûl dibe û dibêje: "Weşandina kovara Helwestê pêwîst nîn e". Ma çi pêwîst e? Li cihanê tişteki weha hatiye dîtî (tiştên weha ecêp di nav Kurdan de dibin); hem roman binivîse, bi edebiyatê re mijûl bibe û hem jî bibêje "weşana kovara edebî (Helwest kovara çand û edebiyata Kurdî ye) pêwîst nîn e." Gelo ew kes çi re roman dinivîse? Çawan ku nivîsîn û weşandina romana wî kesî pêwîst e, wisa jî weşandina kovara Helwestê pêwîst e.

Kovara HELWEST

Kovara **HELWEST** hejmara sêyem bi naverokek dewlemend digîhêje destê xwendevanan. Kovara **Helwestê** xwendevanên xwe ditiye. Piraniya xwendevanên wê yên ji derê Swêdê ne. Kovara **Helwest**, li welatên Ewropa (Almanya - Fransa - Belçika - Îsvîçre û yd.) gelek têtê xwendin. Ji Tîrkiyê û Kurdistanê jî gelek name tên û ew jî dixwazin ku em ji wan re kovara **Helwestê** bişînin. Piştê çar hejmarên kovara **Helwestê**, em dê wek cîld(çar hejmar bi hev re di cîldek de) li Stenbolê kovarê biweşînin.

Kovara **Helwest** di hersê perçeyên Kurdistanê de jî hate nasînin. Hinek dost çûn perçên Kurdistanê û kovara **Helwest** ê bi xwe re birin wir. Di Kurdistanê rojhilat, başûr û başûrê rojava de edebiyatêz jî kovarê hayidar bûn. Ji kovarê re dostaniyek baş û biratiyek germîn nîşandan. Gelek name û helbest jî kovarê re rêkirin ku bête weşandin. Em dê nivîskarên hemû perçên Kurdistanê bi berhemên wan ve bidin danasînê.

BI XWENDEVANAN RE

— Hinek agahdarî—

Kovara **Helwest**, ji alî xwendevanan ve baş hate dîtin, hate ecibandin ku loma jî ji heralî ve gelek nameyên xwendevanan ji me re hatin. Di nav nameyan de ya herî balkêş nameyên girtiyên doza Îslamî bû. Ji Hepisxaneyê Bursayê, Metrîsê û ji gelek hepisxaneyên din yên ku ji me re name şiyandin û dostaniya xwe bi kovara **Helwestê** re nîşan dan, em sipas dikin. Ji gelek welatên Ewropayê yên ku ji me re name şiyandin û bun aboneyê kovarê, em ji wan re gelek sipas dikin. Wan bi abonetiya xwe em dilşad kirin. Nameya ku Ehmed Şerîfî ji Mehabadê şiyandibû, me bextiyar kir.

* * * *

Di her hejmara kovara **Helwestê** de xwenûhkirinek heye. Di vê hejmarê de jî, ji alî teknîk, mizampaj, berga kovarê, naverok û di gelek warên din de xwenûhkirin heye. Kovara **Helwestê** xwe naxe nava yek qalibek û hemû hejmarên xwe li gor yek qalibek naweşîne. **Pirrengî** û di **helwestên** çandî û edebî de **pirdengî** jî bo kovara **Helwestê** rêzaniya edebî ya bingehîn e.

* * * *

Em dê danasîna pirtûkan bidomînin. Di vê hejmarê de jî danasîna gelek pirtûkan heye. Pirtûka nemir Osman Sebrî "**Çar Leheng**" pirtûkek gelek baş e. Li ser vê pirtûkê nivîsek danasînê heye. Li ser gelek pirtûkên din jî nivîsên danasînê û analîzên pirtûkan hene.

* * * *

Di hejmara sêyem a kovara **Helwestê** de nivîsên çend nivîskarên nûh hene. Di her hejmarê de nivîskarên nûh bi nivîsên xwe beşdarî nav rûpelên kovarê dibin. Ji bo ku wan

Bi Xwendevanan re

nivîskaran bi kovara **Helwestê** re eleqeyek pozîtîf nîşan dan û nivîsên xwe ji kovarê re şiyandin, em ji wan re sipas dikin. Ji bo hejmarên pêş, em li benda nivîsên wan in. Em wek prensîb, pêşî cih didin nivîsên nivîskarên nûh.

* * * *

Ji bo ku li ser derketina hejmarên kovara **Helwestê** di kovar û rojnameyan de nivîsên danasîna kovarê derketin, piştê van anons û nivîsên li ser kovara **HELWESTê** gelek xwendevanên nûh name şiyandin û daxwaza abonetiye kirin.

* * * *

Di nav weşanên Kurdan de li ser navê mehan yekîtiyek tune ye. Herkê li gor xwe navê mehan cuda dinivîsîne. Hinek weşan navê mehan yên bi zaravayê Soranî û Zazakî bi nav dikin. Em dê navê mehan yên ku di kovara **Hawar û Ronahi** de ji alî Bedir-Xaniyan ve hatine bi nav kirin, bixebitînin. Li gor **C. Bedir-Xan** navê mehan bi Kurdî /Kurmancî/ weha ye:

KURDÎ	TIRKÎ	SWÊDÎ
Kanûna Paşîn	Ocak	January
Sibat	Şubat	February
Adar	Mart	March
Nîsan	Nîsan	April
Gulan	Mayîs	Maj
Hezîran	Hazîran	June
Tirmeh	Temuz	July
Tebax	Agustos	Agust
Îlon	Eylul	September
Çiriya Pêşîn	Ekîm	Oktober
Çiriya Paşîn	Kasim	November
Kanûna Pêşîn	Aralik	Desember

Li gor kovara **Helwestê** ji bo binavkirina mehan, ew navên jorîn rast in, divê hemû weşanên Kurdî van navan binav bikin. Divê di nav Kurdan de di her mijar û babetên cure de yekîtiyek hebe. Di mijarên neteweyî de belawelabûnî ji wekheviya mijarên neteweyî re zîrarê dide.

Bi Xwendevanan re

HELWEST

Kovara Çand û Edebiyata Kurdî

HELWEST

- * Kovara Helwest kovara fêrbûna edebî ye.....
- * Kovara Helwest pêngava munaqêşe û rexneyên edebî ye
- * Kovara Helwest dengê zanîna edebî ye.....
- * Kovara Helwest helwesta îlmî-zanîstî ya çandî û edebî ye.....
- * Kovara Helwest pêngavek e ji pêşvaçûna çand û edebiyata Kurdî re.....
- * Kovara Helwest zanîna, aso ye, fêrbûn e.....
- * Kovara Helwestê bixwînin, bibin abone.....
- * Kovara Helwest hejmara duyem derketî Bixwînin
- * Navnîşana Xwestinê: Tensta Alle 43 - 2tr.
16364 Spanga / Sweden

ji bo jiyana weşana kovara **Helwestê** ji alî xwendevanan ve gelek Pêşniyazên ku naveroka kovarê dewlemend dike tête kirin. Pêşniyarek ew e ku, di her hejmarê de **“Ji Nav Edebiyata Cihanê”** û **“Ji Nav Edebiyata Swêdê”** nivîs hebin. Ev nivîs hem li ser nivîskarên Swêdê û Cihanê bin, jiyana wan bi kurtahî bêt qalkirin û hem jî kurteçîrokek wan bê weşandin. Me di hejmara

Yekem de çîrokek nivîskarê Irlandî Oscar Wild weşandibû. Ji bo zarokan jî em dê kurteçîrok biweşînin. Di vê hejmarê de jî em kurteçîrokek **R. Berström / H. Söderblöm** diweşînin. Kurteçîrokek H. C. Andersen jî di hejmara bê de ye. Di hejmara çarem de, em dê jiyan û nivîskariya Agust Stringberg û kurteçîrokan Hjalmar Söderberg jî biweşînin.

Em dê di her hejmara kovara **Helwestê** de nivîsek ji kovarên Kurdî yên berê (**Jîn, Kurdistan, Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr**) werbigrin û biweşînin. Nivîsên ku em biweşînin dê tenê nivîsên li ser edebiyatê bin. Di vê hejmarê de em nivîsa **Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan “Edebiyata Welatî”** diweşînin. Ev nivîs di kovara **Hawarê** hejmara yekem de derketibû.

Di hejmarên pêş de em dê cîh bidin nivîsên bi zaravayê Zazakî û Soranî jî. Nivîskar û xwendevanên ku bi zazakî û Soranî dinivîstînin bila ji me re nivîs bişeyînin. Em dê li ser nivîskarên beşa Kurdistana Başûr, Rojhilat û Başûrê Rojava jî nivîs binivîstînin, berhemên wan bidin danasînê. Di vê hejmarê de li ser berhemên Şêrzad Hesenî (Ji Kurdistana Başûr) nivîsek heye.

Bi Xwendevanan re

* * * *

Hejmara duyem ji alî naverok / mîzanpaj / teknîkê ve ji hejmara yekem çêtir bû. Gelek xwendevanên kovara **Helwest**ê gotin: “Ev hejmar ji ya berê baştîrê û ji alî naveroka xwe ve ji hejmara yekem dewlemendtir e.” Ji xwe divê her hejmar ji ya çûyî baştir be û ji alî teknîk û naveroka xwe ve jî ji ya berê dewlemendtir be.

Xwendevanekî me got: “Min kovara **Helwest**ê êvarê girt destê xwe û dest bi xwendinê kir, hetanî saet çarê şevê min kovarê xwend.” Xwendevanekî din jî got: “Min kovarê girt destê xwe, nivîsên di têde gelek întresa min kişand ku, min êdî nexwest ku ez kovarê ji destê xwe daynim.” Ev gotin moralek dide me ku em weşana kovarê berdewam bikin û ev gotinên weha dide xuyakirin ku kovara **Helwest**ê xwe dide xwendinê û ji alî xwendevanan ve baş têtê xwendin.

* * * *

Kovara **Helwest**ê ji bo dilê hemû kesan xweş bike dernakeve. Helbet dê hinek kes ji hinek nivîsan û ji hinek nivîskaran aciz bin. Ev jî tiştêkî normal e. Hinek kesên ku ji edebiyatê fêhm nakin, dibêjin çima filan nivîs heye, yan jî çima nivîsên filan nivîskarî heye; lomên xwe bi gotinan diyar dikin. Ji bo ku rewş û mijar baş bê fêmkirin, em dixwazin li vir mînakêk bidin. **Sabah Kara**, berpirsiyarê kovara **NÛBIHAR**ê ye. Di kovara **Nûbihar**ê de gelek nivîsên Kurdî yên mirovên çep, sosyalîst têtê weşandin. Hevalên **Sabah Kara** ji **Sabah Kara** pirs dikin, dibêjin: “Tu çima nivîsên van kesên çep diweşîn?” Ew jî bersîva wan dide, dibêje: “Hûn ji wan baştir binivîstînin, em nivîsên we biweşînin.” Gelek rast e. Gelek kesên ku nikarin bi Kurdî binivîstînin, an jî hetanî nûha qet di tu kovarek de bi Kurdî nivîs neni-visîne, dibêjin “Çima kovara **Helwest**ê cih dide nivîsên filankesî.”

Kovara **Helwest** bi giranî cih dide nivîskarên nûh. Em dixwazin berhemên nivîskarên nûh derbixin ronahiyê. Ji bo vê jî Kovara **Helwest** dizane çi dike. Hewcedariya kovara **Helwest**ê bi şîretên nîvronakbir an jî kesên ne entelektuel tune ye. Ew kesên “siyasî yên cahîl” û bi taybetî jî yên cahîlê edebiyata Kurdî, bila li pey kovara **Helwest**ê dedîqodu nekin. Ew, ewil bila fêr bibin ku siyaseta, kultura û edebiyata çi ye? Hêj li gor wê bipeyivin.

Bi Xwendevanan re

* * * *

Di vê hejmara kovara Helwestê de, di beşa “**Cîhana Nivîskarên Kurd**” de, em nivîskarê Kurdistanê Başûr helbestvanê hevçerx Xelîl Dihokî didin danasînê. Ev beşa “**Cîhana Nivîskarên Kurd**” dê di her hejmarê de berdewam bike. Em dê li ser nivîskarên her çar perçeyên Kurdistanê nivîs binivîsînin, berhemên wan yê edebî bi xwendevanan bidin danasînê. Li ser romana Mehmed Uzun nivîsek Yaşar Kemal heye. Ev nivîs (ku pêşgotina pirtûka Mehmed Uzun ya çapa Tirkî ye) di kovara rojnameya Cumhuriyetê, beşa “**kıtap-Pirtûk**” de hatibû weşandin, me wergerand Kurdî û em di vê hejmarê de diweşînin. Li ser romana “**Bîra Qederê**” jî (ku nûh derketiye) nivîsek danasînê heye.

* * * *

Li ser rewşa edebiyata Kurdî me bi nivîskar **Hesenê Metê** re hevpeyvîn çêkir. Em vê hevpeyvînê diweşînin. Di hejmarên pêşerojê de jî dê weşandina hevpeyvînan berdewam bike.

* * * *

Ji vê hejmarê pê ve, em dê giranî bidin analîzên li ser pirtûkên Kurdî. Li ser gelek pirtûkan dê nivîsên analîzê hebin. Di vê hejmarê de li ser gelek pirtûkan nivîsên analîzê hene, lê dê di hejmarên pêşerojê de nivîsên weha hîn zêde bêne weşandin.

Pirtûkên Kurdî yê ku nûh derbikevin, em dê anonsa nûhderketina wan bikin ku xwendevan bixwazin wan pirtûkên nûh bikin û bixwînin. Kîjan weşanxane pirtûkên nûh weşand divê yekê ji kovara Helwestê re (wek usula protokolê) bişeynin ku em jî îlana /anonsa wê di kovarê de bikin.

* * * *

Me di kovara **Helwestê** de li ser nivîskarên ku bi eslê xwe Kurd in, lê berhemên xwe bi zimanê neteweyên serdest dinivîsînin, berhemên wan aîdê edebiyata Kurdî ne an nîn e muneqşeyek vekiribû. Di hejmarên **Helwestê** yê çûyî de û di vê hejmarê de jî nivîsên li ser vê babetê hene. Vekirina vê munaqşeyê hinek kesan aciz kir. Yê ku aciz bûn vê acizîya xwe bi nivîsên bêsewiye hanîn zimên. Ew kesên ku hetanî niha qet bi zimanê Kurdî pirtûk neweşandine, lê bi tirkî çend

Bi xwendevanan re

pirtûk weşandine, bi hawayekî êrişkarî, aciziya xwe xuya kirin. Nivîsên wan xelet in. Li ser vê babetê divê xwendevan nivîsa *“Du Dîtinên Li Ser Berhemên Edebiyata Kurdî”* bixwînê. Rastî û çewtî di vê nivîsê de bi zimanekî zelal hatiye xuyakirin.

Rexneyên ku di kovara **Helwestê** de hatin weşandin, cihê xwe digirin. Rastiya van rexneyan ji aliyê gelek kesan ve têtê pejirandin. Yên ku rexne li dîtinên wan têtê girtin dikarin bersîvê bidin. Em ê bersîvên wan biweşînin. Lê, divê bersîv li ser dîtinên edebî bin. Em, nivîsên ku kesayetîya mirovan rendîce bike, naweşînin. Divê rexne li dîtinan bê girtin, ne li şexsiyeta mirovan. Di nav me Kurdan de pîvanên rexnegiriyê baş runeniştiye. Divê pîvanên rexnegiriyê baş bête zanîn. Divê ev pîvanên baş û rast, pîvanên îlmî - zanîstî bê fêrkirin û fêmkirin. Di vê hêlê de nivîsa **Rohat Alakom** nivîsek gelek girîng e. Pêşîya mirov rohnî dike.

* * * *

Weşanxaneya Çanda Nûjen bi navê **“Rewşa Edebiyata Kurdî - Bi Nivîskarên Kurd re Hevpeyvîn”** pirtûkek amade dike. Ew nivîskarên ku pirs ji wan re hatine rêkirin û hatanî niha bersîv nedane divê bersîvên xwe bişeynin. Heger ew dixwazin dîtinên wan jî di vê pirtûkê de bête ziman, divê bersîvan bişeynin, na ku naxwazin dîtinên wan di raya giştî de bête zanîn, yan jî heger zanebûna xwe ji xwe re berşê didin û naxwazin kesek din bibe şîrkê zanîstiya wan; heger tiştên ku ew dizanin naxwazin bi xwendevanan re parve bikin, bila bersîvên pirsan neşeynin.

Em sohbeta bi xwendevanan re bi van gotinên rast didin girêdanê. “Mirov kovarê ne tenê ji bo dilê hemû kesan xweş bike derdixê; belkî mirov derdixê da hinek pirsîyaran (pirsîyarên çandî û edebî - K.H.) di serê xwendevanan de çêbike, metîneke xweşxwendin pêşkêşî xwendevanan bike û perspektîfeke nû rabixe ber çavên xwendevanan.” Ji kerema xwe re pêşniyaz û rexneyên xwe ji me re bişeynin.

Xwendevanên hêja û xoşewîst!

Divê hûn li kovara **Helwestê** xwedî derbikevin, kovarê bixwînin, bidin xwendin û ji kovarê re abone bibînin. Bi nivîsên xwe yê edebî kovara **Helwestê** xurt bikin, naveroka wê dewlemend bikin.


Sala we ya nûh û Newroza we pîroz be.

Hetanî hejmara çarem hûn bimînin di xweşiyê de.

Kovara HELWEST

Newroz, li dijî
tedayî, zilmê û
kedxwariyê serhil-
dane. Serpêhatiya
Newrozê bi bîr û
baweriyekê
ramanî, ya li dijî
kedxwarî û zilmê ve
destpêkiriye. Îro jî
eva yeka di destê
gelê Kurd de di
têkoşîna wî de
çekekê girîng e.

Dewletên kolon –
yalîst pêşî li
pêşveçûna civakî,
çandî û lîteratura
neteweyî girtine. Ji
sedsala 20î virda
xurtbûyîn û
pêşveçûna wî ya
civakî û rêkbûyî va,
li herçar perçeyên
Kurdistanê
pîrozkirin û
maneya Newrozê
bi gora mercên
cîhanî ve şîkil û
motîv guhêrandiye
û bûye haletekê
girîng di têkoşîna
netewa Kurd de.



Newroz, cejna netewa Kurd e. Di her 21ê Adarê
de Newroz şahî, xweşî û bihna biharê bi xwe re tîne
serê çîyan û banîyên Kurdistanê... Berf dihele, naser
dihêrikin, dar û devî ping didin. Tov têtê havêtin....
Tovên jîyanê.

Bi hatina rojên Newrozê ve, gelê Kurd jî dikeve nav
haziriya pîrozkirina cejna xwe ya neteweyî. Xwe bi cil
û kincên rengîn ve dixemilînin, tûrên xwe dadigrin û
berbi binetara çîyan diçin... Li ber kaniyên zêlal
kuçikên xwe datînin... Şereşa tarî de jî, agirê
Newrozê vêdixin.

Bi hezaran salan virde bi vî awayî cejna me têtê
pîrozkirin. Usa jî her sal serpêhatiya Newrozê têtê
şîrovekirin û vê roja li dijî zordarî û kedxwariyê
carekê din di nav mêjiyên me de cîh digre.

Cejna Newrozê di dîroka Kurdan de roleke girîng
dilîze. Serpêhatiya Newrozê, li dijî zilm, zordarî û
kedxwariyê derketine... Nîrê zilma Dehaqê xwînmij
şikestî e. Dawî li rojên reş û tarî hatine. Hatina
rojên ronak û rehetiyê ye. Bo vê yekê ye ku 2600
salan virda bi gelêrî tê pîrozkirin.

NEWROZA WE PÎROZ BE!

Agirê Newrozê bûye nîşana têkoşîna gelê me. Ciyê Newrozê di têkoşîna netewa Kurd de gelek girîng e. Gelê Kurd cejna xwe ya neteweyî ya dîrokî da jiyânê heta îro.

TRADÎSIYONEKÎ PÊŞVERÛ

Cejna Newrozê edet û çandekê pêşverûye. Bingeha wê ya civakî gelek fireh e. Ji destpêka Newrozê virde gelek barbar, êrişker, êl, eşîr û talankeran ser gelê me da girtine. Lê tu qewetek nikaribû vê agirî di dilê gelê me de xarbike... Bî hezaran salan şûnda, gelê me ol(dîn) guhêrand. Ev bawerîya manevî jî, şikil û motîvên Newrozê nikaribûn bide guhêrandin. Ji ber ku, eva yeka li ser mêjiyê xelkê me hatiye kolandin. Ketiye nav xwîna me, bûye beşek ji çanda me.

Ola Îslamê gelek edetên paşverû jî bi xwe re aniye nav civaka Kurd. Wî, jinan û qîzan(keçan) kiriye bin şalan, pêwendiyên wan bi mêran re qedexe kiriye. Lê edeta Newrozê, vî sînorî jî hilweşandiye. Bi hatina 21ê Adarê ve, keç û xort, jin û mêr, kal û zarok bi giştî derketine bindarûkê, bi xwarin û vexwarin, govend û reqas, stran û kilaman ve cejna xwe û destpêka nûbiharê bi şahî û şênahî pîroz kirine û hên jî dikin...

Newroz, li dijî tedayî, zilmê û kedxwariyê serhildane. Serpêhatiya Newrozê bi bîr û baweriyekê ramanî, ya li dijî kedxwarî û zilmê ve destpêkiriye. Îro jî eva yeka di destê gelê Kurd de di têkoşîna wî de çekekê girîng e. Dewletên kolonyalist pêşî li pêşveçûna civakî, çandî û lîteratura neteweyî girtine. Ji sedsala 20î virde xurtbûyîn û pêşveçûna wî ya civakî û rêkbûyî va, li herçar perçeyên Kurdistanê pîrozkirin û maneya Newrozê bi gora mercên cîhanî ve şikil û motîv guhêrandiye û bûye haletekê girîng di têkoşîna netewa Kurd de. Êdî di herçar perçeyên Kurdistanê de, Newroz, bi destê hêzên netewa Kurd, li serê çîyan, gundan û salonên bajaran de, bi giraniya xebat û propaganda rêzanî ve tete pîrozkirin.

Ey Newroz, ey Newroz

Bijî cejna azadî

Bi xêr û gelek pîroz!

XWENDEVANÊN EZÎZ Û XOŞEWÎST, NEWROZA WE PÎROZ BE!

Kovara HELWEST

EDEBIYATA WELATÎ

Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan

Edebiyata welatî, ew edebiyat e ku ji jîna mîletî, ji hîş û dilê wî, ji dîrok û çîrçîrokên wî, ji stran û laje yên wî hiltêt.

Kantîya wî, dilê mîlet, hîş û heyata wî ye.

Tinê ev edebiyat e, ku germ, rengîn, bibihn û xwedan ruhnahtî ye.

Ji vê edebiyatê, dengê bilûr û dilanê, stranên çiyê, zîziya hevîn û hejkirinê bi teptepa dilan ve tîn bihîstin.

Piraniya mîletan pirçar vê rastiyê seh ne dikirin, ber ne diketin.

Lî Ewropayê, mîletin hebûn ku hej zimanên xwe nedikirin. Zimanên xwe biçûk, teng, nespehî û nehêja ditîtin.

Ev hal di welatên Rôhelatî de jî dihat ditîn.

Herwekî di nav Kurdan de, heçî mirovên zana radibûn kitêbên xwe ne bi zimanê Kurdî lê bi zimanê biyaniyan dinivîsandin.

Pîştî xebata sedan salan, di welatên Ewropa û Rôhelat de hate seh kirin ku ev rê dernakeve û ev awa naçe serî.

Çi ku mîlet ji wan kitêban re guh ne dida û xebata wan mirovan berxudar nedibûn. Ber vê yekê ev mirovên ha vegehiyan ser zimanên xwe. Vêca xebata wan zûka berên xwe dan û mîlet pey edebiyata wan çû.

Bi vî awayî di nav mîletan de edebiyateke geş û zendî çar bû.

Êdin her kes zana, nezana, bajarî, gundî ku xwendinê zanî

Edebiyata welatî - K. A. Bedir - Xan

be, zimanê wan seh dikirin û
kitêbên wan dixwendin.

Ji xwe welê ji diviya bû.

Ji ber ku ji nivîsandin û be-
lavkirina kitêban qesd ew e ku
hiş û fikrên qenc bikevin nav
xelkî, di dil û serên wan de cih
bigirin.

Ji mesela zimanî pêve mesele-
ke din ji heye.

Herwekî nas e, fikr û his di
dora zimanî de digehînin hev,
û her ziman fikr û hisên xwe û
awayê gotina xwe bi xwe re
hildigire û ew pê re diguhêzin,
û pey zimanên xwe dikevin.

Bi vî awayî digel zimanî fikr
û hisên biyaniyan ji tîr dike-
vin nav me, di dil û hişê me de
cih digirin, û rû û gonê me ên
manewî diguhêrînin,
dihêşînin.

Paşî vê gotinê, qesda me,
awayê edebiyata me ji xwe têt
sehkirin, û ew riya ku tê re

dixwazin herin bi xwe vedibe û
dikeve pêşiya me.

Vêca divêt ku em bi zimanê
dê û bavên xwe, bi zimanê şîrîn
û delal, bi zimanê Kurdî, bi
Kurdiya xwerû binivîstin, û
fikir û hisên xwe ji çîrok û
stranên Kurdî bigirin.

Ji xwe Ehmedê Xanî berê
sêsed saltî vê riye ji me re vekirî
bû. Lê heyf paşiyên wî pê ve ne
gûn.

Xanî xurtiya zimanê xwe
hêj wê gavê hesiya bû, û ji wan
re ku pê ne dinivîsandin bi
beyta jêrîn dixwest bide zanîn.

“Saqî şemirand vexwar durdî
Mawendi - derî lisani- Kurdî”

Êdin çax e, ku em bidin pey
Xanî.

Têbînt: Me vê nivîsê ji kovara
Hawar hejmara yekem wergirt.

EDEBÎYATA KU JI BO KURDAN TÊ NIVÎSANDIN DIVÊ KURDÎ BE

Divê nivîskarên Kurd hîn pirtir cehd bikin ku edebiyata
Kurdî dewlemend bikin. Xwendevanên Kurd jî divê pirtûkên
Kurdî bistînin û bixwînin.

Lokman POŞAT

Di van demên dawî de edebiyata Kurdî a nivîskî gelek pêşve çûye. Heger ev pêşveçûyîn weha berdewam bike, dê rewşa edebiyata Kurdî a nivîskî gelek baş bibe. Di van çend salên dawî de gelek berhemên edebî yên nivîskî hatin weşandinê. Nivîskarên Kurd bi dehan pirtûkên roman û kurteçîrokên Kurdî afirandin. Di hêla afirandin û weşandina berhemên romana Kurdî de qelsiyek hebû, lê nûha gelek romanên nûh têne weşandinê. Bi saya romannivîsê hemdem Mehmed Uzun û romannivîsên kurd yên nû romana Kurdî jî berbîpêş ve diçe. Rewşa edebiyata Kurdî a nivîskî ya îro jî doh baştir e, sibê jî dê ji îro baştir be.

Divê romana Kurdî bi Kurdî bê nivîsandin. Edebiyata ku ji bo Kurdan tê nivîsandin divê Kurdî be. Ger Kurdî nebe ew berhemên edebî di nav edebiyata Kurdî de nayê hesibandin.

Nivîskarên ku bi eslê xwe Kurd in, lê berhemên xwe bi zimanê neteweyên serdest dinivîsînin ku li eslê xwe xwedî derdikevin, li nasnameya xwe ya Kurdî xwedî derdikevin tiştekî baş e. Lê hinek nivîskarên ku bi eslê xwe Kurd in hene qet li nasnameya xwe xwedî dernakevin, bi her awayî asîmîle bûne û heliyane, divê mirov bi çavekî baş liwan mêze neke. Cemal sureya bi eslê xwe Kurd bu lê li Kurdîtiya xwe qet xweyî derneket, beriya ku bimirê îtiraf kir ku ew jî Kurd e. Neteweya Kurd jî mirovê weha tu feydek nedîtiye û nabîne jî. Lê hinek hene, asîmîle bûne, bi Kurdî nizanin lê di berhemên xwe de li ser doza Kurd û Kurdistanê disekinin, ev baş in, lê dîsa jî berhemên wan berhemên edebiyata Kurdî nîn in. Piraniya van nivîskarên bi eslê xwe Kurd ku tirkî dinivîsînin, digel zimanê tirkî hendiktir zimanekî din (Îngilîzî, Fransî, Almanî) jî dizanin, lê çi heyf Kurdî nizanin û xwe fêrê kurdî nakin. Ez bi xwe berhemên van nivîskarên weha di nav edebiyata Kurdî de nahe-sibînim. Lê wek ku heval M. Şîlan di rojnameya ROJê de nivîsandibû, mirov jî

Romana Kurdî divê bi Kurdî be

berhemên wan re dikare bibêje ew berhemên edebiyata Kurdistanê ne. Wek tete zanîn li Kurdistanê derveyî neteweya Kurd gelek xelkên eqaliyet hene. Ji wan xelkan yek bi zimanê xwe berhem biafrîne, mirov ji wê berhemê re dikare bibêje ev berhema edebiyata Kurdistanê ye. Tebî ev tişt jî hêj di serê min de rohnî û zelal nîn e, ji bo min babeta munaqeseyê ye. Dibe ku ev dîtina jî şaş be. Ez hêj li ser vê dîtinê bi dûr û kûr nefikiriya me. Hinek nivîskarên ku bi eslê xwe Kurd in, lê bi tirkî dinivîsînin li ser vê meselê dîtinên cuda tînin zimên. Nivîskar Yilmaz Odabaşı dibêje “Em şairên tirk nînin, yên Tirkîyê ne. Berhemên me edebiyata Tirk nîne, edebiyata Tirkîyê ye.” Bi dîtina min, ev dîtina Yilmaz Odabaşı xelet e. Heger weha be dîtina M. Şilan hîn rastir e. Nivîskarê bi eslê xwe Kurd, Alî Bîçer hemû helbestên xwe bi tirkî dinivîsîne û îdîa dike ku berhemên wî aidê edebiyata Kurdî ye. Yên ku en pirr bi nivîskî van munaqesên dike jî helbestvan Alî Bîçer e. Hinek tişt bi zorê û bi pir gotinê nabe. Alî Bîçer çiqas bixwaze jî nikarê bide qebûlîkirin û îspatîkirin ku berhemên wî yên tirkî, berhemên edebiyata Kurdî ne.

Berhemên nivîskarên Kurd yên nûh gelek baş in. Ev nivîskarên Kurd yên nûh jî bo pêşketin û xurtbûna edebiyata Kurdî kar û xebatên gelek hêja dikin. A muhîm jî ev e ku ev nivîskarên nûh xwerû bi zimanê Kurdî dinivîsînin, ev tiştêkî gelek girîng e. Ji xwe gelek nivîskarên Kurd yên ku xwerû bi Kurdî dinivîsînin nivîskarên Kurd yên nû ne.

Di nav romanên Kurdî de romanên modern hene. Romanên Mehmed Uzun romanên modern in. Her çiqas hinek romanên wî jî alî naveroka xwe ve li ser bûyerên dîrokî hatine avakirin jî, teknîk û metoda nivîsandina romanên Mehmed Uzun modern e. Romana Sîya Evîne li gor metoda romanên modern hatiye nivîsandin. Di nav romanên Kurdî de post-modernîst roman tune ne. Post-modernîzm realîzmê qebûl nake. Nivîskarên Kurd bi piranî di şopa realîzmê de ne. Post-modernîst durê polîtîkayê ne. Nivîskarên Kurd bi piranî di nav polîtîkayê de heşir-neşir in. Bi kurtahî meyldariyekî xurt jî bo post-modernîzmê di nav nivîskarên Kurd de nexuyaye. Ji pirtûka Hesenê Metê “Labîrenta Cinan” re mirov dikare bibêje roman. Hesenê Metê jî bo vê pirtûka xwe “Novel - Çîrok” dibêje. Lê li gor min, Ahmed Tewfik û Rohat Alakom ev pirtûk roman e.

Di dema me de rewşa çîrok û helbestên Kurdî gelek baş e. Ji rewşa romana Kurdî baştir e. Yên ku bi Kurdî roman dinivîsînin gelek kêr in, hendik in. Lê yên ku çîrok û helbestên Kurdî dinivîsînin pir in, gelek in.

Divê nivîskarên Kurd hîn pirtir cehd bikin ku edebiyata Kurdî dewlemend bikin. Xwendevanên Kurd jî divê pirtûkên Kurdî bistînin û bixwînin. 

DI EDEBIYATA KURDÎ

DE REXNE (*)

Rohat ALAKOM

Peyva **rexne** di zimanê Kurdî de gelek tê bi kar anîn, ne tenê di warê edebiyatê de, wisan jî di warê polîtîk û zimanê rojane de jî tê bi kar anîn. Rexne çi ye? Karê lêkolîna dîtina aliyên rast û nerast yên mirovan, berhe-man û babetan e. Di jiyana rojane de rexne bûye nîşana kêmasî û xeletiy-an, wisan şaş hatiye fêhm kirin ku, gelek caran em dibînin ku peyva rexne û kêmasî-xeletiyê ketine zikê hev, ji hev nayên cudakirin, dema em dibêjin rewşa filankesê gelek krîtîk e, mirov fam dike ku rewşa wî nebaş e, peyva rexne (krîtîk) li vira bûye nîşana xirabiyê, ne tenê Kurd, di zimanên biyanî de jî ev forma tê bi kar anîn. Lê belê rexne bi vê zîhniyeta “**xeletûdîtin**”ê ve pêwendiyên wê qet tune ne. Ji aliyê din rexneyên edebî bi serê xwe hunerek e, meslekek e, teoriyên wê hene, di hin cîhan de wek ders di beşên filolojî û edebiyatê de tên xwendin jî.

Berî ku em derbasî babeta rexne û rexnegirîyê bibin, divê em li ser peyva rexne û etîmolojiya wê piçekî bisekinin. Di zimanê rojane de em gelek caran rastî peyva rexne tên, mirov dikare bibêje ku êdî vê peyvê di zimanê Kurdî de cih girtiye. Dema rexne tên kirin, piştî vê yekê derheqê van rexneyan de îfadeyên gelek cuda tên gotin, çend vegotinok, îdiyom, fraz jî peyda bûne, ji bo **frazelociya Kurdî** ev materiyalan gelek balkêş in û hêjayî lêkolînê ne, wek:

—Rexneyên vik-valan!

—Rexneyên bêmanê!

—Di cihê xwe de rûniştîye, tenê rexnan dike (armchair critic)

—Filankes rexnan re vekiriye (an jî girtiye)

—Filankes ji rexnan direve

—Rexneyên pozîtîf, rexneyên negatîf

—Rexneyên konstruktîf, rexneyên destrûktîf

—Rexneyên qenc, rexneyên xirab

DI EDEBIYATA KURDÎ DE REXNE

Dema civînekê de zêde rexne tên kirin, civîn dirêj dibe, piştî civînê ji bo ku aciziya xwe nîşan bidin, beşdarek ji yekî din re dikare bibêje: **“Kurd ji rexnan çiqas hez dikin”**... Wek van mîsalan çawa em dibînin, peyva rexne di zimanê rojane de têra xwe tê bikar anîn.

II

Piştî vê destpêkê êdî em dikarin li ser termînologiya peyva **rexne** bisekinin. Peyva rexne ji zimanê Farisiya kevn hatiye ketiye zimanê kurdî û tê maneya vekirin, qûl, qelîşte, wek vekirina pencerekê jî mirov dikare îzah bike. Angorî vê peyvê kesê ku rexnan dike, ji wan re jî **rexnegir** tê gotin. Dema mirov bikaranîna peyva rexne ya îroyîn û vê maneya wê ya kevn hemberî hev dike, muqayese dike, mirov dibîne ku ne wek hev in, lê belê mantikek jî heye. Di her zimanî de wusa ye, dema peyvek ji zimanekî mayîn tê deyn kirin, dikeve zimanekî mayîn maneya xwe ya pêşîn winda dike, maneyeke nû distîne, kincên nû xwe dike, diguhire. Ev yeka han kontaktên navbera zimanan de prosesêke normal e. Lê belê di zimanê Farisî de ev peyva îro zêde nayê bi kar anîn, li cîhê wê peyva **“intîqat”** tê bi kar anîn, ji Erebî hatiye ketiye zimanê Farisî, Ereb bi xwe **“neqd”**, **“neqdê edebî”** dibêjin. Ev peyva ketiye zimanê Osmanî û formeke nû stendiye: **Tenkîd**, îro jî carcar di zimanê Tirkî de tê bi kar anîn. Di tekstên Kurdî yên kevn de jî, bi maneya rexne, em rastê peyva **tenkîd** tên.

Di piraniya zimanê Ewrûpî de bi giştî li cîhê rexne peyva **krîtîk** tê bi kar anîn (fra.critique) û tê maneya **“hunera nirxandinê, bîryardayînê”**. Lê belê ji bo rexneya edebî rewş diguhire. Dema mirov behsa rexneya edebî dike, berhemek nû tê bîra mirovan, li ser wê nivîsîna rexneyekê tê fam kirin, êdî termînologî jî diguhire. Ev rexneyan wek nûçekê li ser berhemê xwendevanan agahdar dikin, ev berhema dikare filmek be jî, perçeyekî tiyatroyê be jî.... Ji bo rexneyên edebî û nû di zimanê Îngîlîzî de peyva **“review”**, di Almanî de **“rezension”** tê bi kar anîn, eger pirtûk be peyva **“pirtûk”** jî tê pêşiya peyva rexne. Hem Îngîlîzî de, hem jî Almanî de çawa em dibînin ev peyvan ji du perçeyan pêk hatine (**re + view**, **re + zension**) û herdu peyva de jî pêşpirtika **re-** hevbeş e ku tê maneya **“ji nû ve”**, ango **“dîtinên nû”**, **“lêkolînên nû”**... Di peyva Almanî de pirtika-**zension** di eslê xwe de tê maneya lênêrîn û lêkolînê.

DI EDEBIYATA KURDÎ DE REXNE

Peyva **sansur** ji wir tê. Di medyayê de, di kovar û rojnameyan de weşîna wan jî, nîşana nûbûna wan e. Rexneyên edebî li ser berhemên ku berê hatine çap kirin jî, dikarin bên nivîsîn, lê belê hem ji aliyê neaktuelbûna xwe, hem jî, ji aliyê firehbûna xwe ji **“review”** û **“rezension”** ê cudatir in. Di zimanê Îngîlîzî de ji bo maneya fireh peyva **criticism** tê bi kar anîn. Di zimanê Kurdî de car caran em di kovar û rojnameyan de rastî îfadeyên **“danasîna pirtûkan”**, **“weşanên nû”** tînin yê ku maneya yekemîn îfade dikin. Di zaravê Soranî de hin caran peyva **“ranan”** tê bi kar anîn, tê maneya raxistin û pêşkêşkirina berhemên nû.

III

Bi alîkariya rexneyên edebî mirov aliyên baş û nebaş yê berheman dibîne, paşê wek nivîs pêşkêşî xwendevanan dike. Tenê evqas e karê rexnegir? Naxêr! Cîhê rexne û rexnegir angorî mekanîzmakê hatiye kifş kirin. Perçeyên vê mekanîzmê çi ne?

CIVAT: Her nivîskarekî Kurd wek nivîskarên cîhanî endamê civata xwe ne. Çi ne rûçikên civata Kurd? Civata Kurd civateke Rohilatê ye, civateke feodal-eşîr e, bandora axa, beg, şêxan zêde ye, civateke bindest e, civateke erd, axa wê bê îrada wê hatiye parevekirin. Zimanê civatê hatiye qedexe kirin, îmkana pêşketina edebiyata civatê hatiye bend kirin, pêşî lê hatiye girtin. Nivîskar berhema xwe wek neynikekê li civatê vedigerîne, malzeme û materiyalên xwe ji nav civatê berev dike.

NIVÎSKAR: Di kovar û rojnameyên Kurdî de gelek caran nivîskar bi xwe dibe hedefê rexneyan, ew tê rexnekirin. Ev rexneyan gelek caran jî, ji sînorên rexneyan derdikevin, dibin nivîsên protesto, êriş û şer, ew zîhniyeta **“polemos”** di dawiyê de, dibe sedemên polemîkên neçê. Êdî sînorên rexneyan her diçin ziravtir dibin û winda dibin. Ev nivîsên ku nivîskar îhbar dikin, înkâr û îdam dikin, êdî mirov nikare di nav rexneyan de bihesibîne.

Rexnegir divê ji nivîskar zêtir, berhemê bide ber çavan, wê rexne bike, materyalê rexneyê yê bingehîn berhem e. Bi kurtî rexne, ne **hîcviye** ye, ne jî **methiye** ye, rexne ji nû ve afirandina berhemekê ye. Nivîskar û rex-

DI EDEBIYATA KURDÎ DE REXNE

negir du kesên ne dostê hev in, du kesên ne dijminê hev in, ew bi saya berhemê nasiya xwe didin hev.

Nivîskar, dema rexneke edebî amade dike, dikare ji nivîskar îstîfade bike, jiyîna wî, hîsên wî, mijûliyên wî dikarin gelekî alîkariya rexnegir bikin. Pêwendiyên nivîskar û rexnegir bê ku hev bibînin, dikarin gelek fireh bin.

Ji aliyê din nivîskar ji ber ku mirovek e, mirovbûna wî û nivîskariya wî jî bûye babeta raberzîn û rexneyan, wek mîsal raberzînen li ser Yaşar Kemal. Îro çawa em dibînin du Yaşar Kemal peydabûne **“nivîskar Yaşar Kemal”** û **“mîrov Yaşar Kemal”**, carcar ji hev tên cuda kirin. Angorî rexnegiran **“mîrov Yaşar Kemal”** ewqas negirîng e, berhemên wî ji bo rexnegiran pîvan e, di jiyîna xwe ya rojane de li ser Kurdan çi gotiye, çi negotiye ne ji hêjabûna berhemên wî tiştekî winda nake, ne jî tiştekî li ser berheman tiştekî zêde dike. Em wek welatparêz, wek patrîot dixwazin, Yaşar Kemal ji doza Kurdan re bibe alîkar, ev daxwazeke polîtîk e, daxwazeke edebî nîne.

Angorî ulmdaran rexneyên derheqa jiyîna nivîskar ya şexsî ewqas giring nînin, berhem giringtirin e, wek mîsal nivîskarekî zêde vedixwe, rexneyên edebî de nikare bibe pîvanekê, jiyîna nivîskarê Swêdî **August Strinberg** jiyîneke demekê bi krîzên psîkolojîk ve derbas bûye (berhema **Inferno**: cehennem, kendal), lê belê vê yekê li ser berhemên wî roleke ewqas mezin nelîstîye-jiyîna nivîskaran bi xwe dem dem dibin babeta raberzînan.

BERHEM: Piraniya kesên ku li ser rexneyan, tezên rexneyan lêkolîn kirine, di hunera rexnegiriyê de hebûna berhemê pîvaneke bingeîn hesibandine. Lê belê hem rexneyên Kurdî de, hem jî rexneyên neteweyên mayîn de bawerî û dîtînen ji hev cuda peyda bûne. Gelo babeta naveroka berhemê an jî berhem çawa hatiye nivîsîn zêtir girîngtir e. Berhema pîrsa yekemîn tezên **“dinya der”** û **“dinya nivîskar ya hundirîn”** ve girêdayî ye, civat û nivîskar wek du hêzên dijî hev hatine hesibandin. Li alîkî rexneyên civakî, dîrokî û rexneyên Marksîst, li aliyê din tezên **rexneyên avîtûnderva** (expressionism). Bersîva pîrsa duwemîn pîrsa estetîkê ye, avakirin, sazûn û hunera edebî ya berhemê ve girêdayî ye. Ziman û îfadekirina bûyer û hîsan ji naveroka berhemê girîngtir e. Di nav Kurdan

DI EDEBIYATA KURDÎ DE REXNE

de peydabûna raberzînên etîmologiyê rabûneke nû ye, **etîmologiya populer** di nav Kurdan de gelek pêşve çûye. Ev yeka jî zêdetir bi parastina çand û zimanê xwe ve girêdayî ye, dijîderketin û reaksiyoneke etnîkî ye. Zimanê berhemê gelek caran dibe babeta sohbetan an jî “rexneyên devkî”.

MEDYA: Hebûna medyayê, rojname, kovar, radiyo û televîzyonê di pêwendiyên navbera berhem û xwendevanan de roleke mezin dilîze. Cîhê medyayê mirov dikare bêje li pêşya rexnegir e. Ji bo ku medya tune be, rexnegir xwe nikare bighîne xwendevanan. Bi taybetî weşan krîterekî gelek mezin e, her rexneyek nûçek e, eger ev medya tune be, tora medyayê tune be, nûçe nahekin, nameşin, belav nabin, kanalên ragihandinê (komûnikasyonê) qut dibin an jî tîn xitimandinê. Telûka herî mezin ev yeka ye. Di pratîka Kurdan de ev telûka hebûna xwe îro jî diparêze. Rojname û kovarên ku di dema xwe digêjin 30 mîlyon Kurdan, tune ne, ne bi giştî, ne jî di her perçekî Kurdistanê de jî ev mekanîzman tu nin, li Ewrûpê jî weşaneke rojane an jî hefteyî tune ye. Wê çaxê rexnegir dê xwe çawa bighîne xwendevanan? Televîzyona Med-TV di vî warî de dikare roleke mezin bilîze.

REXNEGIR: Rexne ji nû ve afirandina berhemê ye. Angorî Terry Eaglaton rexne afirandina berhemê ya duwemîn e, berhem bi alîkariya rexnegir cara duwemîn tê afirandin. Derketina her berhemekê bi serê xwe “**bûyereke edebî**” ye. Xwendevanê herî pêşîn rexnegir e ku derketina berhemekê bi çavekî rexnegirî dide bihîstin û tevî raberzînan dibe, xwendevanan agahdar dike. Ji ber vê yekê jî rexnegir roleke gelek mezin dilîze. Kêmasî, xeletî, valahiyên berhemê dibîne û berhemê ji nû ve diafrîne, pêşkêşî xwendevanan dike.

Rexnegir dema rexna xwe amade dike, bêgûman serbest e, lê belê angorî çend pîvanan, angorî çerçevêkê gavên xwe davêje, wisan neke, wek me jor jî got, rexne me têr nake û nagihêje armanca xwe. Bi taybetî sê etapên rexneyan yên bingehîn hene, ji van pîvanan yek kêma be, wê demê em derheqa berhemê de nikarin bibin bibawerî û bi dîtineke têr-tijî, rêk û pêk.

DI EDEBIYATA KURDÎ DE REXNE

I- Pêşkêşkirin: Di vê beşê rexnê de berhem bi kurtî tê nasandin, cîh, sal, ziman, hejmara çapê, rewşa çapa nû, weşanxane, rûpel, pergela rûpelan, bergê pêşîn wek van babetan tiştên ku nasnama berhemê pêk tînin an jî babetên ku van zaniyarî û agahdariyan hêsantir û zelaltir nîşan didin, yek yek tên pêşkêşkirin. Tiştên mayîn wek mîsal qedexebûna berhemê, berhem bi alîkariya kîjan dezgehê hatiye weşandin, nivîskar berhem diyarî kê kiriye, dema derketina pirtûkê çi dem e, xisûsiyetên demê çi ne, wek van zanyariyan gelek babetên mayîn jî tên pêşkêş kirin.

II- Şirovekirin: Di vê beşê rexneyê de naveroka berhemê, bûyer, hevگیرêdan û sazîya bûyeran, mêrxasên berhemê, mesaja berhemê wek van pirsan gelek pirsên mayîn tên zelalkirin. Kêmasî, xeletî an jî valahiyên mayîn tên nîşandin. Beşa herî girîng û bingehîn ya rexneyê bi bawerîya min ev beşa ye. Ji ber ku, angorî van encam û tespîtan êdî rexnegir dikare li ser berhemê bawerî û dîtînen xwe bibêje.

III - Nirxandin: Di beşa dawîn ya rexneyê de rexnegir li ser hêjabûna berhemê ya edebî biryarê xwe dide, dinirxîne. Ev biryar û nirxandin, ne “mezinkirin” û ne jî “piçûkdîtin” berhemê ye, rexnegir wek kesekî alînegir, bêteref angorî argumentên xwe yên ku di beşa şirovekirinê de bi dest xistiye û dîtiye, baweriyên xwe bi zimanekî ne îronîk, jî polemîkan dûr pêşkêş dike. Armanca wî ne ew e ku lingê nivîskar têxe soleke teng û êrişî wî bike.

Gelek caran bê ku rexne ji van hersê beşan pêk bê, gelek rexnegirên Kurd tenê beşa dawîn ango tenê berhemê dinirxînin, berî vî biryarê giran, pêşkêşkirin û şirovekirina berhemê davêjin alîkî, argumentên xwe pêşkêş nakin. Di dawiyê de rexneyên neçê derdikevin holê, xwendevan şaş înfirme dikin û di bin bandora xwe de dihêlin.

XWENDEVAN: Xwendevan gelek hewcedarî rexne û rexnegiran e. Xwendevanek dema li ser berhemekê rexneyên ji hev cuda bixwîne, derheqa berhemê de digihêje bawerîkê. Pey berhemê dikeve, dixwîne û ew jî wek **rexnegirekî amator** dikare tevî raberzînan bibe. Xwendevan dema

DI EDEBIYATA KURDÎ DE REXNE

serê wî diêşe, bîna wî teng dibe an jî dema xewa wî nayê, dest davêje berhemeke edebî. Dema kêfa wî ji vê berhemê re nehat, davêje alîkî. Ji bo vê yekê jî gelek rexnegir dibêjin; ji bo berhemek bibe berhemeke hunerî divê li ser xwendevanan hîseke estetîk peyda bike. Lê pêwîst e bê diyar kirin ku her xwendevan angorî daxwaz, hîs û baweriyên xwe ji berhemekê hez dike. Her berhemeke serketî, ji aliyê estetîk û huner de pêşketî be, ji aliyê piraniya xwendevanan ve tê hez kirin, xwendevan li berhemê û nivîskarê wê xweyî derdikevin.

Bi kurtî çawa me li jor jî da diyar kirin, di navbera civat, nivîskar, berhem, medya, rexnegir û xwendevan de bend û pêwendiyên gelek xurt hene, wek xeleqokên zincîrekê bi hev re girêdayî ne.

(*) Ev nivîs di konferansa Edebiyata Kurdî de wek raporekê hatiye pêşkêşkirin. (17/18 Hezîran 1995 Stockholm)

Ø	Rohat ALAKOM	Ø
I		I
X	GENERAL	X
W	ŞERÎF PAŞA	W
Î	Derket / Bixwînin	Î
N	Navnîşana Xwestinê:	N
I	R. ALAKOM	I
N	Pilvingegatan - 17	N
	128 35 SKARPNÄCK	
	STOCKHOLM / SWEDEN	

EDEBIYAT Û ÇEND PIRSGIRÊKÊN WÊ

N. ZAXURANÎ

Zanyariya edebî bi serê xwe deryayeke bê binî ye. Divê derya fereh û kûr de melevanî(avjênî) kirin ne karê her hunermendî ye. Jê ra kar û xebateke pirr dijwar divê. Weha bi hêsanî rabûnûruniştina hunermendî meriv nikare bi dest bixe. Lewre li welatê me, li Kurdistanê ji ber hoyên ku tên zanîn (dagirkirin û parvekirina Kurdistanê) geşbûna edebiyatê rê lê hatiye girtin. Ji lewre di şûna derya bê binî de çiravake kevnar li ser xaka Kurdistanê diherike. Ji bo ku ev çirava kevnar newê çikindin pêwîst e ku divê pêvajoya nû ku li Kurdistanê hatiye li dar xistin, rewşenbîrên Kurdistanê kar û xebata xwe ya hunerî / edebî xurtir bikin da ku em bi hev re karibin vê çirava kevnar ber bi deryabûnê bibin.

Bi hêviya ku ev çirava kevnar —ku koka wê digihêje Eliyê Herîrî, Meleyê Cizîrî, Ehmedê Xanê û ed.— bê bi hêz kirin, dixwazim ku parîkî li ser van pirs-girêkên edebiyatê ku wê di rêzên jêrîn de bi awayekî puxtekirî (xulasekirî) bêne vekirin, balê bikşînim ser wan da ku giftûgo li ser wan divê pêvajoya jîndar ku li Kurdistanê li darê bêne kirin.

BERHEMA EDEBÎ ÇI YE?

Di destê yekemîn de dixwazim li ser berhema edebî rawestim. Bê ka berhema edebî çî ye? Ji kîjan berhemê re berhema edebî tê gotin? Berî her tiştî divê baş bê zanîn ku cûdabûna berhemên edebî ji berhemê zanyarî (îlmî) ew e ku berhemên edebî di cureyên xwe de yek in. Bi du awayî nayêne dubarekirin. Ji bilî vê yekê

ÊDEBIYAT Û ÇEND PIRSGIRÊKÊN WÊ

Jî her berhema edebî jiyana civakî bi vegotina xweyî bi taybet dinirxîne. Ji lewra şaîr bi awayekî, romanivîser bi awayekî din jiyana civakî ji xwe re dixin mijar. Ji vê yekê wîrdetir jî, dema ku îfadekirina romanên (fîkrên) olî, felsefî û polîtîkî bûne xwediyê uslubekê, hingê mirov karê wan raman- ku di çerçeweya berhemekê de tên berhemkirin- weke berhemên edebî bipejirîne. Ji xwe berhemên edebî divê bi alîkariya zimanekî pak û zelal û bi rêkûpêk bîr temsîlkin. Berhemên edebî ramanên (fîkran) bi awayên îmajan diyar dikin. Bi xwezaya xwe her raman (fikir) di dawîya dawîn de temsîlkirine birek ji jiyana mirovantiyê ye ku ew jî xwediyê rengê civakî ye. Bela vê yekê ji mijara berhemên edebî temsîlkirina jiyana mirovantiyê bi alîkariya zimanekî xwedî wate (mane) bi xwe ye. Bêguman ev îfadekirin bi gelek aliye. Bê çawa di warê polîtîka û felsefê de dikare bê gotin, her weha di warê pîrsgirêkên olî, cengî û peywendiyên di navbera keç û lawan jî bê şor kirin. Bi gotinek din mijara berhemên edebî bi tu awayî ji hebûnên civakî, çandî û polîtîkî yê mirovantiyê nayê qutkirin.

Ji ber ku berhema edebî xwediyê avahiyeke kompleks e, karûxebata edebî jî xwediyê pêvajoyeke gelek dijwar û aloz e. Ji bo ku berhemekê edebî / hunerî bi awayekî zanyarî bê ji hev wejertin, pêwîst e ku mirovê lêkolînvan xwediyê zanyariyê balkêş bê di derbarê nivîserê berhema edebî de ku ji aliyê lêkolînvanan ve tê nirxandin. Bi saya awîreke weha berferêh edebiyatzan karê nakokiyên ku di pêvajoya ji hev veqetandina berhemên edebî de tên meydana, bibîne û bi wî awayî peywendiyên wan bi hevra him jî bi berhema edebî re şîrove bike. Wî çaxî edebiyatzan kare têkiliyên diyalektîkî yê di navbera naverok û awa (şîkl) de bi awayekî hêsanî bihûne.

AWA (ŞIKL) , NAVEROK Û USLUB

Ma gelo mirov kare di derbarê awa (şîkl) û naverokê de çi bibêje? Her çiqas awa(şîkl) ji uslub û nazmê bê gîyan û cankirin jî, ziman divê pêvajoya hevbeşkirinê de faktorê herî bîngeh e. Lewra mirov bi alîkariya uslubê vegotina xweyî edebî ku ziman ve vedibêje, behtir bi hêz û jîndar bike. Çi kû uslub jî aliyê taybetiyên / karakterên zimên tê pê. Ji bilî vê jî di serpêhatina dem û dew-

EDEBIYAT Û ÇEND PIRSGIRÊKÊN WÊ

ranan de uslub li gorî zimên behtir tê guhestin. Ji xwe usluba bedew di zimanê jîndar de, bi gotinek din di zimanê gelêrî de peyde dibe. Bi saye têkiliyên rast û rê bi zimanê gelêrî ji aliyê nivîser ve usluba bedew tê vegotin. Bi guhertina jiyana civakî ra naverokên taze tên afirandin û her naverok di pêvajoya geşbûna xwe de tesîrê li ser awa (şîkl) dike. Bi vî awayî jî bi nûjenbûna naverokê re nivîser awayê îfadekirinê xwe bi awayekî erênî digehurîne.

Ji blî vê jî nivîser bi saya hewldanên îfadekirinên xwe naveroka berhema xwe zelal dike û bi vî awayî jî hevbeşbûna awa (şîkl) û naverokê tê bi xwîn û cankirin. Lewra awayên (şîklên) ku naverok dixwaze, bandorekê li ser naverokê dîkin û bi vî rengî jî rumeta naverokê ya bi reng îdeolojîkî xurt an jî qels dibe.

EDEBIYAT Û KATEGORIYA NETEWÎ

Baş e, mirov dikare bi çî awayî peywendiyên edebiyatê û kategoriya netewa weke kategoriyeke dîrokî şîrove bike. Tê zanîn ku kategoriya netewa ne di hemû dem û dewranên dîroka bi reng mirovantiyê de, belkî di serdema kapîtalîzma geşdar û berhevkar de hatiye ser pê. Lê ku mirov li dîroka mirovahiyê ya xwediyê karektêreke civakî dinêre, hingavê mirov dibîne ku dîroka edebiyatê ji ya kategoriya netewa gelekî kevnartir e. Bi saya vê kevnariya edebiyatê ku bi alîkariya zimên tê meydanê prosesa netewî gelekî geş bûye. Lewra ku mirov li pêvajoya netewî dinêre, mirov dibîne ku kategoriya edebiyatê yekîtiya pêvajoya kulturî bi hêz kiriye. Ji bilî vê jî yekîtiya zimanê netewî bi saye vegotinên hunerî / edebî bêhtir bi goşt û xwîn bûne. Bi peyveke din edebiyatê potansiyela kulturî ya jihevketî û belavkirî gihandiyê hev û bi vî awayî yekîtiya wê bi giyan û cantir kiriye.

Ji ber vê yekê jî, her berhema edebî di çerçewa neteweke de, di nav sînorên neteweke de geş û bal dibe. Lewra nivîser bi alîkariya van dînamîkên netewî berhemên xwe dihûne. Bi vî rengî jî edebiyata netewekî ji ya netewê din cûda dibe. Di bingehe xwe de, her nivîser pirsgirêkên civakî yên bi reng çîneyetî dixwaze bi awayê vegotina xweyî hunerî/edebî binerxîne. Bêguman yên civakê ku xwediyê pêvajo û dînamîkên ji hev cûda kirine. Bela wî qasî jî îro roj ji alîkî ve

EDEBIYAT Û ÇEND PIRSGIRÊKÊN WÊ

bi awayekî global kultura cîhanê geş dibe, ji aliyê din ve jî edebiyata neteweyên ji hev cûda li ser bingehê dînamîkên xwe geş û bal dibin ku ewan jî di jiyana mirovantiyê de dibin xeznên herî bi rumet.

BINGEHÊN EDEBIYATA NETEWÎ

Dibe ku bê gotin kîjan unsur dibin bingeh ji edebiyata neteweyî re?

Bi qasî ku tê xuyakirin ziman organê herî aktîfî serekî ye ji bo geşbûna edebiyata netewî di dem û heyama ku em têde dijîn. Mirov dikare bi hêsanî bibêje ku hunera edebî alîkariya zimên tê pê. Bê çawa şair bi alîkariya peyvên xweş û bi rêkûpêk wênekeşiya jiyana civakî dike, her weha edebiyatzan jî bi alîkariya zimanê xweş û xwedî aheng huneriya xweyî edebî dihûne. Ji xwe jiyana netewî li gel xeml û xêzên xwe dibe bingeh ji edebiyata netewî re û edebiyata netewî pê rengîn dibe. Bela ku edebiyata netewî li ser jiyana civakî ya gel tê honandin, edebiyata netewî xwediyê kareterêke bi reng gelêrî ye. Ji bo vê yekê jî zimanê jîndar yê netewî di nava refên gel de tê bi xwîn û cankirin. Heger ku mirov bixwaze xwe fêrî dîroka kultur ya netewî bike, divê ku mirov xwe fêrî dîroka jiyana gel bi xwe bike. Ji xwe ev tiştekî ne hêsan e. Jê re kar û xebateke bêhempa divê.

Ji ber vê yekê birrek ji nivîsaran rastûrê (dîrek) li ser jiyana gelêrî rawestiya ne û bi vî awayî jî daxwazên gelêrî bi awayekî zanyarî anîne zimên. Lê, li milê din jî hinek ji nivîsaran – Mîna Balzac, Tolstoy – bi jiyana xweyî civakî ne bi gel re jî bûn, van nivîsaran bi saye rexna xweyî tûj li dijî çîna karbidest alîkariya çîn û refên jêrdest kirine. Bela ku îro rewş hatiye guhartin her nivîser li gorê berjewendiyê çîna xwe vegotina xweyî edebî / hunerî pêşkêşî hemû çîn û refan dike. Ji ber vê yekê rexna Markîsî dibe navend ji bo çareserkirina pîrsgirêkên edebî di serpêhatina dem û dewranan de. Lewra em baş dizanin ku armanca rexna edebî ew e ku rewşek ji rewşên aborî û dîrokî di mustewa rengê ji rengê edebî de bi uslûbekî rêkûpêk îfade bike. Ji xwe berhema edebî dibe encama (netîca) vê îfadekirina bi rêkûpêk ku ew jî xwediyê naverok û awayekî ne.

Berhema edebî yên ku jiyana gel ya rengîn û xemlîn ji xwe re dikin mijar bê mirinin û wê her dem di dilên hunermend û zanyarên dîlovan de bijîn.

EDEBIYAT Û ÇEND PIRSGIRÊKÊN WÊ

Bêguman ev berhemên edebî her çiqas di konjekturê xweyî ya dîrokî de bêne şîrovekirin jî, gelek caran di herikandina dîrokê de bingehê van berhemên civakî tê guhertin jî, lê hunera van berhemên edebî tiştekî ji rumeta xweyî hunerî winda nakin. Çima gelo? Ji ber ku ev berhemên hunerî / edebî di pêvajoyê dîrokî de di jiyana gel de cihekî bi taybet digrin. Nivîser bi alîkariya vê berhema xweyî edebî rewşa netewa xwe bi awayekî spesîfîk ji hev diwejêrê. Herweha nivîser di warê zimên de jî gelekî tê gihîştîye. Bi gotinek din ew zimanê netewî bi awayekî fereh hûr û kûr dizane. Şahrazabûna wî di warê zimên de bi gelek alî û bêhempa ye. Bi wî awayî jî berhemên wî bi zimanê netewa wî tên neqîşandin. Mirov di berhema wî de jiyana gel ya jîndar bixwe dibîne.

Ji aliyê din ve jî mirov di berhemên weha bi rûmet de -ku bi navê şaheser tên binavkirin- bûyerên gelekî girîng yên heyama ku nivîserê berhemê têde jiyaye, dibîne. Bêguman di berhemên weha rengîn de berhemên di yên gelêrî ji aliyê nivîser ve bi awayê vegotina xweyî hunerî tê parastin. Bi vî awayî jî nivîser bi saya vê xebata xweyî xemlîn pencera netewa xwe ya kulturî dewlemend dike û bi alîkarî ya vê dewlemendiya xwe ya hunerî xezîna kultur ya cîhanî parîkî xurtir dike.

Divê baş bê zanîn ku nivîserê karûxebata xweyî hunerî ji bo berjewendiyên çînên kevneperest li dar dixê, nikare berhemên hunerî yên giranbiha berhem bike. Lewra her ku diçe bingehê aborî û kulturî yên çînên kevneperest dihêve, bi vî awayî jî kultur û hunera wan jî tê jibîrkirin. Lê hunermendên ku karûxebata xweyî hunerî ji bo berjewendiyên çînên hevdemî û refên çawsawa dikin, berhemên wan yên edebî dibe ku weke demekî kevn bên dîtin, belê biqasî ku em ji dîrokê fêrbûne, berhemên wan yên edebî wê her dem bibin mijar ji bo mirovên hunermend di her çax û heyaman de. Di vî warî de gelek mînak hene, lê ez dixwazim bi tenê karûxebata hunerî, felsefî ya filozofên sed-sala 18an bikim bîra xwendevanên hêja û delal. Bela ku van filozofên sed-sala 18an berjewendiyên çîna pêşeng - ew jî çîna bajarî (burjuvazî) bû -ya serdema xwe bi awayekî zanyarî û têgihîştî kirin, îro roj ji berhemên wan bi zewq tên xwendin.

EDEBIYAT Û ÇEND PIRSGIRÊKÊN WÊ

Lewra mirovahiyê bi alîkariya berhemên wan filozofan rindtir xwe nas kirin. Mirovê serdema wan filozofan wasfên xweyî hûmanî birêkûpêktir kirin. Bi vî awayî jî kesîtiya wan bi xwîn û cantir bû. Di pêvajoyê de jî civak ji bingehe xwe hate nûjenkirin. Êdî rûpelên nû di dîroka mirovantiyê de hatin vekirin. Vêca mirov dikare bi hêsanî ji van filozofan re bibêje nivîserê cîhanî. Lewra jî her celeb netewa pirtûkên wan dixwendin û rêçên wan ji mirovantiyê re weke rêçeke taze dihate pejirandin. Bi kurtî qazancên karûxebata wan filozofan weke qazancê hemû mirovantiyê ne. Ji ber vê yekê jî divê mirov xwedî lê derkeve.

Lê, îro roj mirov nikare bi tenê xwe li gorê rêçên wan filozofan bihêle. Ji ber ku ji serdema wan filozofan vir de di jiyana civakî de zehf tişt hatin guhertin. Bi vê guhertina civakî re jî pirsgirêk û nakokiyên civatê aloztir bûn. Bingehe teknîkî yê serdema wan filozofan bi awayê zanyarî hate binûkirin. Serdema îndustrialîzmê ber bi dawiya xwe diçe. Di şûna wê de hêdî , hêdî bingehe civateke taze ku ji re civata înfomasyonê tê gotin bi cîh û war dibe. Ev yeka ha jî awayên biyaniyê yên taze bi xwe re diafirîne. Bi ser de jî biyaniyeke bi gelek alî û aloz dibe bela serê mirovantiyê di serdema me de.

Ji ber vê yekê jî divê berhemên edebî jî bi naverok û awayê(şiklê) xwe li gorê jiyana civakî ya serdema me bîr berhemkirin. Bêguman divê berhemên hunerî/ edebî xwedî postîsyoneke bi reng sosyalîstî bin da ku mirovanti bi saya wan xwe ji hemû celebên biyaniyê rizgar bike. Lewra bi tenê sosyalîzm dikare bibe rêça rizgariyê.


Ji bo mirovantiyê di hemû dem û dewranan de, ji vê yekê wirdetir ji mirovanti bi saye bicîhkirina sosyalîzmê dikare li xwe vegere û bi vî awayî jî bibe xwediyê berhemên xweyî manevî û maddî. Bêguman hinganê jî biyanti di jiyana mirovantiyê de wê nemîne.

Romannivîserekî Di Ser Xwe re, Mehmed UZUNÎ û Romana Wî

DI BIN SIYA EVÎNA WINDA DE

Yaşar KEMAL

Wergêr : N. Zaxûranî



* Di Bin Siya Evîna Winda De — Mehmed UZUN — Wergêr - Muhsîn Kizilkaya — Weşanên BELGE – Îstanbul

* Mehmed Uzunî di sala 1953an de li Siweregê bûye. Ji mêj ve li Swêdê dijî. Berhemên xwe bi Kurdî dinivîsîne. Romana Uzunî ya bi navê “SIYA EVINÊ” di rojên raburdu -derbasbûyê- de bi Tirkî hat weşandin. Ji pirtûkê re pêşgotin Yaşar Kemal ku nivîsibû. Em dê li jêr vê nivîsê biweşînin.

Wergêrîn : N. Zaxûranî

Macera romannivîseriya Mehmed Uzunê xort, macereke dirêj, têr û tijî ye. Mehmed ji deriyê mezin yê ku hemû hosteyên romannivîseriyê têde derbas bûne ew jî tê re derbas dibe.

Mehmed li navçeyeke “Başûrê rojhilata Anadolîyê” bûye, li wir mezin bûye. Navçeya ku ew lê bûye, hema bibêje herkes bi Kurdî diaxife. Ev navçeyeke ku li vir edebiyata Kurdî ya nivîskî, edebiyata gelêrî lê himbiz bûye. Şaîrên mezin yên wekê Meleyê Cizîrî rakirine.

Ji bilî vê jî, li vir destan, çîrok, stranên şînê, stranên giranbiha yên Kurdî tên vegotin. Zimanê Kurdî zimanekî dewlemend e. Him edebiyata nivîskî him jî edebiyata devkî li vir şax û per daye. Ji derveyî Başûrê rojhilatê, ji Îranê ta Iraqê, ji Iraqê ber bi Suriyê ve zehvtir zimanê edebiyata Kurdî ya devkî, edebiyata Kurdî ya nivîskî hatiye dewlemendkirin. Gelê Kurd ji heyama Asuran, Akadan, Babîlan, ji vê wîrdetir, ji Sumeran vir

Nivîsa Yaşar KEMAL

de li ser vî xakî dijî. Ji bilî vê jî axa ku Kurd li ser dijîn xwe dirêjî heta Qafqasan dike. Birrekî mezin ji Kurdan kej in. Evan, Kurdên ku bi eslê xwe qafqasî ne. Çavên birrekî mezin ji Kurdan, zeviya pîrraniya wan zer, şîn, şîneasmanî ne. Ev yeka jî belkî ji eslê wa yî qafqasî tê.

Mehmed li ser vê xaka kevnar ya kulturî bûye, zimanê Kurdî yê gelek dewlemend bûye zimanê wî yê zikmakî. Li gel vê jî Mehmed di dibistanê tirkî de xwendî ye, weke zimanê xweyî zikmakî tirkî jî hîn bûye. Zimanê gelêrî yê tirkî jî gelekî dewlemend e. Zimanê tirk yê gelêrî di serpêhatina dem û dewranan de edebiyateke mezin afirandiye, gelê tirk jî şairên mezin rakirine. Dede Korkut, weke destanên Koroglu, Yunus Emre, Karaca Oglan, Pîr Sultan Abdal, bûye xwediyê şairên mezin yên gelêrî mîna Dadaloglu. Mehmed Uzunî nivîserekî bi siûd û qibal hatiye dinê. Zimanê van gelan yên gelêrî, edebiyata wan ya devkî an jî ya nivîskî hîn bûye, her du ziman jî ji xwe re kirine çavkanî. Siûdê qibala Mehmed ku rind derketiye bi van jî nemaye, Uzunî xwe berdaye ber bi rojava, ku di serî de li Swêdê be jî karînen (îmkanên) xwe têgihîştinê kulturên cîhanî jî bi dest xistine.

Ji beriya Mehmed ve, ji damezrandina komarê vir de zimanê Kurdî hatiye qedexekirin, bi zimanê Kurdî tu edebiyateke nivîskî nehatiye afirandin. Gelek şair û romannivîserê ku bi eslê xwe Kurd in bi tirkî roman nivîsîne, bûne hîmdarên zimanên tirkî, gelek an jî heta bi Kurdîtiya xwe înkâr kirine. Kurdan jî gelek şairên mezin derxistine, ku ewan jî Kurd in, tu kesî nizanibûye.

Vêca Mehmed Uzunî ji ber vê yekê bûye romannivîserê Kurd yê yekem, ku bi Kurdî dinivîsîne, bi qasî ku ez dizanim ji derveyî Tirkiyê jî çend roman û şîrên bi Kurdî hatine nivîsandin hene. Lê ev roman pîrîmîtîv mane. Ji şairan Cegerxwîn ku ew jî bi aslê xwe ji “Anadoluyê” ye, şîrên mezin û zimanê wan afirandiye.

Dîsa dizanim ku Pûşkîn ji zimanê gelêrî yê Rusî zimanekî mezin yê şîran afirandiye, bûye bavê şîrên Rusî yên nûjen.

Hevalê wî Gogol jî li ser eynê şopê çûye, di zimanê destanî yê gelê Rusî de awayê romaneke nû, naverok û zimanê wê afirandiye, ew jî bûye bavê romana Rusî.

Nazim Hîkmet jî ji zimanê gelê tirk yê dewlemend zimanekî şîran yê nû afirandiye, bûye hosteyekî herî mezin yê zimanê tirkî.

Nivîsa Yaşar KEMAL

Cegerxwîn jî nesebe şairên mezin yê Kurdan Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, destanzanên Mezin Homerosê Kurdan Abdalê Zeynikê tê.

Dema ku min romana Mehmed Uzunî xwend gelekî şaş mam, zimanê romaneke yekem weha bi hosteyî, weha bi zimanekî dewlemend, bi ser de jî bi zimanekî geşkirî yê romanê bê çawa hatiye nivîsandin. Di vê karî de qabîliyeta Mehmedî ku ji kultura wî ya fireh tê ji xwe rast e. Mehmed pêşiya pêşî zimanê Kurdî û edebiyata Kurdî baş dizane. Zimanê tirkî û edebiyata tirkî jî rind dizane. Pey re xwe berdide nava cihanê, di kultur û edebiyata cihanê jî baş digihe. Bi vî awayî jî, Mehmed dibe siûd û qibal ji bo zimanê Kurdî.

Romana “Di bin siya evîna winda de” romaneke bi hostayî ye. Min li jor nivîsand ku Mehmed jî bi vê romana xwe deriyê ku hostayên roman-nivîser têre derbas bûn, ew jî têde derbas dibe. Ev roman, romaneke bêhempa ya evîna bi dualî ye. Yek jê evîna dilberê, ya din ya têkoşîneke dijwar e. Memduh Selîm Begê li Stembolê xwendiyê, tevî rewşenbîrên Stembolê û jiyana kulturî bûye, mirovekî xwedan kultur, hutê pirtûkan bûye. Piştî komarê ji Tirkîyê hatiye nefî kirin, wê dema ku Helep û Antakya di destên Fransîyan de bûn, li bajarê din yê Suriyê jiyaye, di vê navberê de dilketiyê keçeke Çerkez, bûye bi dergistî, dema ku wê zewicîbana serhildana Agriyê dest pê kiriye. Memduh yek ji wanê ku li Suriyê partiya Hoybûnê damezrandine. Memduh Beg bi dilşewatî dilketiyê dergistiya xweyî xweşik û ciwan, ji wê pê ve tiştek di xem û xeyala wî de nîn e.

Di vê navberê de cenga ku li Agriyê dest pê kiriye, ji neçarî weke nûnerê partiya Hoybûnê beşdar bûye. Memduh Beg di nava evînê û cengê de çûye û hatiye. Ger ku wî xwestibana karîbû neçe cengê. Ji dergistiya xwe bi gelekî navsertîr bû. Lê evîn dijwar bû. Di dawiyê de Memduh Selîm Begê cengê hildibjêre û dikeve ser riya Agirî. Ceng, rebentî, birçîbûn û rêkûn.

Memduh Selîm Begê bi vegera xweyî ji cengê dibîne ku dergistiya wî bi dewlemendî Ereba re zewiciye. Di pey vê yekê re êdî Memduh Selîm Begê dikeve. Û Memduh Selîm Begê bi ketina evîneke xedar re, ketina rêkûnê jî dijî. Her çiqasî dikeve jî dîsa kar û xebata xwe ya polîtîkî kêmbê jî didomîne.

Ev roman tradejiyeke rast û nû ye.

Nivîsa Yaşar KEMAL

Di vê romanê de zimanê Mehmedî yê hoste, zimanekî nû yê romanê ye. Û Mehmed bi vî zimanî teswîrên sade dinivîsîne. Her tiştî weha sade dinivîsîne ku meriv bi vî zimanî sade bi sihrê dikeve, meriv di nave vê sihîrdariyê de sergêj dibe, diweste. Tîpên romanê jî saxlem in, tîpên wê jî bi hemû sadeyîyê hatine vegotin. Weha bi zimanekî sade ku meriv karibe binivîsîne, şanê hostayê mezin e. Taswîrên wê bêyî ku li ber çavên meriv keve mîna zimanê destanan hatiye hunandin. Mehmed di taswîrên xwe de gihîştîye awayên vegotinên xwezayî yê nû. Xwezaya wê mîna vegotina destanên mezin sade û dewlemend e. Taswîrên wê qet li ber çavên xwendevanan nakeve.

Piştî ku min ev roman xilas kir, demeke dirêj ez ji sêhirdariyên Mehmedê sêhirdar xilas nebûm, min roman bi Memduh Selîm Begê re jiyam. Ez bûme dostekî wî, min ew ji nûve afirand, ez jê xeyîdim, dilê min pê şewitî, min ew biçûk dît. Û min xwest ku ez bighime hêza sîhra Mehmedî ya romannivîseriyê. Di dawiyê de min got ku ew qabîliyeteke weha mezine û ji zimanê mezrabotayî jîndar yê herî kevnar, ji zimanê Kurdan yê dewlemend romaneke weha ji bo gelekî bextîyarî ye. Heger ku mirov ji vî zimanê kevnare zimanê romanê biafirîne, romaneke weha çenebe wê ji çi çêbibe? Çimkî taybetiya zimanan awayê romanê, şîfran, awahiya wê, ji bilî vê jî heta naverokê wê jî tayin dike.

Mehmed Uzun hosteyê zimanekî weha yê yekem e. Kevirên enîşka romana Kurdî ya pêşerojê danî. Ev şahnazî ya wî ye. Di vê demê de îmza avêtine bin romaneke hostayî û zimanê romaneke nû ne karekî hêsanî ye. Mehmed Uzunî bi serekî bilind ji bin vî barî sext rabûye.

Di pey vê destpêka şahnaz re, ji vî zimanê Mezra Bota yê herî kevnarî dewlemend dê edebiyateke giranbiha, bi taybetî romanên giranbiha derkevin.

Hevpeyvîn

H
e
v
p
e
y
v
î
n

bi
HESENÊ METÊ
re

H
e
v
p
e
y
v
î
n

Hevpeyvîn

Helwest: Birêz Hesenê Metê, te kengî û bi çi awayî dest bi nivisandinê kir?

Hesenê Metê: Karê nivisandinê prosesek e. Meriv dikane bibêje ku ev ji bo herkesî jî wusa ye. Destpêka prosesa vê nivisandina xwe nizanim lê novelên ku min nivisandine û qediyane ez bawer im rastî salên 84-85an tên.

Îcar ne wekî nivîskar, lê karê nivisandinê ji bo min weke hobiyeke, mîna nexweşiyekê dest pê kir û hîn jî wusa ye.

Helwest: Tu berhemên xwe bêtir ji bo kê dinivîsîn?

Hesenê Metê: Di nivisandinê de du etab hene ku ez li ser difikirim. Etaba yekê ez dibêjim ez ê çi bi çi awayî binivîsînim, bi ser kevîm û jê kêfxweş bibim. Di etaba duduyan de jî dema ku diqede ez wekî xwendevanekî dixwînim.

Tiştên ku ez dinivîsînim di forma novelan de ne. Motifên van novelan ez li gor intresa xwe hildibijêrim, li gor dilê xwe û heta ku ji min tê ez dixwazim bi hunereke edebî bihûnim. Çiqasî bi ser dikevim, ew tiştêkî din e. Bi gotineke din ez ji bo xwe dinivîsînim û ne ji bo kesekî din: ev etaba pêşîn e. Lê hinek dixwînin û jê lezetekê werdigerin an na: ew jî etaba duduyan e.

Helwest: Heta nuha çi berhemên te çap bûne?

Hesenê Metê: Ji Pûşkîn Keça Kapîtan min wergerande kurdî û di 1988an de çap bû. Min û çend dostên din, me her yekî çend novelên Çêxov wergerandin kurdî û bi navê Mirina Karmend ew jî çap bûn, 1989. Hinek kurteçîrokên gelêrî min xwest ku bi formeke edebî bihûnim û di sala 1990î de bi navê Ardû weke pirtûk çap bûn. Çend novelên min di forma pirtûkekê de bi navê

Hevpeyvîn

Smîrnoff çap bûn, 1991. Ji Dostoyevskî romana bi navê Merivên Reben min wergerande kurdî û ew jî di sala 1991ê de çap bû. Bi navê Labîrenta Cinan min nivisandina noveleke dirêj qedand û di destpêka sala 1994an de çap bû.

Helwest: Tu jî wek gelek niviskarên kurd niviskarekî sirgûnê yî. Zehmetî û diywariyên niviskariya sirgûnê çi ne?

Hesenê Metê: Ne di warê nivisandinê de lê di warê em bibêjin jiyana ruhî de diwariyeke sirgûnê heye.

Helwest: Tu dibêji ne di warê nivisandinê de, ma tu bawer nakî ku tu li welêt bûyayî te ê berhemên hêjatir binivisiya?

Hesenê Metê: Ez baş nizanim lê bi min wusa tê ku bersiva vê pirsê Na ye: na yek: (li gel ku min pir û pir dixwest ez diya xwe, gundê xwe, bajar û welatê xwe bimînim û bijîm lê) ji ber ku ez tiştên fakta li gund, bajar, çem û çiyên nani-visînim, na dudu: ji ber gelek sedemên diyar û nediyar dibe ku ez bi hobiyeke weha jî neketama. Ku tiştêkî weha bibûya jî ez ne bawer im ku min ê ji berhemên xwe yê îro baştir binivisiyana.

Pîvana hêjayiya berhemekê di hûnandineke hunerî de diyar dibe. Em dizanin ku li welêt aloziyeke jiyana heye. Ev alozî ê, çawa bihêle tu bi serekî silamet li ser motîfa novelekê hûr bibî, fantazî û xeyalên dûr û nêzikî aqilan bi kar bînî, bi alîkariya huner veçînî û bigêhînin daraxeke bilind?

Helwest: Tu bi tevayî rewşa weşanên kurdî li derveyî welêt çawa dibînî?

Hesenê Metê: Çi li derve û çi li hundurê welêt, ez wusa dibînim ku rewşa weşan û weşangeriya kurdî ne li ciyekî baş e. Beriya hertiştî karê weşan û weşangeriyê di nava me de ne bûye karekî pêwîst, ne bûye fenomeneke ciddî.

Ez dibêjim heta ku niviskar, weşanger, xwendevan bi silametî, bi îstikrarî û bi harmoniya jiyana hevdem xwe nedine vî karî rewşa weşangeriya me jî ew ê her ev be.

Helwest: Berhemên ku îro derdikevin di warê edebî de û weke edebiyata kurdî tu çawa dinirxînî?

Hesenê Metê: Berhemên ku îro bi kurdî derketine an jî derdikevin bi giştî hejmareke pir kêr e. Lê di vê hejmara kêr de jî ewqas zêde, ewqas pir tiştên pûç û fizûlî hene ku nayê gotinê.

Hevpeyvîn

Pirî caran ez bi awakî nîvhenekî dibêjim: heta anuha min ji dil destê xwe li ber Xwedê venegirtiye, lê anuha ez vê yekê ji dil û can dikim û dibêjim: "Xwedê heta roja ku em ê bi destê te bimirin, bila haya me ji nivîs û berhemên me nebe." Ji ber ku wê roja ku haya me ji nivîs û berhemên me bibe, em ê xwe bikujin. Lê dîsa jî ku tu bixwazî ez navekî lêkim, wê çaxê ez ê bibêjim edebiyata me edebiyateke naşî ye, Edebiyat-î teşwîq e.

Helwest: Li gor kîjan pîvana edebiyatê tu digêhîjî vê encamê?

Hesenê Metê: Tiştê ku ez dizanim, pîvanek tenê heye. Ew pîvan jî pîvana dunyayê ye.

Helwest: Baş e, ma li gor vê pîvana edebiyata dunyayê berhemên me yê edebî tunene?

Hesenê Metê: Hene. Weke roman, novel, helbest... min berhemên kurdî jî bi lezeta berhemên xelkên biyanî xwendine. Lê ez dibêjim têra me nake ku em rabin behsa edebiyateke giştî bikin û binirxînin.

Helwest: Ji bo çêtirkirina edebiyata kurdî çi divê?

Hesenê Metê: Ne ji bo çêtirkirinê, lê ji bo çêkirina edebiyatekê gelek tişt divê: akademiyên zanistiya ziman û edebiyatê, nivîskar, rexnegir, xwendevan û ya herî girîng kultureke van hemû tiştan pêwîst e.

Helwest: Ma tu dikarî bibêjî kultureke me û van tiştan tune?

Hesenê Metê: Ez naxwazim tişteki weha bi lêv bikim û zêde jî vebibêjim. Lê tradisiyoneke me ya weha tune. Vê yekê divê em bêserm û bêtirs bibêjin. Mîkurnamên wusa me piçûk naxîne, bi berevacî, me li me divarqilîne.

Helwest: Gelo pêwîst e ku romana kurdî bi zimanê kurdî were nivisandinê?

Hesenê Metê: Baş e, te çi pêşniyar hene, ezbenî? Em romana kurdî bi kîjan zimanî binivîsin? Ma dibe ku em romana kurdî bi japonî binivîsin?

Helwest: Na, lê munaqase hene ku...

Hesenê Metê: Li min bibore... lê bi rastî jî tişteki pûç û vala ye ku meriv li ser pirs û bersivên weha têkevîne heftûheştê. Roman, novel, helbesta kurdî çawa dikane bi zimanekî din were nivisandinê, ez tênagêhîjim.

Hevpeyvîn

Ku meriv bibêje roman an jî edebiyata kurdî bi tirkî û japonî jî dikane were nivisandin, wê çaxê maneya zimanê kurdî jî namîne. Ku maneya zimanê kurdî ji navînê rabe, bi baweriya min wê çaxê maneya min û te... û maneya gelek tiştên din jî namîne. Ji Xwedê giravî pîvanên edebiyatê me dananîye. Ku tişteki weha bi me dest pê kiri bûya, Xwedê dizane bê me ê hîn çi tiştên seyr bavêta ber xelkê.

Helwest: Li ser niviskarên ku bi eslê xwe kurd û bi kurdî nanivisînin, tu çi dibêji? Gelo meriv dikare berhemên wan weke edebiyata kurdî bihesibîne?

Hesenê Metê: Ev pirsê ha jî bû pirseke nizanîm çawa. Di hinek warên huner de îdentîfikasyona huner û hunermend yek e.

Di hinek warên huner de jî du îdentîtet hene. Yek îdentîteta hunermend û ya din jî ya huner. Edebiyat jî vê yekê nimûneyeke e. Ew niviskarên ku bi îdentîteta xwe kurd in, jî xwe ew kurd in û nikanin bibin xwediyê îdentîteteke din. Lê berhemên wan bi kîjan zimanî hatibin nivisîn, ew berhema dibe edebiyata wî zimanî û hew.

Li vir divê mijar, motîf û figuranên berheman serê me tevlihev neke. Ez hertim nimûneyeke weha didim û dibêjim: Li ser dema Hîtler romanek hatiye nivisîn. Bûyer li fransayê derbas dibe. Mijar li ser keçeke polonî û leşgerekî îtalî ye. Kurdekî ku ji dewra Zerdeştî de li Hindîstanê ye û bi kurdî nizane, rabûye ev romana xwe bi zimanê urdu nivisiye. Pirs: ev roman romana edebiyata kîjan zimanî ye? Nimûneyeke ekstrem, nimûneyeke çêkirî ye, lê divê hinek tişt jî îzehetên xwe hebin.

Mijar, figur, cî, wext, motîf û niviskarê berhemekê jî nikane berhema zimanekî bike edebiyata zimanekî din. Ev nayê wê maneyê ku meriv îdentîteta niviskarekî ji dest digirin, wî piçûk dibînin an jî tişteki din.

Helwest: Sala çuyî (1995) saleke pîroz û sala Ehmedê Xanî û kampanya zimanê kurdî bû. Pêşniyar hebûn ku her welatparêz bi kurdî bipeyive, bi kurdî bixwîne û bi kurdî binivisîne. Û vaye ew sala pîroz buhurî. Te ew sala çawa dît?

Hesenê Metê: Mîna ku min ji dostekî din re jî bahs kiri bû, ez ji te re jî

Hevpeyvîn

bibêjim. Binêre... Ji bo ku meriv bi zimanê xwe bipeyive, bixwîne û binivisîne ne pêwîst e ku meriv welatparêz be, ne pêwîst e ku meriv şoreşger an jî maqûl be, ne pêwîst e ku meriv rewşenbîr û pêşverû be.... ma berdûş, tolaz û pêxasên xelkê jî bi zimanê xwe napeyivin? Ziman zimanê miletekî ye û di wî miletî de her babet meriv hene. Çima em ê rabin atraksiyonên weha şoreşgerane, pîvanên çêkirî bidine ber xelkê? Ku tu ji min bipirsî, ev tiştên weha bi darê zorê, bi kampanyan, bi peran, bi şekiran nabe, ezbenî. Ku şûûr û baweriya meriv bi xwe tişteki weha nehewîne, atraksiyonên weha cesaretên qelp û çêkirî ne. Lê ji bo bîranîna ilimdarê hêja Ehmedê Xanî tişteki maqûl bû.

Helwest: Ma ji ber vê sala pîroz di warê kurdî de tu ferqek çênebûye? Ku tu sala par, pêrar bidî ber sala çûyî (1995)?


Hesenê Metê: Di warê kurdiya min de, di şexsê min de, di mala me de ji ber pîroziya sala çûyî bi gotineke din 1995, dikanim bibêjim ew guhertinên ku tu dipirsî ne bûn.

Helwest: Tu anuha li ser çi dixebitî û planên te yên pêşerojê çi ne?

Hesenê Metê: Hinek tişt hene, lê naxwazim ji anuha ve behsa wan bikim.

Helwest: Ji bo bersîvên te gelekî sipas.

Hesenê Metê: Ez jî gelekî sipasî we dikim , serketina we û kovara **Helwestê** daxwaza dilê min e.



DI EDEBIYATA KURDÎ DE BÛYÎN, DI ZIMANÊ KURDÎ DE BÛYÎN E

K. RONÎ

Gengeşiyêke bêserî û bêbinî dest pê kiriye, diçe.... "Helbestvanê Kurd kî ye?" "Kê re helbestvanê Kurd tê gotin?", an jî "Nivîskarê Kurd kî ye?"..... Hem jî ev gengeşî bi zimanê tirkî du sal in ku berdewam dike.

Bi rastî, dixwazim bême ser ramanên nivîskar, helbestvan û rex-negiran. Berê çend rastiyan gelem-perî dixwazim binim bîra we.

Ziman, netewî û edebiyat; gireka van her sê fenomenên bi hev re çawa ye? Divê em bi gelemperî bibînin. Em dê bi ziman dest pê bikin. Ew, yanî ziman fenomêna neteweyî ya herî mezin û girîng e, bingehîn e. Bi gotinek din, her neteweke zimanekî xwe heye û bi piranî, bi wî zimanî tê navkirinê. Ji wî zimanê re jî, zimanê neteweyî tê gotinê. Lê, ji peyva "netewî" em wek dewletên imperyalîst "bi tenê, yên ku bûn dewlet netew in" nafikirin. Îro statûya dewletê jî bo Kurdan tune, lê herkes dizane ku ew netewek e.

Bi mantiqî mirov dikare girêka ziman û edebiyata neteweyî bibîne, têbigihîşe. Me got: ger ziman balkêşandina neteweyî be, em dikarin bibêjin şêklûşemal û giyana wî netewî di wî zimanî de, bi alîkariya wî zimanî tê dîtinê. Ji bo ku jiyana

giyana netewekê bi hemû karakterên xwe tê zimên; edebiyata neteweyî ancax bi wî zimanî tê afirandinê. Em nikarin bibêjin ziman diyariya jiyana neteweyî ye lê, em dikarin bibêjin ziman diyara giyana (riha) netewekê ye. Estetîka, etîka, dîroka jiyana neteweyî di zimanê wî neteweyî de dikare mirov bibîne. Hên jî, em rojevê netewî di zimanê wî netewî de dibînin. Ji bo vê yekê, tu berhem rast bi rastî ji jiyana neteweyekî hatiye afirandinê û nivîsandinê, tu caranî bi yek tam û giyan nehatiye wergerandinê. Lewre ziman, pêve edebiyat gotin e; gotin jî hemû bûyerên neteweyêke ji bûyîna wî netewî heta îro derbaz dîkin, disafîn in. Eger edebiyata neteweyekî ji jiyana bûyerên ji nav wî netewî tiştêkî girtin û nû ve hatiye afirandinê, ew ancax bi bîrûbawerîya wî netewî, yanê bi zimanê wî netewî di ciyê rast de tê estetîk kirinê. Di vir de dixwazim balê bixînim ser nîqteyêkê: Em nabêjin, tu bûyerên neteweyêke bi zimanekî biyanî nayê nivîsandinê. Na, tê nivîsandinê, lê bi wî awayî, ew berhem nabe berhemekê wî netewî, dibe berhemeke netewê biyanî, yê ku bi zimanî wî ew berhem hate nivîsandinê û hate afirandinê. Em dê di nivîsê xwe de, paşê bîn ser vê gotinê xwe yê dawî. Em niha evqasî bêjin: Bûyer ji netewek, ziman ji nete-

DI EDEBIYATA KURDÎ DE BÛYÎN

wek din; madeyê xam ji welatekî, kirin û çêkirina haceteke ji welatekî din, tu kes nikare bi pey wî hacetî bi navê welatî ku madeyê xam jê tê, bi nav bike.

Niha jî em bên ser gotinên çend kesên ku li ser mesela gotin û ramanên xwe dem bi dem, di nav rûpelên rojname û kovaran de dane weşandinê. Dixwazim bi gotinên Mehmed Ercan ve dest pê bikim. M. Ercan di kovara **“Yenî İnsan”** de dibêje ku “ziman vasita ye, ne armanc e” û ji vê gotinê em dikarin gelek fikran derxînin. Em dê bên ser vê gotinê, hinek binyata vê bikolin. Encamek din ji gotinên M. Ercan derdikeve: Eger Kurd bi tirkî jî berhemên xwe biafrînin ew berhem di edebiyata Kurdî de tê hesibandinê... Belê “ziman wasitayek e” lê em dikarin ji bo her tiştî jî, bi çavên mirov vasita bibînin. Hên jî, ji bo mirovan mirov jî bi xwe vasita ye. Li vê niqîkê, ya girîng bi metodekê zanîstî lêkolîn, lêgerîn, lîstînin e. Em dizanin di her tiştî de ku heta îro ji aliyê mirovan ve hatiye kêfş kirin de hemberhevî (zîrî) yê her reng û bûyerî hatiye dîtînê. Ev qanûna (zagona) zanîne û diyalîktîke ye û girîng e. Ziman jî, hem armanc bûyîn, hem jî vasita bûyînê di nav xwe de vedişêrinê. Ji bo gelekî û nivîskarên wî gelî, ziman vasita ya bîrûbaweriyên wan e. Lê, bîrûbawerî bi ziman ve tê can û goşt û hêstiyar, şiklûşemalên bîrûbaweriyar ziman bi

xwe ye, dikarin em bêjin. Bêgoşt û hestiyar şiklûşemala candarekî dernakeve, ew candar jî, bê mana ye, nebûyî ye... Ziman jî wek wî candarî ye.

Eger ziman rast nehatiye helbijartinê, raman, bîrûbawerî jî rast nayê holê. Ev ziman armanc dîtî ji bo nivîskarekî meselekê hîn ji girîng e. Divê nivîskar zimanî navbera nivîsê û zimanî estetîka bûyerên tîn nivîsandinê rast bi rast hilbijerîne.

Nivîskarê **“Kela Dimdimê”** Jan Dost di hevpeyvîneka xwe ya sala 1994 de di **“Ozgur Gundem”**ê hatibû weşandinê de, fikrê xwe bi lev kiribû. **Jan Dost** digot: “Nivîskar û helbestvanên ku bi zimanî biyanîyan berhemên xwe didin, belê... ew helbestvanên Kurd in.” Ancax paş de, gotinên dijhev bikartîne. Ji **Selîm Berekat** qal dike û wî dike wekokekê xwe. Dibêje **“Selîm Berekat** nivîskarekî bi eslê xwe Kurd lê, berhemên wî bi zimanî Arabî ne. **Selîm Berekat**, ji piraniya nivîskarên Kurd, ên ku bi Kurdî dinivîsînin pirtir Kurd e. **Selîm Berekat** di nav edebiyata hemdemiya Erebi de nivîskarekî herî mezin tê hesibandinê....” Niha pîvana me çi ye? “Pirtir Kurd”bûyîn, di nav Kurdan de ciyê wî dide berçavan, lê di nav edebiyata Kurdan de ciyê wî ray (xwuya) me nade. **Jan Dost** bi xwe jî “Di edebiyata hemdemiya Erebi de nivîskarekî herî mezin tê hesibandinê” dibêje û

DI ZIMANÊ KURDÎ DE BÛYÎN E

ciyê **Selîm Berekat** ji aliyê edebiyata netewî çawa tê dîtînê ji me re dibêje, û xwe bi xwe pûç dike. Ji aliyekî, kesên bi aslê xwe Kurd lê, berhemên xwe bi zimanekî biyanî diafirînin re “Belê.. ew helbestvanên Kurd in” dibêje, ji alî din ve jî, **selîm Berekat** di edebiyata Erebi de dibîne....

Dixwazim vegerim ser destpêka vê gengeşiyê. Bi xwestina Ahmed Arif di nav edebiyata Kurdî de bê hesibandînê. “Me gotibû, ziman fenomena herî binyatî tê dîtînê ji bo neteweyekî. Ji vê, em dikarin bêjin, nivîskarên neteweyeke bi naqîşandina, rengdayina, mahnalêkirina zimanbûyîniya wî neteweyî jî, wedigerînin. Niha tu kes napirsê û bersiv nade, Ahmed Arif û yên wek wî çawa û çi daye zimanê Kurdî? Eger edebiyata Kurdî bi zimanê Kurdî avadibe, wan çi kiriye? Ew bi tenê Kurd in. Xwîna wan, belkî jiyana wan jî, Kurd e. Ji bo Kurdîtiya xwe jî, dimirin. Tu kes vê yekê nikare înkare bike... Kurd hesibandin û di edebiyata Kurdî de hesibandin ne yek in.

Divê em pîvanên xwe rast hilbijêrin. Di vir de divê em qala dîsa di “Yenî Însan” de nivîsa Yilmaz Varolî ya hatibû weşandinê bikin. Ez jî, bêguman gotina wî yê bo berhemêke edebî “ziman binyat e” rast dibînim. Hên jî, em berhemêke edebî malê netewekî nine, malê zima-

nekî bibînim. Belkî ev dîtîn, me heta dawîya rast biborîne, bibe. Ji bo vê yekê, ku me qala edebiyata Kurdî kir, em bizanin ku em ê qala zimanê Kurdî jî dikin. M. Ercan wekokek mîna **Pablo Neruda** dide: “Pablo Neruda nivîskarekî Şilî ye... Zimanê wî yê nivîsê Îspanyolî ye, nizamî ye dîzanî?” dibêje û dipirse. Erê, lê di vir de şaşiyek tune ye. Ji bo ku Pablo Neruda bi zimanê xwe yê neteweyî dinivîsîne. Yanê, zimanê neteweyî Şilî Îspanyolî ye.

Ber qedandina gotinên xwe dixwazim li ser gotinên nivîskarekî din rawestim. Di demek nêzîk de di rojnâmeya “ROJ” de nivîsek Yilmaz Odabaşî hatibû weşandinê. Bi gotin û pêşniyara wî em hin jî dikevin tariyê. Peyvên rast, navên rewşê tê winda kirin. Yilmaz Odabaşî “Helbestên Tirkî nîne, helbestên Tirkîyê bibêjin” dibêje û pêşniyar dike. Ev riya înkare, riya gotin û dîtînê resmî yê ku di nav mijûdûmanê de heyyên neteweyekî din bihelîne û winda bike... Pir sal in TC û kevna wê Osmanî jî weha digot û gelek tecrûbe kir.

Di dawî de dibêjim: Werin, dev ji bi peyvan lîstinê berdin, her tişt bi rengî xwe û bi navî xwe em bi reng û nav bikin. Tam û kêr, tijî û vala, bûhagiran an na, çi bi Kurdî hatiye nivîsandînê, ev jî edebiyata Kurdî tîr hesibandinê. Ez dibêjim, di edebiyata Kurdî de bûyin, di zimanê Kurdî de bûyin e.

LI SER SALVEGERÊN BÛYER Û KESÊN BIRÛMET

GABAR ÇIYAN

Hunermendê mezin Mihemed Arifê Cizîrî, 17 kanûna berî 1986 de çubû ser heqîya xwe. Di salvegara mirina wî de, dil dixwest ku ew ji teref hunermên kurd piralî hatiba nîrxînin. Lê ev nebûn. Çend tişt bûn, lê gavên biçûk bûn...

Her di wê mihê de salvegara mirina Mîr Kamuran Bedîrxanî hebû. Ew layiqî bîranîneke piralî bû. Daweya 49'an di meha kanûnê de bubû. Nîrxandinên piralî çênebûn. Berî wê mehê, di meha mijdarê de, salvegara mirina şairê nemir Goran, ya mîmarê marşa netewî "Ey Reqîb" Dildar, qetilkirina zarokên kurd di sînema Amûdê de bû. Gelek ji van salvegeran nehatine bîra me...

Hejmarek mezin ji kurdan li welatên xerîb dijîn. Em xelkên din dibînin. Ew ji bo ozan û nivîskarên xwe, ji bo Mihemed Arifên xwe, bi dehan pirtûk nivîstî ne. Ji bilî salveger û cejnên wan yên netewî, bi dehan civîn, konferans û çalakiyên din li ser kesên wisan nasdar û hêja çêkirine û çêdikin. Li ser wan û berhemên wan ji nûh ve disekinin û dinîrxînin. Ji ber ku nîrx û qîmetin ku welatan dikin welat: Çiya ne, qiymetên sererd û binerd in, devî ne, çem in, gol in, jiyana li ser wê xakê ye, evîn e, şer e. JIYAN û TEBÎET bi xwe ye. Ev herdu kehnî ne ku çand û tore jê peyda bûne. Mirov li ser vê xweşiyê hatiye nik hevudû û zimanek û dîrokek hatiye rastê. Kesên mîna Mihemed Arifê Cizîrî jî, bi stiranên xwe, vê jiyanê bi me xweştir dikin. Tim welatê me dihênine bîra mirovî. Me bêhtir bi xaka niştimanê ve girê didin.

Bi du aliyên xwe, em hinekî xwe nûh bikin dê baş bibe. Ev pêwîst in û em dereng mane: Ji bilî salveger û cejnên me yên tradîsyonel (avakirina Komara Mehabadê, Newroz, gavavêtina 15ê Tebaxê, mirina rehmetiyê Barzanî, Qasimlo, Mazlum Doxan û hwd...), giringe ku hêzên me gavekî din bavêjin û di salnamê xwe de çend salvegerên din jî bicîh bikin. Wan kesên ku ji bo pêşketina çand, ziman û toreya kurdî kar kirine û ne li jiyanê ne, salvegara mirina wan di salnamên xwe de binîvisin. Bi alîkariya

SALVEGERÊN KESÊN BIRÛMET

wan bibe adet ku em berî salvegerên qîmetên xwe lêkolînan li ser berhemên wan û hwd. çêbikin û di roja mirina wan de, bi hîs û zanyarî wan bi bîr bînin.

Ji bo jiyandina berhemên kesên mîna Mihemed Arifî, pêwîste ku muzîsyenên kurd bi berpirsiyariya xwe rabin. Stiranên wan bistirin. Wan bidine jiyandin. Stiranên wan li ser stîllêdan û şewestirandina wan bêne notakirin û parastin.

Hozan ne ew in ku çend stiranên sloganwarî bêjin û xwe di pişt sloganên xwe de biparêzin. Stranên me yên kevn ku lehengiyê tînin zimên (weke mîsal li ser mîrê Botan û hwd.) pir in. Lê slogan di nava hunerê de hiliya ye. Stiran bi meriv xweş tên. Bila hişên xwe bînine serê xwe û li kehniya çanda xwe vegerin, ji wir avê vexwin û derkevin rê. Em çaverêne ku muzîsyenên me, kiyetên me, ku bi ava vê kehniyê mezin bûne, bidine jiyandin.

Ji bo muzîka kurdî ya kevnare wezîfeyên me yên dêûbavan jî hene ku em kasetên kesên mîna Mihemed Arif, Mihemed Şêxo, Meryem Xanê ji mala xwe kêm nekin. Zarokên xwe, bi stiranên wan mezin bikin.

Civat ji malabatan ava dibe. Divê, di her kelî û her saeta ku were bîra me, li ser van pirsan bi rexnegiriyeke dostanî em nêzî xwe, hêz û ozanên xwe û hwd. bibin ku bi tevahî, li heyî û qîmetên xwe xwedî derkevin û wan bidine jiyandin. Em ji wan bixwazin û alîkarbin ku salvegerên kesên mîna Mihemed Arifê Cizîrî çêbikin. Em hozanên xwe teşwîk bikin ku stiranên wan bêjin û biparêzin. Her ne Mihemed Arif tenê, lê belê li hemû şexsiyetên welatê xwe, ku xizmet ji çand, adet û zimanê me re kirine û ji bo xaka niştiman çûne ber sêdarê û canê xwe yê şêrîn dane, bibîr bînin. Ev heqê wan e. Deyn e...

— DU DÎTINÊN LI SER BERHEMÊN —
— EDEBIYATA KURDÎ —
— Lokman POLAT —

Di van demên dawî de li ser pirs û pirsgirekên edebiyatê gelek munaqêşe tête kirin. Ji bo problemên edebî munaqêşekirin tiştek baş e. Pêşveçûna edebiyata Kurdî di hêlek de bi munaqêşe, analîz û rexneyên edebî ve girêdayî ye.

Di rojnameya Roj, Ronahî û Ozgur Polîtîka de bi tirkî çend nivîsên munaqêşeyê yên li ser edebiyata Kurdî hatin weşandin. Di kovara Helwestê de jî bi Kurdî gelek nivîsên munaqêşeyê derketin.

Munaqêşe di esasê xwe de li ser vê bingehe tête meşandin: Nivîskarên ku bi eslê xwe Kurd in, lê berhemên xwe bi zimanekî din dinivîsînin, ev berhemên wan aîdê edebiyata Kurdî ne, yan na? Edebiyata Kurdî ji berhemên edebî yên xwerû bi Kurdî pêk tê? Yan edebiyata Kurdî bi gelek zimanên cure pêk tê? Ji bo vê mijarê du dîtinên ji hev cuda hene.

Dîtina yekem dibêje ku:

Berhemên ku bi zimanên biyaniyan tête nivîsîn aîdê edebiyata Kurdî nîn in. Berhemên ku ji alî nivîskarên ku bi eslê xwe Kurd in jî heger bi Kurdî nebe, bi zimanekî din be di nav edebiyata Kurdî de nayê pejirandin. Edebiyata Kurdî ji berhemên xwerû bi zimanê Kurdî pêk tê.

Dîtina duyem jî dibêje:

Kurdên ku bi zimanên din dinivîsînin, berhemên wan aîdê edebiyata Kurdî ne. Heger nivîskar bi eslê xwe Kurd be, ew berhemên xwe bi kîjan zimanî dinivîse bila binivîse, ew nivîskarek Kurd e û berhemên wî jî aîdê edebiyata Kurdî ye. Edebiyata Kurdî ji berhemên nivîskarên ku bi eslê xwe Kurd in û bi zimanê Kurdî, Tirkî, Erebî û Farisî nivîsîne pêk tê.

Di rojnameya “ROJ”ê de nivîskar Alî Bîçer û Yilmaz Odabaşî, di rojnameya “RONAHÎ”yê de Şigal Xezal û di rojnameya “Ozgur Polîtîka”yê de

DU DÎTINÊN LI SER EDEBIYATA KURDÎ

Şerefxan Cizîrî vê dîtina duyem diparêzin. Gelek nivîskarên Kurd û nivîskarên ku di kovara HELWESTê de dinivîsin dîtina yekem diparêzin.

Gelo kîjan dîtî rast e û çima rast e? Û, kîjan dîtî çewt e û çima çewt e? Divê ev tişt bête munaqeşekirin, bête analîzkirin.

Li gor bîr û baweriya min dîtina yekem rast e, dîtina duyem çewt e. Di edebiyatê de ziman bingeh e. Berhemek bi zimanî kîjan neteweyî bê nivîsandin aîdê edebiyata wî neteweyî ye, aîdê edebiyata wî zimanî ye. Berhemên ku têne afirandin bi kîjan zimanî be, ji wî zimanî re xizmet dike. Yên ku bi eslê xwe Kurd in, lê bi zimanê neteweyek din nivîsîne, tiştêkî ne nûh e. Ne tenê nivîskarên bi eslê xwe Kurd yê îroyîn berhemên xwe bi zimanê neteweyên din nivîsîne, gelek nivîskarên ku bi eslê xwe Kurd bûn duh jî, di dema berê de jî berhemên xwe bi zimanê neteweyên din nivîsîne. Westayê edebiyata Kurdî, Ehmedê Xanî vê rewşê dîtiye, zanibûye, loma jî berhema xwe ya nemir bi zimanê Kurdî nivîsiye. Hîmdarê kovara HAWARê C. A. Bedir-Xan jî di kovara HAWARê de li ser vê mijarê sekinîye û dîtîna xwe bi hawayekî zela nivîsiye. Wî jî, dîtina yekem ku îro ji alî gelean ve tete parastin, parastiye.

C. A. Bedir-Xan weha dibêje:

—«..... ji *eserên beriya îslamîyetê hesêb tiştêk ne maye. Piştî îslamîyetê ji nav Kurdan gelek şair, edib û peyayên zana rabûne, lê eserên xwe bi piranî bi erebî, bi farisî an bi tirkî nivîsandine; û ji wan millet û edebiyata wan re xizmeteke mezin kirine. Herçî şahirên tirkên en mezin yê ko serê tirkên bilind dikan Nabî, Nefhî û Fizûlî her sê jî Kurdmanc in.*» **Hawar hejmar :33**

Li jor jî xuya dike ku C. A. Bedir-Xan jî ji bo edebiyatê ziman bingeh digire.

Yên ku dîtina duyem ya çewt diparêzin parastvanên dîtina yekem bi tiştên bê bingeh sucdar dikan. Ew dibêjin: “Dewleta tirk û şovenîstên tirkên jî nivîskarên Kurd û berhemên wan yê tirkî di nav edebiyata tirkî de dihesibînin, nivîskaran jî wek nivîskarên tirk dihesibînin.”

Divê mirov tiştan tevlihev neke. Ev rastî divê bête zanîn. Em wexta ku dibêjin berhemên wan nivîskaran aîdê edebiyata tirkî ne, em nivîskarê wan

DU DÎTINÊN LI SER EDEBIYATA KURDÎ

berheman nakin tirk, em eslê wan înkâr nakin, em nasnameya wan ya netewî naguhirînin. Ew bi tirkî, erebî, farisî an jî bi zimanek din binivîsînin bi eslê xwe Kurd in. Mirovên weha heger Kurdîtiya xwe înkâr nakin, li Kurdîtiya xwe xweyî derdikevin û doza netewa Kurd diparêzin, ew welatparêzên Kurd in. wek mînak Yılmaz Odabaşı yan jî Alî Bîçer welatparêz û şoreşgerên Kurd in. Lê Kurdbûna wan nayê wê maneyê ku berhemên wan aîdê edebiyata Kurdî ne. Yaşar Kemal û Muradhan Mungan her kê jî bîstî zêdetir pirtûk weşandine, ew bi eslê xwe Kurd in, lê nivîskarên zimanê tirkî ne. Wan jî bo pêşveçûna zimanê tirkî xizmet kiriye. Wan zimanê tirkî dewlemend kiriye. Herdu jî bi devê xwe dibêjin em nivîskarên zimanê tirkî ne.

Nivîskarên ku bi eslê xwe Kurd in, lê bi tirkî, erebî yan jî farisî dinivîsin, berhemên wan bi temamî li ser Kurdan be jî, ev nabe delîl, nabe pîvan ku ew berhem aîdê edebiyata Kurdî ne. Nivîskarê Swêdî Thea OLJELUND çûye Kurdistanê geriyaye û li ser Kurdistanê romanek bi navê “Hästen Från Kurdistan – Hespên Ji Kurdistanê” nivîsiye. Babeta romanê li ser Kurdan e, bûyer li Kurdistanê derbas dibe. Ev berhema nivîskarê Swêdî aîdê edebiyata Kurdî ye, yan aîdê edebiyata Swêdî ye? Li gor min, ev berhem aîdê edebiyata Swêdî ye. Gelek berhemên Yaşar Kemal û selîm Berekat jî li ser Kurdan in, bûyerên ku diqewimin di Kurdistanê de çêdibin, qada bûyeran Kurdistan e. Lê, çawan ku romana nivîskarê Swêdî aîdê edebiyata Kurdî nîn e, yên van herdu nivîskaran jî aîdê edebiyata Kurdî nîn in.

Yaşar Kemal û Muradhan Mungan nabêjin em tirk in, dibêjin em nivîskarên zimanê tirkî ne. Rastî jî ev e. Nivîskarek yê wî zimanî ku ew pê dinivîsîne ye. Yanî nivîskar bi kîjan zimanî dinivîsîne, nivîskarê wî zimanî ye.

Şigan Xezal di rojnameya “RONAHÎ”yê de nivîsiye, dibêje:

—«.... Nivîskarên Kurd dikarin bi çar zimanî (Kurdî, Tirkî, erebî, Farisî NM.) berhem biafirînin û diafirînin jî. Berhemên ku bi van çar zimanan tête afirandin berhemên edebiyata Kurdî ne.»

Ev dîtîn, dîtinek çewt e. Dîtinek “milliyetçî ” ye , (neteweperest- natio- nalîst e) rast nîn e. Ji xwe yên ku dîtina duyem diparêzin, yên ku dibêjin

DU DÎTINÊN LI SER EDEBIYATA KURDÎ

nivîskarên ku Kurd in bi kîjan zimanî binivîsîn jî berhemên wan aîdê edebiyata Kurdî ye, bi bîr û ramanên “milliyetçî” tiyê van dîtînên xwe pêşkêş dikin û diparêzin. Li gor wan “Bila nivîskar Kurd be bi çî zimanî dinivîse bila binivîse, berhemên wî aîdê edebiyata Kurdî ye.” Gava pîvan weha “milliyetçî” tî be, hemû berhem dibe aîdê edebiyata Kurdî. Çewtîrî jî ji vê dîtina “milliyetçî” derdikeve holê.

Ideolojiya fermî ya dewleta tirk, kemalîzm jî her tiştî dike tirk û bi tirkîtiyê ve girê dide. Niha ji nav Kurdan jî hinek nivîskar rabûne her tiştî dikin Kurd û bi Kurdayetiyê ve girê didin. Nivîskar Cemşîd Bender û Selahatîn Mihotolî tiştêk nehêştin ku nekirin aîdê Kurdan. Divê mirov realîst be, rastiya bibîne. Afirandinên nivîskarên ku bi eslê xwe Kurd in, bike aîdê edebiyata Kurdî tiştêkî rast nîn e. Di nav nivîskarên ku bi eslê xwe Kurd in de gelek kes hêj jî Kurdîtiya xwe qebûl nake. Xwe Kurd nabîne. Li gor parastvanên dîtina duyem, divê berhemên wan kesan jî (ji bo ku bi eslê xwe Kurd in) di nav edebiyata Kurdî de bê hesibandin. Li gor min na! Divê neyê hesibandin.

Ev dîtînên ku min di vê nivîsê de hanî zimên, dîtînên min in, yên ku ez pê bawer dikim. Lê, ev nayê wê maneyê ku ev dîtîn rast in û munaqêşe li ser nabin. Na! Divê munaqêşe bibe. Rastî di bin “tekel” a tu kesek de nîn e. Rastiyên zanîstî-îlmî- di encama munaqêşeyan de û bi saya rexneyan derdikeve holê.

Nûha ez dixwazim dîtinek din jî pêşkêş bikim. Ev dîtîn jî hêj di serê min de rind zelal nebûye. Lê divê li ser vê dîtînê jî munaqêşe bê kirin. Dîtina min ya ku ez pêşkêşê munaqêşeyê dikim ev e.

Wek tete zanîn, li Tirkiyê, li Kurdistanê û li Ewropayê gelek kovar û rojnameyên Kurdan derketin û hinek hêj jî derdikevin. Ji berê hetanî niha ew weşanên ku derketin û derdikevin, li gor min divê mirov bike du beş, du kategorî:

Yek— Kovar û rojnameyên Kurdan.

Du— Kovar û rojnameyên Kurdî.

DU DÎTINÊN LI SER EDEBIYATA KURDÎ

Rojnameya Yenî Ulke, Ozgur Gundem, Ozgur Ulke, Yenî Polîtîka û niha jî Ozgur Polîtîka rojnameyên Kurdan in, lê rojnameyên Kurdî nîn in. Ji bo ku xwerû bi tirkî dihatin weşandin. Kovara Ozgur Halk, Newroz, Newroz Ateşî, Deng û hwd, kovarên Kurdan in, lê kovarên Kurdî nîn in. Ji bo ku xwerû bi Kurdî nîn in.

Rojnameya Welat, Welatê me, Azadiya Welat, Rojname, Armanç rojnameyên Kurdî ne. Ji bo ku xwerû bi Kurdî ne. Kovara Zend, Helwest, Nûdem, Şano û Sînema, Çira û hwd, kovarên Kurdî ne. Ji bo ku xwerû bi Kurdî têne weşandinê.

Mirov dikare ji bo berhemên edebî yên Kurdan jî du kategoriyên weha dayne. Berhemên edebî yên Kurdî û berhemên edebî yên Kurdan. Berhemên edebî yên Kurdan ew berhemin ku ji alî Kurdan ve bi zimanekî din hatine nivîsîn û aidê edebiyata wî zimanî ne. Mesela lêkolînavan dikarin lêkolînen weha bikin: Berhemên Kurdan yên di edebiyata tirkî, erebî û farisî de ne. Yan jî di edebiyata tirkî, erebî, farisî de berhemên Kurdan.....

Kategoriya din jî, ji xwe ew berhemên ku bi zimanê Kurdî hatine nivîsandin in. Li ser vê kategoriyê munaqêşe tune ye. Hemû kes (Alî Bîçer ne tê de) van berhemên ku bi zimanê Kurdî hatine nivîsandin û têne nivîsîn di nav edebiyata Kurdî de dihesibînin, munaqêşe li ser kategoriya din e.

Li gor min, hendî ev munaqêşe bes e. Nivîskarên ku bi eslê xwe Kurdin û berhemên xwe bi zimanekî din dinivîsînin, heger li Kurdîtiya xwe xweyî derdikevin, doza Kurd û Kurdistanê diparêzin, divê em li wan nivîskarên welatpaêz xwedî derkevin, wan netehesînin cîhekî din. Divê em berhemên wan wergerînin Kurdî. Divê em wan û berhemên wan bi xwendevanên Kurd bidin danasînê. Divê li ser berhemên wan û li ser hemû berhemên nûh ku têtê afirandin, analîz bê kirin, bê nixandin.

CÎHANA ÇANDÎ Û EDEBÎ – Cîld : 1
Danasîn û Analîza Berhemên Edebî
Derdikeve

Cîhana Nivîskarên Kurd – 3

XELÎL DIHOKÎ Û BERHEMÊN WÎ

Di sala 1951'an de li bajarê Duhokê ji dayik bûye. Her ji sala 1970'yî dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Kurteçîrok û vekolînên edebî jî nivîsîne û di pirraniya rojname û kovarên kurdî de , li Kurdistanê û derveyî welat, belav kirîne. Di gelek fêstîvalên edebî de helbest, çîrok û semîner pêşkêş kirîne. Di sala 1973'yî de bûye endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd li başûrê Kurdistanê. Niha jî endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurde û yê Swêdê ye jî. Di sala 1982'an de, Ji ber terora faşîyên Îraqê revîye û gehiştîye şoreşa kurdî. Sala 1987'an hatiye welatê Swêd. Heta niha ev berhemên jêrî çap kirîne:

1. Te çi viya û min neanî. Dîwana helbestan, Kurdistan başûr 1982.
2. Leheng. Li ser nivîsîn û wergerandina çîrokên kurdên bakur, ji tîpên latînî bo yên erebî. Kurdistan başûr, 1983.
3. Gaziye ji cergê Asya. Dîwana helbestan, Swêd 1989.
4. Min digot û te vedgêra. Dîwana helbestan, Swêd 1990.
5. Ragirtin. Dîwana helbestan, bi swêdî û kurdî, Swêd 1990.
6. Helbesta hevçerx ya kurdî. Bergê I, antolojî, Swêd 1992.
7. Helbesta hevçerx ya kurdî. Bergê II, antolojî, Swêd 1994.
8. Helbesta hevçerx ya kurdî. Bergê III, antolojî, Swêd 1995.
9. Antolojiya çîroka nû ya kurmancên başûr. Swêd 1995.

Niha jî piroja çendîn pirtûkan li ber destên wî hene, lê giriftariyên çapkirinê hene. Hêviya me ew e di paşeroja nêzik de, pirtûkên wî bêne weşandin, ronhiyê bibînin...

— AZAR Û KOVANÊN HEJARAN DI ÇÎROKÊN —
— ŞÊRZAD HESENÎ DE —

— XELÎL DUHOKÎ —

Ew di sala 1952-an de, li bajarê Hevlêrê ji dayik bûye. Her li wî bajarê xwendiyê û di sala 1975-an de, pişka inglîzîyê li zanîngeha Bexda, bi dawî aniye. Piştî sala 1970 ê dest daye nivîsîna kurteçîrokan. Mişe gotar û vekolînên edebî jî nivîsîne û di rojname û kovarên kurdî de, belav kirîne. Heta niha ev pirtûkên jêrî çapkirîne:

1. Tenyayî. Komele çîrok, 1983.
2. Be tûreyî awirêk le rabirdû bide-rewe. Şanogerî, ji inglîzî wergerandiye, 1986.
3. Gulî reş. Komele çîrok, 1988.
4. Firmêskekanî kukuxtî. Komele çîrok, ji inglîzî wergerandiye, 1988.

Şêrzad Hesen, nivîkarekê serketiyê û cihêkê taybet di qada edebiyata kurdî (Kurmanciya jêrî-soranî) de heye. Çîrokên wî ji aliyê form û naverokê ve bi hêz in. Zimanê wî sivik û xweş e. Ji bo têgehiştina berhemên wî, xwendevan zehmetê nabîne, çinku ew ji bo gelê xwe dinivîse û dixwaze di rê ya edebî de, xizmetê bike û gelê xwe jî hişyar bike. Hêvênê çîrokên wî, li ser girif-

tariyên jiyana rojane ne û qaremanên wî jî, ji texa feqîr û hejara ne.

Nivîskar di vê kurteçîroka xwe de, li ser rewşa jîneka kurd diraweste. Mêrê wê dimire û ew bi kurê xwe yê biçûk ve, dikeve ber hîg û dîngên jiyana giran. Ew xort û ciwan e, lê kes û kar rê li mêrkirina wê digirin. Ew çendîn salan li ber sitem û zulma kes û karan dimîne, lê paşan kurkê xwe digire û direve, ber bi bajarê diçe. Xwe ji ber wan vedişêre û bi wî rengî dijî. Hemî jiyana xwe bi karên xelkê, ji balavê, nanpehtî û paqijkirinê ve dibûrîne û lawê xwe bi serbilindî û serferazî mezin dike. Jinekê jê re diîne û nahêle tiliya kesê bête navçavan. Ew mirov e û dilê wê jî diçe jiyane, lê ji bo ku, lawê xwe bigehîne armanca, ew van qurbaniya dide. Li vîre rola pîroza jîna kurd xuya dibe ku, çewa xwe disoje da ku ronahiyê bide kurê xwe. Nivîskar zîrekane diçe nav derûna bîjîneka kurd, rewş û qurbaniyên wê destnîşan dike.

Ev çîroke ji pirtûka wî ya bi navê (Tenyayî) hatiye wergertin. Ez wê ji tîpên erebî werdigerînin yê latînî û hêvîdarim dilê xwendenan xweş bike.

ÇÎROKÊN ŞÊRZAD HESENÎ

BÊWEJIN

Bem ser le beyaniye zuwey hawîn. Beyanî pirr le xewn û lezzet û tiwanewey kurtî şew. Le jêr lêfe tenkekey hate der. Lêfeyekî nawax-in luke kem hestayewe. Leçk û lêwî kiras û kewakey berdayewe. Doxînekey xizabû. Destî geyandê û helkêşayewe. Leşî wişk û tînûy biyabanêke. Be dirêjayî penca salî rêperro be serçû. Tenha yek sal baranî dîwe. Şew û rojî salanêkî zor dên û deron. Ew her ew biyabane rênuweye. Gelê le biyabanîş be fîztir e. Hîç biyabanêkî mezin û gewre tînwêtî xoy naşarêtewe. Biyaban deteqê. deqlîşê. Rêbware manduwekan win deka û deyankujê. Ger tûreş bû, reşebay şêtî rojhelat û rojawa denêrê. Gund, şar û wilate dût û nizîkekan pirr deka le xol û toz. Belam em bêwejine, biyabanêkî wişk û hêmine. Sî sal pirr baran têperrîwe. Em tînwêtî xoy şardotewe. Tînû bo baranî sedeha zistan deysarêtewe. Çinku gund û piyawe maqûlekanî neyanhêşt. Şerm û abrû, ew delemey le sikya bû. Mamekanî deleme. Xalwanî deleme. Jinanî mam, jinanî xal, xuşkanî xal û mam, xaloza û purza kobûnewe: Nabê şû bikatewe. Şûreyîye! Kê deygot wa zû demrê. Xoşî wîst. şuwî pê kird. Salêk nesûrrayewe mird. Bêwejinêk û

tenyayî û sawayek. Bes rojgar dê û derwa. Eweta awirêkî lay çepê dayewe. Seyrêkî çîxekey kird. Kê lew bawere da bû, ew bêçwey le gund û şar, le ser sîng û pişt bexêwî kird. Êsta yekem mangî zawayetî bê.? Afretêkî rû sûrîşî le lawe xewtibê.?

Ruwew rojhelat rûy wergêra. Tem û tarîkî şew gird û çiya dûrekanî dapoşibû. Hêsta şefeq e. Malekeşyan le ser girdêka gîrsatewe. Detwanê deyeha serban û naw hewşî nizîk bibînê. Sedeha ne dût û ne nizîk. Hezareha serbanî dûrtir. Kelegey-etîyekey ziyatir way kird deşte nizîkekan nizîktir bibînê. Yekem beyaniye hez be we bika çaw be serban û naw hewşekana bigêrê. Loçî kiras û kewakey saf kirdewe. Destêkî geyandewe lastîkî nîfokey. Ziyatir helkêşayewe. Demew niwêjî beyane. Debwaye wek rojanî dîke. Hezaran rojanîtir, be ser pêplîkekana bête xwarê. Be awî bermîleke destniwêj helbigrê. Belam xewne pirr şermekey emşew le niwêjî çuwand. Beyaniyan xwarewe. Naw heşeke. Jorekan sard û xamoş û pirr tirsin. Beyaniyan bermalkey beranber dû wêneke radexa. Wêney baw û kurr. Herdû wêneke hê temenî gencêtîn. Rûxsar û akarî yekdî heldegirin. Wêney bawkeke zerd helgerawe, sîmay mirdinî pêwe diyere. Le çend layekewe teqîwe. Camekeşî nagorrin. Neba weku êsqanî xawene mirduwekey bibê be

ÇIROKÊN ŞÊRZAD HESENÎ

ard. Zurbey beyaniyan her be ser bermalekewe, seyrî wêne zerdeke deka û degri û dekrruzîtewe:

"Zû cêt hêstim!"

Hendê beyaniyan daydegrê. Têr seyrî deka. Maçî deka. Boy degri û çawekanî desrîtewe. Ke têr girya be bizmarekewe helîdewasêtewe.

Îmro beyanî, le jêr kiras û kewa xemdarekey. Le nêwan tarîkî û temî em beyanîye zuwe da, le dûrwe le tabloyekî reş deçê. Bêwejin zoryan reş poşin. Emîş herwa. Sî sale reşî poşîwe. Heta le zemawendî kure taqanekey da. Kesê lay lê nekirdewe. Daway lê bika, em cile reşane bigorrê. Dirawsêyek, xizmêk, pîremêrdêk, pîrejinêk, kurrêk, kiçêk û heta kur-rekey xoy. Ew kurey le pêrawî da goştî ew leşe nasik û ciwaney bo tiwandewe. Gund û şarî birrî. Ew mal û ew mal.

Karekerî, cilşorî, nanpêwederî. Pênc salan bû ke be kolî dada û le zolmî xalwan û maman, gundî cê hêst. Le şarî pirr le mend û şêr xoy win kird. Be rûy ew piyawane dera-westa ke xwênî gamêşêk le demarekanyana desorrê. Em kun û ew kun xoy deşardewe. Şwên pêyan helgirtibû. Rijanî xwênî le ber çaw bû. Belam ew roje pirr tirsane royîştin. Êsta em kurrey naw çîxeke, dêwî hemû tirsêk rawdenê.

Be hemû layek da milî werçerxand. Dîsanewe serbanêkî zorî bînî. Koşk,

xanûy hakezayî, xanûy qurr, çendanêkîtir ne koşk û ne qurr. Rêzêkî zor le cilî helxirawî şew. Aryelî zorî telefizyon. Çiwar paye û qerewêle. Perde û kulley zor. Rengaw reng sor, spî û zerd. Hêsta zue le şîrîn xewdan. Le her çwar lawe kullekan dadirawnetewe. Xewî be cûteş weagahatinî wa zuwî nawê. Cestey minale wirdîlekan be serbanewe nûsawin. Çend serbanêkî çol, çendanêkî dîkey qelebalix. Serbanî şûredar, serbanî bê şûre, şûrey nizim, şûrey bilind. Lem gereke da jimarey çîxekan le kulle ziyatirin. Le hawîna hemû şitê nîmçe rûte. Hez deka terr bibêtewe. Le wişkayî naw naxî xoy qels û bêzar e. Mîrov, balinde, dîrext. Tenha ew xemî pîre dîrextêkî heye û aw naygatê. Dîrextêk bo dilopêk awî bizir regî be naw naxî zewîyêkî wişk û sûtaw da robiçê. Dîrextî pîr û bê aw çiro nakat. Hemû şitê degorrê. Le batî darî radyo konekanî zamanî zû, aryelî telefizyon be ser zurbey serbanakanewe diyarin. Xwardin, nustin, cil û berg, dem û çaw, qijdahînan, serban, şeqam, afret, piyaw, naw, hemû gorrawî û degorên. Reng werdegirin û reng berdeden. Tewaw... Em be serçû. Tenha xemî xoy heldegirê. Wek minalî dawî kolare winbuwekey rabkêşêtewe. Le ser xo nîgay dûr helfirîwî gerrandewe. Le çiya dûrekanewe bo girde dûr û nizîkekan, serbane dûrekan, serbane

ÇÎROKÊN ŞÊRZAD HESENÎ

dûr û nîzîkekan. Nîzîk. Nîzîktir. diwayî le serbanekey xoyana gîrsayewe. Ew serbaney le serî û le jêrî da, salanêke her be tenya dexewê. Şîrêk le serbaneke sirincî ranekêşa. Ger em çîxe nebê, serbanêkî rût û çole. Ke bo dûbare seyrêkî çîxekey kirdewe, le naxewe daçlekî. Dîmeneke asayî nebû. Muçîrkî sardî piya dehat. sertapay giyanî kewte mîrûle kirdin. Be birînêkî nadiyar û şarawe kulayewe. Kilawey çokî şil bû. Kemêk delerzê. Hestêkî têkel le tirs û şerim daygirt. Cogeley ser birrbirrey piştî areqey kird. Çawekanî daxist. dûbare helîhênayewe. Be kizî serincî dîmenekey da. Çîxeke le yek lawe kirabuwewe. Be perdeyek dadirabuwewe. Le jêr perdekekewe dû pêy lûs û biçkolanewe dû pêy gewre û borî bînî. Le jêrewê le tixûbî pedekewe tirazabûn. Dû belekî tûkin û dû belek û pûzî lûs le yektirî alabûn. Wek dû marî estûrî aşîqe û maşîqe be yekewe nûsabûn. Xaw û mandû rakîşabûn. Pîzuwî derpêy afeteke ta çokanî helkişabû. Arezûy kird weagayan bênê. Arezûşî nekird. Neşyawe. Mangî yekemî bûkênî, weagahênan gunah e. Wîstî wek xewnî xoşî kwêrêk be yadî bêtewe. Bîrî çotewe. dû beleke lûseke le beleke tûkinekan xirr û pirr tirin. Le we deçê xwên û hêzyan le beleke tûkinekanewe wergirtibê. Le dilî xoyewe gutî:

" Yekem sal, êmeş her wa bûyn. Her ew sale û hîçtir!"

Dîmeneke ziyatir matî kird. Dasa-newe le dîmenekewe nîgay rûwew rojawa helbirrî. Çawêkî be serban û kulle û çîx û aryel û hewş û kolanekana xîşandewe. Bîrî le salanî kon û zû kirdewe. Pencî salî temen, çî kird? Çî bika? Hemû jîyanî wek momêk bo kureke dagîrsand. Xem û tirsêk dinyay jêr em şefekey lê tarîk kird. Tirs û xemî em afretey mangêke kurrekey lê zewit kiduwe. Îtir em çawerwanî çî deka? Lem diwayîye da pîremêrdêkî zor hatin û dawayan kird. Axo şiyawe diway em temene dirêje cile reş û xemdarîyekey dabikenê.? Naşê. Bîrî kewtewe, şewêkyan kurrekey çî pê kird. Zanîbûy mame Ebey Tutinçî daway kiduwe. Ew şewe hîzar car ti-layewe. Her abrûy bird. Dirawsêyekan gwêyan le hera û qarr û qîreke bû. Kurrekey her dey-nirrnd:

" Şerim naka. Be pîrî xoy terr deka-tewe.?" Xelkî dewr û berî serbaneke mat û sersam bûn. Ewaney be pêwe bûn, danîştnewe. Ewaneşî ke danîştibûn le hejmetana helsanewe serpê. Gwê lêyan bû ke deyangut:

" Tû xwa gunah. Zulme. Gelê zulme way pê kird."

Ew şewe be kul bo bextî xoy girya. Pîrseyekî bîr hatewe. Mêrdî Zêrînîş mird. Bêwejin zor bûyne. Îmrro be kamî dilî xoy degrî. Îtir bo negrî.

ÇÎROKÊN ŞÊRZAD HESENÎ

Her ew tinoke firmêskane xemekey deşonewe.

Kit û pirr gwêy le teqey derkagebû. Weaga hatewe. "Debê kêbê?" Le ser xo hengawî na, geyîste astî gwiswaneke. Serî xwar kirdewe. Tenha camanekey bînî:

- Fermû krrim, kêy?

- Dapîre, Ciwamêr weagaye?

Wişey "dapîre" le naxewe helîkend. Ke dem û çawî kabiray bînî, nasîyewe. Hawrêy qurrrakî Ciwamêr bû. Êsta zor şiyawe weagay bênê. Lew dîw çîxekewe be dengêkî pirr le xem û giryan û bêzarîyewe bangî kird:

- Ciwamêr, kurrim Ciwamêr.

Ciwamêr legel dengeke daçlekî. Weagahat. Hestayewe. Xoy lêk rakêşayewe, Çawekanî helgiloft. Her be cilî îşewe nûstibû. Cilî jêr barî geç û xol û qurr. Xo gorrînî nedewîst. Le jêr çîx û perdekeke hate derê. Daykî seyrî dekird. Henasey Hewanewey deda. Belekekan le yekdî bûnewe, yektiryan azad kird. Naxoştirîn azadî. Girêy nihênîyek le naxî bêwejinekeş kirayewe. Ciwamêr berew qaldirmekan miî na, dû dû pîpliyekekan debrî. Be hewşeke da degerra. Bo kilaşekanî degerra. Dozîyewe, le pêy helkêşa. Le xwarewe dengî hate ber gwê:

- Ey çayeke dayke?

Dayke welamî nebû. Be şermewe serî daxist. Yekem beyanîye çay bo lê nenawe. Em xewn û xeyale çî bû?

Key wabuwe? Tem û tarîkî rewîyewe. Teqey dergake hat. Kurrekey kirdîyewe. Dayxistewe. Kiz û mat her be pêwe westa bû. Bûk helneta. Bêdengî û tenyayî xemêkû qursî bo hêna. Janî gerdelûlêkî betîn naxî pirr toz û xolî xem kird. Serkewt, taqurgî girt. Êsta le jêr karesatî rojanî êsta û rabirdûy da deynaland. Bêdeng deynalan. Taze bûk her helneta le xew. Ta tozê em bêdengîye bimalê. Zerdey xor derkewt. Hêdî hêdî tarîkî şeqam û serban û hewşe û kolanekanî raw dena!

PEYVÊN GIRAN

Abru	: Hetik, fihêt
Afret	: Jin
Areq	: Xuh
Aryel	: Antên

Bermalek	: Şemilka nivêjê,
Çarçef	
Bêwjin	: Bîjin, jinebî, jina
mêr lê mirî	
Beyanî	: Siharê, spêdê, subê

Biçkulane	: Biçûk
-----------	---------

Çîxe	: Perde, perjan
------	-----------------

Dapoşibû	: Têwerkirîbû
Deleme	: Negehiştî, xag, xav
Derwa	: Diçe, dere
Dirawsê	: Hevsî, cîran, cînar
Dirext	: Dar

ÇÎROKÊN ŞÊRZAD HESENÎ

Diwayî	: Dawî, dîmahîk	Piyaw	: Mêr, zêlam, nêr
Firmêsk	: Rondik, hêstir	Qaldirme	: Peyîsk, pêpelîsk
Fîztir	: Naziktir, şengtir	Qurs	: Giran, bi seng
Gerdelûl	: Bahoz	Sawa	: Sava, pîrr biçûk
Gîrsa	: Bi cihekê	Sersam	: Damaw, sewda-
girêdayî, cêgîrbûn, bendbûn bi		ser, hêbetî	
cihekê ve		Sî	: Sîh, sih, 30
Helnesta	: Ranebû	Şardotewe	: Veşartî
Hengaw	: Pêngav	Şeqam	: Cade, rê
Keleget	: Mezin, bejin	Şêr	: Dîn, bêmejî
bilind û kelex mezin		Şûreyî	: Fihêt, kirêt, eyb
Kewa	: Serkiras, cubbe	Taqane	: Êkane, bi tenê
Kîrabû	: Vekirîbû	Temen	: Emîr, jî
Kolare	: Firoka kaxezî,	Tirazabûn	: Ji hev cidabûn,
teyara ji kaxezê çêdikin		dûrî hev	
Kulek	: Kule, patê li dûr	Weagaye	: Hişyare
nivînê nivistina şevê diwerînin li		Xiza	: Tehisî, bi dizî
serbana		Xol	: Ax, xak, gil, erd
Kwêrêk	: kore	Zemawend	: Dawet, govend, şahî
Luke	: Pembî		
Lûsek	: Hilî, bê mî		
Mang	: Meh, heyv		
Mat	: Bêdeng		
Naşê	: Nabe		
Nagatê	: Negehê,		
nagehîte			
Nawaxîn	: Naverok, pêrist,		
tê de			
Nûsabû	: Pêvemabû, bi		
hevre, pêkve			

*HELBESTA
HEVÇÊRX YA
KURDÎ
BERGÊ III
Amadekirin û Nivîsîna
Xelîl DÛJHOKÎ*

— RASTNIVÎSÎNA KURDÎ —

— M. YILMAZ —

Îro di dinyayê de 3000-40000 hezar zimanên ji hev cuda hene, her zimanek qanûna rastnivîsîna xwe heye, her zimanek bi cureke tête nivîsandin. Piraniya zimanan li ser bingeha qanûnên fonetîkî pêşketine. Zimanê kurdî jî bi piranî li ser qanûnên fonetîkî li hev hatiye. Yanê mirov çawa diaxife wisan jî dinivîsîne. Lê herçiqas li ser qanûnên fonetîkî pêşketibe jî, divê em guh bidin qanûnên morfolojî û dîrokî jî. Li gor pîvanên zanistîya zimên, rast û tam nenivîsîna peyvan, tête wateya texrîbkirinê û xerakirinê. Di vî warî de zimanzanên kurd hevbîr in. Divê em jî weke wan hevbîr bin. Di zimanê axaftinê de, ji ber nexwendewarî, hîkariya zimanên cîranan; rewşa siyasî, civakî, dîrok û erdnasî bûne sedemên texrîbkirinan. Bi gotineke din me kurdan jî, ji zimanên cîran û biyaniyan, dengên peyvan bi deyn kirine û xistine nav zimanê xwe. Ji lewre jî gelek caran qanûnên fonetîkî nabin pîvan. Ji bo yekitiya zimanê kurdî, zimanzan û rewşenbîrên kurdan dixebitin û bere- bere derbasî rastnivîsîna zimanê xwe dibin. Bêşik rastnivîsîna kurdî riya yekitiya zimanê kurdî vedike û dibe ku gelşên zimanê Kurdî jî çareser bibin.

Li gorî zanistîya zimên sê prînsîpên rastnivîsînê hene, ew jî ev in:

1. Qanûnên fonetîkî
2. Qanûnên dîrokî
3. Qanûnên morfolojî

Nimûneyên rastnivîsînê

1. Xweguhartina dengan

Şivan, nan, dîwar, kulav, welat, ziman: Ez Şivên dibînim anku ez Şivanî dibînim.. Ez nê dixwim. Ez pişt xwe didim dîwêr. Ez diçim welêt.

2. Ketina endamên peyvan

Çewt: Bêje, derkeve, lêxe...

Rast: Bibêje, derbikeve, lêbixe...

3. Ketina dengan

Gava ku em behsa ketina dengan dikin, hingê du tişt tene ser zimanê me, ew her du tişt jî ev in: Zimanê axaftinê û nivîsandinê.

Zimanê axaftinê: Bavêje, bişkêne...

Zimanê nivîsandinê: Biavêje, bişikêne.

RASTNIVÎSÎNA KURDÎ

Xweguhartina *dengan*

Celadet Alî Bedirxan dibêje : "

Ê, Î - Ev dengdêrên ha tu caran nakevin ber dengdara "y" ê. Lê heke ev dengdêr bi awakî bi "y" yê ve bûne hingê ev yanî "ê" û "î" bi dengdêra "î" yê diguhêrin û ev "î" dikeve şûna wan. Wekî niho:

Ê-

Pê pîyên min vî piyî

Dê diya te vê diyê

Rê rîya wan van rîyan.

Dr. Kamuran Alî Bedir-xan û Reşo Zîlan jî hevbiir in ku tîpên "ê", "î" şûna xwe didin tîpa "î". Herwisan kovara "**Şano û Sînema**" "**Armanç**" "**Helwest**" "**Hêvî**" û gelek kovarên din jî li ser vê şopê dimeş in.

Em dê çend nimûneyên din jî li jêrê binivîsînin.
Xweguhertina dengê "î" bi dengê "i"

Xanî - xaniyê min , xaniyên min
Mêranî - Mêraniya min, mêraniya wî
Mêranî - mêranîyên wî
Xaniyek - **Xaniyekî** mezin, xaniyên kurdan
dewlemend - dewlemendiyeke mezin
Zevî - zevîyê min, zevîyên me
devî - devîyê çiyê, devîyên çiyê.

Xweguhartina *dengê*

"a" bi dengê "ê"

Halê rast / Halê tewandin

Welat - **Wêlê**: Ez diçim welêt.

Bajar - **bajêr**: Ez diçim bajêr.

Dewar - **dîwêr**: Piştî xwe bide dîwêr!

Aş - **êş**: Ez diçim êş.

Nan - **nên**: Ez nêr dixwim.

Min nan xwar.

Agir - **êgir**: Ez êgir pêdixim. **Min** agir pêxist.

Ziman - **zimên**: Gelşên zimên....

Derman - **dermên**: Ez dermên dikirim.

Di halê tewangî de navên nêr forma xwe distînin paştirtika "î" lê navên mê forma xwe distînin pirtika "ê".

Dema niha û dema berê niha

Di dema niha de berkirdar(bire-ser,objekt) tete tewandin

Ez baranî dibînim. **Min** baran dît.

(Di dema bihirî (împerfekt) de subjekt tete tewandin)

Ez Mahmedî dibînim. **Min** Mahmed dît.

Ez Rizgoyî dibînim. **Min** Rizgo dît.

Ez Hesenî dibînim. **Min** Hesen dît.

Ez Rizgiyî dibînim. **Min** Rizgo dît.

Ez kerguhî dibînim. **Min** kerguh dît.

Ez kerî dibînim. **Min** ker dît.

RASTNIVÎSÎNA KURDÎ

Li gor rênivîsîna Celadet Alî Bedir-Xan û Kamuran Bedir-Xan danîne, tewandina navdêran mecbûrî ye. Herweha zimanzanê Kurd, Reşo Zîlan û gelek nivîskar û kovar li ser vê şopê dimeşin.

Nimûneyên tewandinê, di zara-vayê zazakî de. (Di pirtûka Zardestî de tewandina navan hebûye).

Wekî niho:

Zazakî: Ez Hesênî vînena. Ez Robînî vînena.

Kurmancî: Ez Hesênî dibînim. Ez Robînî dibînim.

Navdêrên mê li gor deman têne tewandin. Paşkoka tîpa "ê" zêdeyî ser navdêran dibe.

Wekî niho:

Ez Rihanê dibînim. **Min** Rihan dît.

Min ew dît

Ez Perîşanê dibînim. **Min** Perîşan dît. **Min** ew dît.

Gava ku navdêrên mê kirdar bin, hingê weke xwe dimînin, nahên tewandin.

Perîşan **min** dibîne. Ew **min** dibîne.

Perîşan Rizgoyî dibîne. Ew **wî** dibîne.

Perîşan **nên** dixwe. Ew **nên** dixwe.

Cînavê kî

Celadet Alî Bedirxan dibêje:

"Pronavên pirsyarkî dikevin komekên pirsyariyê û li gora pêkhatina komekê, carna kirar û carna jî bireser in".

Binêre: Bingehên Gramera Kurdmancî, rûpel 71.

Di vî warî de **Qanadê Kurdo weha dibêje:** "Di halê tewangî de cînavê **"kî"** forma xwe diguhêze ser **"kê"**.

Heger cînavê kî berkirdar(bireser) be, hingê têtê tewandin, dibe **"kê"**.

Şivan **kê** dibîne? Şivên **kî** dît?

Ew **kê** dibîne? Şivan **kê** dibîne?

Gava ku **"kî"** kirdar(kirar) be, hingê weke xwe dimîne.

Weke niho:

Kî Çeko dibe?

- Ez wî dibim.

Kî Rizgoyî dibe?

- Ez wî dibim.

Kî keçan dibîne?

- Ez wan dibînim.

Kî hespan dibîne?

- Ez wan dibînim.

Heger berkirdar(bireser), di hevokê de hebe, hingê cînavê **"k"**, dibe **"Kê"**

Kê Şivan kuşt?

- **Min** ew kuşt.

Kê Şivan dît?

- **Min** ew dît.

Cînavên yekê û yekî

Cînavên yekê ji bo mê ye.

Wekî niho:

Yekê ji min re got(**Wê** ji min re got).

RASTNIVÎSÎNA KURDÎ

Ez ji yekê hez dikim. Ez ji wê hez dikim.

Cinavê yekî ji bo nêr e.

Weke niho:

Yekî ji min re got. Wî ji min re got.

Yekî ji Rizgoyî re got. Wî ji Rizgoyî re got.

Halê rast Yek hat, yek tê, yek diçe.

Birayê **Celadet Bedir-Xan Dr. Kamuran Alî Bedir-Xan** di pirtûka xwe de wisan nivîsiye:

Heger navdêr bi "ê", "î" dengdêr yên mîna "ê, î"-yê dawî bê hingê şûna xwe didin "î" anku "e". Wekî niho:

Dê: Diya min anku deya min

Pê: Piyê min anku peyê

Rê: Riya min anku reya min. Her du form jî rast in.

Masî: Masiyê min

Xanî: Xaniyê min

"Herwekî têtê zanîn, navdêr di zimanê kurdî de têne tewandin. Li gor qesd û mebesta hevokê, hin paşpirtik bi navdêran ve têne zeliqandin ji bo ku zimên siviktir û hêsantir bibe. Bo nimûne, gava ez dibêjin, ez Perîşanê dibînim, paşpirtika tewangê li vir "ê" ye. Tîpa "ê" bi navdêr re têtê zeliqandin. Ez Perîşanê dibînim. Ez wê dibînim. Gava ku subjekt be, weke xwe dimînin, nahê tewandin.

Bo nimûne: Perîşan min dibîne.

Zimanzanê kurd Reşo Zîlan wisan dibêje: "Nivîskarên kurd ên nûh bi alîkariya apostrofeke ji navdêr vediqetînin ku ji kok şaş e û tişteki ne li rê ye". Bo nimûne: Ez Rihan'ê dibînim, ez keçik'ê dibînim, ez Xezal'ê dibînim, weke ku Reşo Zîlan diyar dike ev tişt ji binî ve çewt û zirarê dide zimanê me.

Di name, kovar

û

rojnameyan de:

07-11-1995 (name)

10ê tîrmehê, 1995 anku di 7ê tîrmeha 1995an de

Mirov nikare wisan binivîsîne: 10'ê tîrmeh, 1995

Di 7'ê tîrmeha 1995'an de. (Ev hevok çewt e).

Zimanzanê kurd **Reşo Zîlan** wisan dibêje:

"Herwekî têtê zanîn, di zaravayê kurmancî de navdêrên nêr û mê ew çî dibin bila bibin, divê li gor rewşa xwe ya di hevokê de bêne tewandin.

Keça me hê 4ê xwe danegirtiye. Em dê di 22ê meha tebaxê de li Serdestê bin."

ÇAVKANÎ: Bingehên Gramera Kurdmancî - Celadet Bedir-Xan Rêzimana Kurdî- Reşîdê Kurd

JI EDEBIYATA NÛJEN HELBESTÊN KURDÎ

MIN JÎ DÎT

DAWÊ XANÊ

MIN JÎ DÎT

Min jî dît.
Ketim,
Rabûm,
Por weşiya,
Keçel mam di nava civatê de.
Serê keçelî li dîwaran ket.
Hatin,
Birin,
Hew hatim.

Sînga jinê vebû,
Pêşîr xuya bûn.
Min xweziya xwe,
Bi zaroktiya xwe hanî,
Ketim nava pêşîran,
Mêtim mînanî çelîniyan,
Kî bûm,
Çi bûm?..
Tev çûne ji bîra min.
Çend helbestên bêxwedî
Û pirtûkek neçapkirî
Man di destê min de,
Ne kesî xwend
Û ne jî pirsî....

DIXWAZIM

Teyrên sipî û mezin,
Teyrên bêbav û zalim,
Hatin,
Hatin!...
Qîjîna qîzka Zero gîha asmanan,
Asman kor û ker.

Dayê!
Bes bike lorî.
Êdî ez xew naxwazim,
Êdî bes e şev.
Sibe çi çax e?
Ez roja geş dixwazim.
Bes e,
Bikişîne wan çiçikên pûç,
Êdî ez şîr naxwazim,
Jiyan dixwazim.

Teyrên bê perr,
Teyrên gewr...
Mîrin dizên,
Xwîn dizên.
Hawara Fata Zorê
Deşt û newal zingirand,
Deşt û newal kerr...
Wer ha wer!
Wer ha wer!
Ez destê te dixwazim.

REXNEGIRÎ Û ZIMANZANÎ

Cîhan DİLŞAD

Di nav nivîskarên Kurd de di her awayî de tevliheviyek heye. Gelek nivîskarên Kurd ji çîrvanokê re çîrok, ji çîrokê re roman, ji romanê re novel dibêjin. Kovarên Kurdî yên ku têne weşandinê li gor beşên cuda nînîn. Di kovarek de hemû beş (Çandî, edebî, Muzîk, Şano, siyaset, Felsefe, teorî, polîtîka û hwd.) hene. Di hêla weşanê de jî tevlihevî heye. Nivîskarên Kurd bi hemû tiştan mijûl dibin. Nivîskarek hem şair e, him romannivîs e, muzîsyen e, fîlmçêkir e, şanoger e, siyasetvan e, zimanzan e, Lêkolînvan e, weşanvan e, werhasil hemû tişt e. Ev ji çi tê?, sedemê wê tiştî çi ne? Ev jî karê lêkolînvanan e ku li ser lêkolînên îlmî bikin û encama wê derxin ronahiyê. Tu tişt bê sedem nabe. Helbet sedemê van tiştên ku min li jor bi kurtî hanî zimên jî hene.

Di nav kurdan de, xaseten di nav nivîskarên Kurd de rexnegirên edebî tune ne. Rexneyên li ser berhemên edebî (Helbest, Şano, Çîrok, Roman) yên Kurdî cîhê xwe negirtiye. Yên ku li ser navê rexnegiriya edebî hinek nivîsên rexnan dinivîsîn, tu alaqa nivîsên wan û rexnegiriya edebî bi hevdu re tune ne. Tevliheviya mezin jî di hêla rexne û rexnegirtinê de xwe nîşan dide. Rexnên ku tên kirin rexnên pûç û bi naveroka xwe rexnên vingî vala ne. Rexnên ku li ser navê rexne edebî tête kirin ji metoda rexnên edebî dûr in. Nivîskarek gava ku berhemek edebî digre destê xwe û li wê berhemê rexne digire li gor îlmê zanîstî yên edebî, li gor prensîp û metodên edebî li wê berhemê rexne nagre, li gor metoda zimanzaniyê, li gor qaîdên gramatikê li berhema edebî rexne digre. Maşallah!. Gelek nivîskarên kurd bûne zimanzan, xwe zimanzanên herî mezin dihesibînin. Berê dihatin gotin; “Kurd hemû dengbêjin” an jî, ji bo Kurdên

Rexnegirî û zimanzanî

başûrê piçûk(Kurdistana Suriyê} dihatin gotin; “Kurdên başûrê piçûk hemû şaîr in, helbestvan in.” Nûha jî bila bê gotin ku; “Hemû rewşenbîr û nivîskarên kurd zimanzan in.” (Zimanzanên(!) bê berhemkar.)

Ji bo ku gelek nivîskarên kurd di hêla zimanzaniyê de zor zîrek in (!) wexta ku berhemek edebî dinirxînin, an jî li ser berhemên edebî nivîsên rexnegiriyê dinivîstînin li gor zanîstiya xwe ya mezin(!), li gor zimanzaniya xwe rexne li wê berhema edebî dikin. “Zimanê nivîskar baş nîne”, “Ev nivîskar ziman nizanê”, “Haya wî ji gramatîka Kurdî nîn e” û her wek din, ev tişt dibin bingehe gotin û nivîsên wan yên rexneyî.

Divê ev nivîskarên weha (hinek jê ne nivîskarên lê rexnegir in) vê tiştî baş fêm bikin ku; Her nivîskar zimanzan nîn e. Yên ku helbest, çîrok û roman dinivîstînin hewce nîn e ku îlla zimanzan bin. Berhemên edebî tenê li gor metoda zimanzaniyê naye nîrxandin. Tenê li gorî gramatikê li ser berhemek edebî şîrovekirin û rexne girtin tişteki rast nîn e. Nivîskarekî tirk Azîz Nesîn, ku di cîhanê de, di qada navneteweyî de navdar bû û çend meh berê çû ser heqiya xwe di hevpeyvînek xwe de weha dibêje : “ Ez nivîskar im, ez zimanzan nîn im.” Gotineke pirr rast e. Nivîskarên edebî, çîroknivîs, romannivîs nivîskar in, lê zimanzan nîn in. Nîrxandina li ser berhemên wan divê li gor metoda rexnegirîya edebî bê kirin. Yên ku li ser berhemên nivîskaran rexneyan digrin, tenê li gorî zimanzaniyê rexne digrin ku ev jî tişteki xelet e.

Gelek nivîsên rexnegiriyê ku li ser berhemên Kurdî hatine nivîsandin û di kovarên cûre, cûre de hatine weşandinê ji zanîstiya îlmê edebî û ji zanyariya metoda edebî dûr in. Naveroka wan nivîsên rexneyan bi dilnebarî, bi hîsiyatên şexsî, bi hesûdî, û bi çavnebariyê tijî ne.

Rexneyên ku li ser hinek berhemên Kurdî hatine nivîsîn rexneyên edebî nînin. Ev ji bo her nivîskarek rastiyeke e ku di berhemên nivîskaran de gelek kêmanî hene. Nivîskar pêre, pêre xwe dikemilînin.

Hinek rexnegir berheman li gor zanyariya ziman dinirxînin in. Lê nafikirin gelo ev nivîskar çîroknivîs, romannivîs in, yan zimanzan in?. ❧

— Stranên mişext bo siwarê mişext —
**Ev helbest di dema mirina Cegerxwînî de peyda
bû, lewma ez wê diyarî wî dikem.**
— M. MAYÎ —

— Behî

Duhî Siwaro!
ji welatek dût
kimêtek hat nav warê me!
serê xwe bi xaniyê me vena
singepê bû li ber dergêhî
..... ji dil şihî!
Hozanek ya lê siwar bû
rûmetê wê posîde bû!
Çavêt wê rundik jê dibarîn!
Qîjîn bi (Gundê)ê me ket!
Dara belgê xwe werandin!
Payizê dada welatî!
Her we gavê...
xemla bihara me beyî!!
Lewma Siwaro!
kovana cergê min verût...
hemî hîvî lê bûn behî!

— Feqîyê Teyran

Duhî Siwaro...!
Feqê Teyran
Destê Şêxê Sen'an girt û
...gund - gund gerya!
Hemî (Mizgeft) hişyar kirin...
hijandin zengilê dêra!

— Melayê Cizîrî

Duhî Siwaro...!
Gorê Melayê Cizîrî
... qîrî veket!
hemî mirî rakirin ve û
...bang heldêra!

— Evînî

Duhî Siwaro...!
Zînê û Şemê
bo evîn û evîndara
bo Welî Dêwanê û Memê
...distarê kovana hêra!

— Girî

Duhî Siwaro...!
Ehmedê Nalbend û Goran
têr... têr girîn!
Ew giryê wan
bû helbesteka dîn û har
dilê min girt
... da ber kêra!

— Awaz

Duhî Siwaro...!
Ne pezê gundê me çerî
...ne berî çûne ber bêra!
Bilûra Şivanê me jî
li şûna awazê evînê
...xem jê barîn
strana têgirîn pêra!!

— Hewar

Duhî Siwaro...!
Ewra esmanê me nexwar!
Hewarek kete nav gundê me
... xanî hijyan!
Avêt me serevraz zivirîn
...kanî ne zan
Gundiyet me
li ber derokê xaniyê me
li hev kombûn û hewar kir
Ev strana tijî girî
bo min got û dil lerizîn:
— Ho Siwarê ceger pir xwîn!
Te cegerêt me kirin xwîn!
Birinê me kevnare bûn
Ser ji nuve
li dilê me derbûn birîn!!

Kurdistan
23 - 10 - 1985

BÎRA QEDERÊ

Mihemed Ozan

Netewîbûn, nêzîkbûn û yekbûnên politîk, bi hebûn û zanîna piralî ya "dîroka xwe" zûtir û qaîmtir (bihêztir) dibe. Netewa ku li ser dîroka xwe xwedî zaniyariyên piralî be, xeletiyên xwe yên dîrokî analîz dike û rê li ber xeletiyên digire. Kêmasiyên heyî ji holê radike, rewşê bere-pêş dibe û pêşveçûnên mezin bidest dixe. Gava mirov bixwaze mîsalekê bide, ez bawerim di vî alî de cihû mîsala herî mezin e. Ji ber ku serpêhatiyên wan bû naveroka bi sedan roman, fîlm û hwd...

Dema min romana "Bîra Qederê" xwend, gera mîsyonerek emerîkayî, Dr. Asahel Grant hate bîra min. Weke ku dihête zanîn, di dema Împaratoriya Aşûriyan de, mîna gelek deveran, hêrîşên aşûriyan çubû ser Îsrailê jî. Gelek cihû berbi Mezopotamyayê hatibûn ajotin (nefîkirin). Bûyera ajotina cihûyan, berî jîdayikbûna Mesîh bi çensedsalekê bubû. Ji bo asîmîlekirina (dinavxwedehilandin) îsraîliyan, cihûyên nefîbûyî li jor û jêra Mezopotamyayê hatibûn belavkirin, bicîhkirin. Dr. Grant filehekî protestan bû. Lê nijadcihû bû. Di destpêka sedsala 19an de tê Mezopotamyayê ku karê olî bike. Lê li wan cihûyên ku di dema aşûriyan de hatibû ajotin; li "rihên cihûyan yên

windabûyî" digere. Li dest, çiya û newalan, gund û bajaran bi salan digere, dimîne. Dr. Grand, di destpêkê de ji bilî kurdan, aşûriyan û kurdên Êzîdî, ji "rihên windabûyî" dihejmêre (dihe-sibîne). Ji adet û tore û çanda cihûyan derdikeve rê û bi wê awirê li adet û çandên xelkên mintiqê dinêre û wan dide ber hev. Dawiyê dighêje wê dîtîne ku; çand û adetên cihûyan ketiye nav wan xelkên navçê...

Ji bo avakirina romanekî, hebûn anjî peydakirina çîrokekê, gava yekem e. Bi awayeke din ku mirov bêje; çîrok, îskeleta romanê ye. Piştî peydakirina çîrokê, şopajotina di duv kehniya çîrokê û peydakirina jêdera wê pêwîst e ku çîrok bibe bixwîn û goşt. Piştî wan herdu pêwîstiyên bingeîn, pêtîvî bi hosteyekî ku di nav çand û adetên xwe de mezin bûbe, hakimê zimên be û xwedî tecrûbe, bisebir û bêhnfireh be, heye. Gava ev hebin, roman dikarin bêne afirandin.

Romana "Bîra Qederê", jiyana malbata Bedirxaniyan, bi taybetî jiyana Mîr Celadet ji xwe re binge girtiye. Roman li ser wêne, anjî tabloyên dîrokî ava bûye. Bi qasî ku di romana "Bîra Qederê" de xuyanî dike, avakirê romanê, hewlek baş daye ku tiştên ji romanekê re pêwîst e, bi dest xîne. Roman ji ajotina Mîr Bedir Xan dest pê dike. Paşê jiyana zarok û neviyên

BÎRA QEDERÊ

wî li Stenbolê, taxa Kadikoyê tê. Ji dayikbûna Celadet û zarokbûn û xortaniya wî, beşek bi serê xwe ye ku bêhna êş û jan, ken û girîn û evîndariyê jê difûre. Bêhna Stembola kevn bi hemû alî jê tê. Eleqatên Împaratoriya Osmanî û malbata Bedirxaniyan, danûstandiniyên Bedirxaniyan xwe bixwe, çûn û hatina xelkê ber bi wan, pîr alî hatiye raçavkirin.

Di folklora kurdî de erotîzm, bi şeweyekî hosteyî bicîh bûye. Di romanê de hebûna awirên erotîk, heyecaneke tabî li romanê zêde dike. Eşqa Celadet û Canan, pêwîst bû, ne aliyek ji romanê, lê diviya bi serê xwe romanek bûya.

Tabloyên berbi nêvî, pîrsgirêkên di nava dezgeha Împaratoriya Osmanî û nakokiyên di navbera kurd û miletên din ku di nava wê dezgehê de û bûye sedem ku fermana Bedirxaniyan careke din rabe, tîne ber çavan. Dawiya împaratoriye û hêza Ittihatîyan, paşê jî dijminantiya Kemal Paşa dibe sedem ku gelek Bedirxanî bêne ajotin anjî birevin. Celadet û Kamuran jî diçin Almanyayê. Li Munihe dest bi xwendina bilind dikin. Paşê, teşqeleyên şerê cîhanê dest pê dike û ew tîne Misirê. Di dawiyê de, Celadet li Şamê bi cîh dibe. Ji aliyekî derdê fransiyan û ji aliyê din rabûna kurdan. Têkçûna kurdan û bêhêvîtiya ku çêdibe. Û çîroka kovara Hawarê... Hejartiya Mîr Celadet... Zewaca wî bi Rewşen Xanimê re, çêbûna hardû zarokên wî

û perîşaniya wan... Çandina pembo û "Bîra Qederê" ku di nav erdê pembo de hatiye kolandin û dibe gora Celadet... Ev tev yek bi yek, mîna tabloyên pîrreng tîne nîşandan.

Roman, ji awira peydakirina û bikaranîna kehniyan bêkîşûr e û bi bîranînên Celadet ve hatiye xurtkirin. Bi hosteyî hatiye nivîsîn û mirov bi xwe re dibe cîhana wan. Roman bi herfên biçûk hatiye nivîsîn, xwendina wê zehmet e. Teşvîkirina xwendina berhemên kurdî, ji awira teknîka tîkîstkirina romanê, li ber çavan zêde nehatiye girtin. Ev li qelîteya naveroka romanê tesîr nake, lê xwendevanan ji bo xwendina romanê teşwîk nake.

Weke ku tê zanîn, her kar û şîxulek (Meslek) bi peyvên xwe yên taybetî, cîhanek wan ya zimên heye. Ev tişt ji bo çînen di nava civatê de jî derbas dibe. Di romanê de, gava qala feqîrtî, hejartî, birçîbûn, perîşantî, bêperebûn, bêqûtbûna û hwd. ya Celadet tê kirin, dewlemendbûna edebî ji awira feqîrtiyê ve dikaribû hîn baştir bihata zimên. Ji awira zimên ve nîrxandina berhemê hinekî wext dixwaze. Di hejmarên pêş yê Helwestê de li ser vê dê bête rawestîn..

Roman 260 rûpel e. Di nav weşanên Avesta de li Stenbolê derketiye.

Mehmed UZUN
BÎRA QEDERÊ
Roman
Weşanên Avesta

Li Ser Pirtûka “XWÎN Î HÊSTIRÊN ÇAVAN” Dawê XANÊ

Mizgînî li xwendevanan; edebiyata kurdî di warê kurteçîrokan de bi pirtûkeke hêja dewlemendtir bû. Birêz Lokman Polat ji we xwendevanan re **"Xwîn û Hêstirê Çavan"** pêşkêş kiriye. Daxwaziya min ew e ku hûn bixwînin û lê kûr û hûr bibin. Hûn dê bibînin ku pirtûk ji pir bûyeran pêk hatiye. Di pirtûkê de bîst û sê kurteçîrok hene. Bist û sê bûyer...

Di destpêkê de **"şehîdê Biçûk"** heye. Behzat zarokekî kurd e. Bi dilovanî mezin bûye. Welatparêz e. Di wê zaroktiya xwe de şoreşger e. Wedat Aydin şehîd ketiye. Ji bona Wedatî xwepêşandan çêdibe. Behzat jî dikeve xwepêşandanê, sloxanan davêje û kevîran davêje xwînxwaran. Xwînxwar bi çekan êrîş tîne ser wan. Behzat xedar birîndar dibe. Dijmin tête ser Behzatî. Behzat di wî halî de jî liberxwe dide. Paşê şehîd dikeve. **Mesaj, şiyarbûyîna gelê kurd e.** Zarokên kurd jî welatparêz in, natirsin, liberxwe didin û heta şehîd dikevin.

"Dêran Dêran" çîroka duhem e. Behsa dema şêx Seîd dike. Di wê serhildanê de lehengekî heye. Navê wî Hesen Keya ye. Piştî têkçûna serhildanê jî liberxwe dide. Teslîm nabe. Dijmin ji wî pir ditirse. Di dawiyê de, Hesen Keya bi mêranî şehîd dikeve. Mesaj, berxwedana lehengekî kurd e.

Çîroka sêhem **"Heciyê bêsinet"** e. Hecî Emîn jî nesîbê xwe ji zîndanê digire. Zordar lê îşkence dike. Ew tazî dikin û dibînin ku waye Hecî bêsinet e. Dibêjin ku ew ermenî ye. Hecî napejirîne. Pir lê didin. Hecî dibêje ku ew kurd e. Ev car jî, ji bo ku kurd e lê îşkence dikin. **Mesaj: Neyar dixwaze hin kurdan wek ermen bibînin. Nefret wan ji ermeniyan heye. Ji navê kurd jî aciz in.** Kesên ji dinyayê bêxeber jî, di zîndanan de, bi danûstandinên bi girtiyên siyasî re dibin şoreşger û liberxwe didin.

Mesaja çîroka çarhem jî ev e: Dagîrker li ser navê îslamê kurdan dixapîne. Fen û dekên îraniyan nîşan dide.

Lî ser pirtûka "Xwîn û Hêstirên Çavan"

Di dorê de **"Şeytanokên Hizbil - Kontra"** heye. Di vê de jî em dibînin ku zordar tirsonekê kurd çawan dike kontra. Pere didin Casimî û dixwazin wî bikar binin. Dixwazin merivekî Casimî bi Casimî bidine kuştinê. Di dawiyê de Casim wî merivê xwe, Zekeriyayî, ji vê yekê xebardar dike. Casim û Zeke-riya diçin Enqerê û ji mebûsekî kurd re dibêjin. **Mesaj: Rûreşiya dewle-ta tirk derdikeve meydânê.**

Çîroka **"Lezgîn û Polîs"** jî, li ser zilm û zordariyê ye. Lezgîn bi şev ji mala birayê xwe têtê. Polîs wî digrin û lê îşkence dikin. **Mesaj: Di bin îşkenceyê de, piraniya kurdan dibin şoreşger û liberxwe didin.**

Çîroka heftan **"Şêx û Xulam"** e. Di vê çîrokê de hîle û deken şêxekî li Kurdistanê heye. **Mesaj, li ser navê olê, bikarhanîna gundiyan e.**

"Qanser" jî problemeke di nava civata gundiyan kurdan de derdixe holê. çîrokeke sosyal e. **Mesaja wê jî şiyarbûna gundiyan e.** Lê bedela vê şiyarbûnê jî heye û giran e.

"Sitar" kurteçîroka nehan e. Di vê çîrokê de behsa jiyana kalekî kurd Wuso heye. **Welatparêzî derdike-ve pêş.**

"Genimê Sofî" weke pêkenokekê ye. Erdhej çêbûye. Brîndar li ser genimê Sofî hatine dirêjkirin, lê Sofî ketiye derdê genimê xwe.

Di dora yanzdehan de **"Bawerî"** heye. Bi çavên biyaniyan zor û hovîtiya artêşa tirk û neçariya kurdan heye. **Mesaj: Zilm û zordariya dewleta tirk ji gumana biyaniyan mezintir e.** Biyanî tên bi çavên xwe dibînin û şaş û mat dimînin li vê barbariya dewleta tirkan.

"Perûk" jî, ji kurteçîrokê bêhtir mînanî pêkenokekê ye. **Mesaj welatparêzî ye.** Lê nezanî jî derdikeve pêş.

Di **"Kevçiyê Mele Necmedîn"** de mesaj, nebawerkirina kurdan ji siyasethanên tirkan e. Siyasetvanên tirk, kurdan dixapînin, derewan dikin.

"Xezeb" çîrokan çardehan e. Di vê çîrokê de çend kurd hene ku li nig Fîlîstîniyan talîma şerî dibînin. Şerê di navbera Fîlîstîniyan û

Li ser pirtûka "Xwîn û Hêstirên Çavan"

Îsraîliyan de bi dijarî berdewam dike. Mesaj, gerîlayên kurd beriya şerê çekdarî li Kurdistanê destpê bike, diçin Filîstînê û xwe amadeyî şer dikin e.

Di rêza panzdehan de "Elegê Hesin" heye. Di vir de tekoşîna gelê kurd ya bi Hizbullah re hatiye zimên. Ji bilî leşker û polîsên tirk, tevgerê bi navê Hizbullah jî bûye bela serê kurdan. Her roj welatparêzan qetil dikin. **Mesaja vê çîrokê jî îsbatkirina t êkîliyên hizbullah ya bi polîsên tirk re ye.**

"Evîndariya Behrê" jî mînanî çîroka "Xezeb" li Libnanê derbas dibe. Hezkirina avêheye di vir de. **Mesaj, rizgarkirina sê kesên li ber xeniqandinê ye.** Yek Filîstînî ye û yê din jî, yekî tirk e. Dema rizgarkirina yê tirk mînanî pêkenokê ye. Di rêza hîvdehan de "Em ê wî bikin artist" heye. Dema 12 îlonê dinirxîne. Zor û zordariya dewleta tirk derdikeve pêş. Mesaj bi kurtahî eve e.

"Sînor" di rêza hîjdehan de ye Haşim ji neçarî bûye qaçaqxçî. Welatparêze û welatparêzan dibe û tîne. Dewlet dixwaze wî bigire. Malbata wî dixwaze bi wî re here. Haşim biryar dide ku cara dawî jin û zarokên xwe bi xwe re bibe. Li ser

tixubî şer derdikeve. Keça Haşim brîndar dibe û kurê wî şehîd dikeve. Haşim liberxwe dide û bi leşkeran re şer dike. Paşê ew jî şehîd dikeve. **Mesaj, hovîtiya dewleta tirk ya li ser kurdan e.**

Di rêza nozdehan de "Wahşet û talan" heye. Malbatek kurd rola sereke dileyîze. Jinik bi hemil e. Kurekî wan heye. Mêhvan têne mala wan. Polîsên tirk êrîş dibin ser wan. Şer derdikeve. Ji bilî jinikê û kurikê wê, tev têne kuştin. **Mesaj, barbariya polîsên tirk e.** Heta ku zaroka di zikê jinikê de jî dikujin.

"Çawan bû qehpik" çîrokeke sosyal e. Behsa t êkîliyên di navbera xortekî kurd û keçeke tirk de dike. Bûyer li Libnanê derbas dibe. Xortê kurd siyasî ye, lê keçika tirk bi xapandin ketiye nava lepên jinfiroşan û hatiye di Libnanê re derketiye. Bi kurtahî, xortê kurd alîkariya jinika tirk dike. Riya revê nîşanî wê dide. **Mesaj: Ev çîrok ji çîrokên dine cuda ye. Lê sosyal e û divête were xwendin.**

Çîroka "Tirsonek" ya bîst û yekan e. Behsa Rewanî û bûyera şerê çekdariyê dike. Rewan mirovekî tirsonek e lê xwe m êr nîşan dide. Lê pir naçe tirsonekiya wî derdekive meydanê. **Mesaj: Divête**

Li ser pirtûka "Xwîn û Hêstirên Çavan"

ku mirov li gotinan nenihêre, li kirinan binihêre û mêraniyê û tirsonekiyê bi vî awayî binase.

"Xwîn û Hêstirê çavan" kurteçîroka bîst û duduyan e. **Çirokeke bi mesaj e. Yanî mesaja wê pir e.** Rewşa kurd û Kurdistanê bi zimanekî xweş dide ber çavan. Bûyera nivîskarekî Swêdî ye ku di Newrozê de diçe Kurdistanê, serîhildanê bi çavên xwe dibîne û ew jî, ji zilm û tadeya polîsên tirkan nesîbe xwe digire. Li wî îşkence dikan. Paşê tête berdan. Lê hal jî di wî de nemaye. Di zîndanê de dibe şahidê îşkenceyan. Mesaj bi kurtahî ev e: Bi çavên biyaniyan îspatkirina zor û hovîtiya dewleta tirk ya sistematîk ya ku li ser gelê Kurdistanê ye.

Çîroka dawî "Alo Kurdistan" e. Bûyera ku di serê xortekî kurd re derbas dibe me car din di hizirîne. Ji serî hetanî dawî me dît ku di hemû çîrokan de mesaj hene. L. Polat di her çîrokek xwe de mesajek dide xwendevanan. **Di vir de jî mesaj:** Xortên kurd bêsûc têne girtin û di îşkenceyan re derbas dibin.

Çend gotin: Weke li jor nimandî, hemû kurteçîrokên ku birêz Lokman Polat di pirtûka "Xwîn û Hêstirê

çavan" de berhev kiriye, mesajên nêzîkî hevûdu didin. Ji xwe, weke nivîskarekî kurd û welatparêz ne gengaz e ku mirov çavên xwe ji bûyerên li Kurdistanê re bigire. Ev bûyeranan jî tev zilm û zordarî û hovîtiya dewleta tirk in. Tu tiştekî xweş nehiştine ku mirov ji kurteçîrokên xwe re bike malzeme. Li dij faşîzma dewleta tirk, berxwedaneke bêtarîf jî heye. **Ji xwe zordarî û berxwedan di hemû çîrokan de bi hev re dimeşin.** Ev pirtûk xebateke hêja ye û ez Lokman Polatî car din pîroz dikim.

Lokman POLAT

EVÎNÐAR

Nûh derket

Bixwînin

Weşanên
Çanda Nûjen

OSMAN SEBRÎ Û ÇAR LEHENG

(*Danasîna Pirtûka Çar Lehengan*)

Osman Sebrî, di meha 10 a 1993 de çûbû ser heqiya xwe. Osman Sebrî 5-1-1905 an de, li gundê Narîncê yê qeza Kahtayê (Adiyamanê) hatibû dinê. Ew di roja 11.10.1993an de wefat kiribû. Osman Sebrî ji malbateke welatparêz dihat. Di serîhildana Şêx Seîd de, du apên wî hatin dardakirin. (îdamkirin).

Osman Sebrî, him helbestvan(Şaîr - Ozan) û him jî zimanzan bû. Wî di hêla zimên, çand û edebiyatê de xebatên pir hêja kir. Osman Sebrî, rêkoşerekî bêhempa bû. Wî di serîhildanê Kurdan yê berê de cîh girtibû. Wî di nav Xoybûnê de kar û xebata siyasî dikir. Di kovara Hawar(1932), Ronahî(1943), Roja Nû(1943), Hêviya Welêt(Awropa-1963), Çiya(Awropa-1966), Hêvî(Parîs-1983), Berbang(Swêd-1983), Roja Nû(Swêd 1979) de nivîsên wî derdiketin. Osman Sebrî di van kovaran de nivîsên pîrcure nivîsibû. Wî li ser adetên(tradîsyon)Kurdan û serpehatî û çîrokên dirokî nivîsibû.

Berhemên Osman Sebrî yê çapkirî ev in:

- 1- Apo, "Gotinên xav nepijîn bê tav" Almanyay, 1981
(Hemrêş Reşo, amadekiriye û çap kiriye)
- 2- Elîfbêya Tikuz, 1982
- 3- Çar Leheng, 1984 - Şam- 40 rûpel.
- 4- Bahoz û çend nivîsarên din, 1956 - 68 rûpel
- 5- Elîfbeya Kurdî, 1955- Şam- 56 rûpel
- 6- Derdên me (gotar û helbest)

ÇAR LEHENG

Pirtûka Osman Sebrî ya bi navê "Çar Leheng" pirtûkeke piçûk e. 40 rûpel e, lê bi naveroka xwe ve pir mezin e, dewlemend e.

Di pirtûkê de mîrxasiya çar lehengên(qehreman)Kurd bi zimanekî xweş û li gor realîstiyê tîne zimên. Osman Sebrî, di pirtûka xwe de Lehengiya

ÇAR LEHENG

Ferzende, Seyîdxan, Remezan û Adil Beg qal dike. Lehengên yekemîn Ferzende di Kurdistana Bakûr de, di herêma Serhedê de bi nav û deng bû. Hêj jî dengbêj li ser wî û mêraniya wî keleman disitirin. Di dîroka Kurdan de şerê gêliyê Zîlanê cîhêkî girîng digire. Ferzende bi quwetekê hendik, bi wê hêza xwe ya piçûk zora askerên(Leşkerên) Ordiya Tirk bir û wan di şer da şikand.

Ferzende û hevalên xwe diketin kîjan şerî bi serdiketin, askerên Tirkan ji ber wî direviyan. Ordiya(artêşa)Tirkan bi Ferzende û hevalê wî nikaribû, diçûn bi gundiye reben dikaribûn.(Eynê wek îro, bi gerîlla nikarin diçin gundan dişewitînin.) Ordiya Tirk di wê demê de 80 gund ê herêma Zîlanê şewitandin.

Lehengê duyem, Seyîdxan jî pir mêrxas bû. Ew jî bi nav û deng bû. Jê re digotin Seyîdxanê kerr. Ew jî bi hezar askerî re diket şer û wek şer û pîlîngan bi mêranî şer dikirin. Askerê Tirkan nikaribûn Seyîdxan bikujin. Seyîdxan û hevalên xwe ji herêma Serhedê hatin ku derbasê bin xetê bibin. Wexta ku di ber gundekî de derbas dibin, di wê gundî de dehwet (dîlan) heye, mêrê gund li ser xaniyê gund civiyane û bi tîfîngan davêjin nîşanê. Ji gundiya yek dibîne ku di alî çiyê de quflêk sûwarên hespan di kendalê çiya de, wê alî ve diçin. Seyîdxan suwarê hespê sipî buwe û li pêş buwe. Mêrikê gundî ji yên dora xwe re dibêjê“Binêrin, ez dê nîşana sûwarê hespê sipî bigrim, ka karim pêvedim an na.” mêrik gule berdide û gule diçe li Seyîdxan dikeve û ew tê kuştin.(Kuştina Seyidxan ji alî me ve hatiye nivîsîn. K.H.)

Lehengê sêyem,Egîd û pelewana, Remezan rojek di gund de ye. Askerên davêjin ser gund. Ew di malek da ye. Asker çarmedorê gund digirin. Di nav wan de şerekî dijwar dest pê dike. Remezan wisan taqîqê şer bi kar tîne ku, pirê askeran dikuje û bi saxîti jî ji nav gund xilas dike, diçe.

Lehengê çarem, Adil Beg û birayên xwe jî, di ew demê de bi mêrxasî li dij dijminê gelê Kurd, li dij dewleta Tirk a dagirker şer dikin. Şer û mêraniya wan jî di wê herêmê de belav dibe.

Neteweyên bindest hewcedariyên qehremaniyê(Lehengiyê) ne. Milletê (Netewê) Kurd jî her dem ji nav xwe qehremanên(Lehengên) bi nav û deng derxistiye. Pirtûka Osman Sebrî, Çar Leheng pirtukek baş e, divê careke din bê çapkirin û belavkirinê. Divê pirtûk bikevê destê xwendevanê nûh û hemû Kurd wê bixwînin. 

Dastana Neteweyî ya Kurdî

“MEM Û ZÎN”



Hozan û bîrewerê Kurd ê nemir Ehmedê Xanî, “MEM Û ZÎN” di sala 1695’an de nivîsiye û ew wek dastanek ji gelê Kurd re mîras hîştiye. Ev pirtûka gewre, bûye Dastana Meteweyî ya Kurdî.

Nivîskarê Kurd M. Emîn Bozarslan, sê sal li ser “MEM Û ZÎN”ê xebitî û ew hem ji tîpên Erebi wergerand tîpên Latînî, hem jî wergerand Kurdîya xwerû (sade) û Kurdîya wê ya orîjînal digel Kurdîya wê ya xwerû çap kir û gîhand destê xwendevanê Kurd. Bi vî awayî, cara pêşîn ji xwen-

devanê Kurd re îmkana çêbû ku dastana xwe ya netewî bi Kurdîya xwerû bixwîne û fam bike.

Bozarslan, jibo “MEM Û ZÎN”ê “Pêşkêşî”yeka dirêj ji nivîsî û tê da hem Ehmedê Xanî, hem jî “MEM Û ZÎN” da naskirin. Ev “Pêşkêşî” 110 rûpel e û ji 6 beşan pêkhatiye.

Bozarslan li ser “MEM Û ZÎN”ê ji 1000’î zêde jêrenot ji nivîsîn û hin bûyer, hin tarîx, hin nav, hin babet û wd. yên ku di pirtûkê da cî girtine, bi wan jêrenotan zelal kirin û gihandin ronayîyê.

Bozarslan, piştê xebateka weha dirêj û fire û gurr, “MEM Û ZÎN” di 300 saliya wê da ji nû ve çap kir û gîhand destê xwendevanê Kurd. Ev pirtûka dêw 703 rûpel e.

Gelî xwendevanên Kurd!

Dastana neteweyî MEM Û ZÎNê bixwînin.

Navnîşana Xwestinê Ev e:

Weşanên Deng

P. O. BOX- 3050

S-750 03 UPPSALA

SWEDEN

PIRTÛKXANEYA KURDÎ DEWLEMEND DIBE

Pirtûkxaneya Kurdî her diçe dewlemend dibe. Van demên dawî gelek pirtûkên nûh yên xwerû bi Kurdî û gelek pirtûkên wergerê tête weşandin. weşanxaneya Nûdemê heşt(8) pirtûkên nûh li pirtûkxaneya Kurdî zêde kir. Ji van heşt pirtûkan sê pirtûk yên wergerê ne, pênc pirtûk jî yên nivîskarên Kurd in. Pirtûkên ku weşanxaneya Nûdemê nûh weşandiye ev in:

PIRTÛKÊN WERGERÊ:

1– Albert CAMUS - BIYANÎ

Ev pirtûk jî alî Dr. Fawaz Husên ve hatiye wergerandin. Roman e. Nivîskarê pirtûkê Albert Camus, romana xwe li ser biyanîtiyê honandiye.

2– Jack LONDON - ZAROKÊN ŞEVÊ

Nivîskarê Amerîkî yê bi nav û deng Jack London gelek berhemên baş yên edebî afirandiye. Wî di çil sal jiyana xwe de 50 pirtûk nivîsiye. Pirtûka wî ya bi navê “Pahniya Hesinî - Demir Okçe - ” jî alî hemû şoreşgeran ve dihatin xwendin, û hêj jî tê xwendin. Li ser gelek nivîskaran tesîra stîla nivîsîna Jack London çêbûye. Çîrok û romanên wî gelek baş in.

Pirtûka Jack London “Zarokên Şevê” jî alî Mustafa Aydoğanî ve hatiye wergerandin. Di pirtûkê de sê çîrok hene. Navê çîrokan 1-zarokên Şevê 2- Xwêdana Eniyê 3- Yê Meksîkî ye. Wergervan Mustafa Aydoğan li ser jiyana û berhemên Jack London pêsgotinek nivîsiye.

Pirtûkxaneyê Kurdî Dewlemend Dibe

3- Antoine de Saint-Exupéry - Mîrzayê Biçûk

Ev pirtûk ji bo zarokan e. Nivîskarê pirtûkê Fransî ye. Dr. Fawaz Husên pirtûkê wergerandiye Kurdî. Ji bo edebiyata zarokan berhemek gelek baş e. Nivîskar di edebiyatê de xeyalê bi metodek zanîstî bi kar aniye.

PIRTÛKÊN NIVÎSKARÊN KURD

1- Firat CEWERÎ - KEVOKA SPÎ

Ev pirtûk ji heşt kurteçîrokan pêk hatiye. Çapa duyem e. Çapa yekem a vê pirtûkê di sala 1992an de li Ankarê hatibû weşandin. Firat Cewerî di nivîsîna kurteçîrokan de metodek modern bi kar aniye. Wî bi xeyalên gelek fireh bûyerên çîrokan honandiye. Kurteçîrokên gelek baş di vê pirtûkê de hene. Divê xwendevanên Kurd vê pirtûkê bixwîne.

2 - Firat CEWERÎ - GIRTÎ

Ev pirtûk jî pirtûka kurteçîrokan e. Ev jî çapa duyem e. Çîrokên di vê pirtûkê de hatine weşandin berê di hinek kovarên Kurdî de hatine weşandin. Di pirtûkê de panzdeh(15) kurteçîrok hene. Nivîskar Husên Duzen heft rûpel pêşgotinek nivîsiye. Sernavê nivîsê "Firat Cewerî û Çîrokên Wî" ne. Pêşgotinek balkêş e.

3 - Rojen BARNAS - MILKÊ EVÎNÊ

Pirtûka helbestan e. Di pirtûkê de pênce û du (52) helbest hene. Ev pirtûka sêyem ya helbestên Rojen Barnas e. Pirtûka wî ya yekem bi navê "Li Bandeva Spêde" di sala 1979an de derketibû. Ya duyem jî bi navê "Heyv Li Esmanê Diyarbekirê" di sala 1983an de derketibû. Çend helbestên Rojen Barnas ji alî hozan Ciwan Haco ve wek stran têt strandin.

Pirtûkxaneya Kurdî Dewlemend Dibe

4 – Yaşar KAYA - GOTIN

Yaşar Kaya nivîsên xwe yên ku di rojnameya hefteyî WELAT de weşandibû civandiye û kiriye wek pirtûk. Hemû nivîsên wî meqaleyên kurt in. Nivîs hemû jî nivîsên siyasî ne. Di nav nivîsên - meqalên - wî de nivîsên edebî tune ne. Ji van nivîsan gelek jê nivîsên rexneyî ne.

5 - Xelîl DIHOKÎ - ANTOLOJIYA ÇÎROKA NÛ YA KURMANCÊN BAŞÛR

Amadekarê pirtûkê Xelîl Dihokî Kurdî ji Kurdistanê Başûr e. Wî bîst çîroknivîsên Kurdên Kurdistanê Başûr yên ku bi zaravayê Kurmancî dinivîsînin berhev kiriye.

Xelîl Dihokî, di vê pirtûkê de jiyana bîst çîroknivîsên Kurd nivîsiye û her yek kurteçîrokek wan weşandiye. Xelîl Dihokî di pêşgotina xwe de diyar dike ku : “Armanca me danasîneke çîroka nû ya Kurmancên başûr e”

Xelîl Dihokî, navê pirtûka xwe çira “Antolojiya Çîroka Nû Ya Kurmancên Başûr” daniye, çira “Antolojiya Çîroka Nû Ya Kurdên Başûr” daneniye?

Kurmancî, Soranî, Zazakî(Dimilî), Goranî, navê zaravayên Kurdî ne. Navê neteweyî nîn e. Navê neteweyî Kurd e. Divê bigotana “Antolojiya Çîroka Nû Ya Kurdên Başûr Bi Zaravayê Kurmancî”

Xelîl Dihokî xeletiyek din jî dike, dibêje : “Ji ber ku Kurmancên başûr jî mîna Kurdên Tirkîyê firsenda perwerdeyîyê bi Kurmancî nedîtine...”

A yekem: Gotina “Kurdên Tirkîyê” xelet e. Kurd Kurdên Tirkîyê nîn in, Kurdên Kurdistanê ne. Yan jî Kurdên Kurdistanê bakûr in.

A duyem: Bi navkirina “Kurmancên başûr û Kurdên Tirkîyê” Xelîl Dihokî xeletî dike. Çira Kurmancên başûr? Çira Kurdên başûr na? Çira Kurdên Tirkîyê? Çira Kurdên Kurdistanê - an jî Kurdistanê bakûr na?

ZAROKÊN BERSÎVDAR

R. Berström / H. Söderblöm

Richard Bergström vê çîrvanokê di sala 1911an de nivîsiye. Ev çîrvanok ji aliyê H. Söderblöm ve di sala 1985an de bi şeweyekî nû ji nûh ve hatiye nivîsîn.

Hebû tunebû, merivekî vîrek û deyndar hebû.

Wî pere ji dewlemendekî deyn kiribû; dikir nekir nikaribû deynê xwe bidaye. Rojekê dewlemend tê mala deyndarî û deynê xwe jê dixwaze. Hingê deyndar ne li malê bû, kurê wî li ber pêjerê(ocax)rûniştibû. Yê dewlemend ji kurê deyndarî pirs kir û got:

- Tu çi dikî, kuro?
 - Ez deyndaran dihejmêrim, dibînim çend kes tên û diçin.
 - Qey xelq pir tê mala we?
 - Beniyekî Xwedê jî nahê.
 - Bavê te li kêderê ye?
 - Ew çûye ji bo ku qulekê bi qulekê din bigire.
 - Diya te çi dike?
 - Ew nanên ku me xwariye çêdike.
 - û xwîşka te?
 - Xwîşka min digirî ji bo ku rewşa me par baş bû û îsal xerab e.
 - Tu weke şeytanan xeber didî. Ji apê xwe re rast bibêje, bavê te li kêderê ye?
 - Heger tu deynê xwe ji bavê min nestînî, bila be.
 - Heger ez qîma xwe bi bersiva te bînim, hingê bavê te ji deynê min rizgar dibe.
 - Belê, ez li rûdinim û fasûlyeyên gundiyan dikelînim. Dema ku di beroşê de dikelin bilind û nizim dibin. Bavê min çûye ji bo ku pere deyn bike û bîne bide te; ew qulekê bi qulekê din digire. di van rojên dawiyê de nanên ku me xwariye, me ew ji cîranan deyn kiriye. Niha diya min nanên ku me xwariye çêdike. Û par daweta xwîşka min bû. Ew pir kêfxweş bû. Lê niha mêrê wê jê nebaş û li xwîşka min dixê.
- Pê re ji got bila perê min ji te û bavê te re xweş helal be û berê xwe da malê.
- Ji **Swêdî** hatiye wergerandin

Danasîna Kovarên Kurdî - 1

“ KOVARA ŞANO Û SÎNEMA ”

Senar Şahîn

Li Ewropayê edebiyatnasên Tirkî hemû kovarên xwe yê edebî, çandî û hunerî li Almaniyayê diweşînin. Yê Kurdan jî li Swêdê têne weşandinê. Mirov gava kovarên edebî yê Tirkî û yê Kurdan dide berhev, kovarên edebî yê Tirkî gelek in. Lê yê Kurdan hindik in.

Kovarên edebî yê Tirkî ku li Almaniyayê tênê û hatine weşandin ev in: Yabanel, Parantez, Ezgî, Dergî, Dîrenîş, Yazın, Tohum, Guney, Arkadaş, Sanat, Oluşum, Kırmızı Gul, Kuşlama, Yaprak û hwd.

Kovarên edebî, çandî û hunerî yê Kurdan (Yê Kurdên ji Kurdistana Bakûr) hemû ev in: Roja Nû, Nûdem, Hêvî, Şano û Sînema, Helwest, Çira û Rewşen in. Kovara Rewşenê berê li Swêdê derdiket, nûha carna - ne periyodîk - li Stenbolê derdikeve. Kovara Govendê jî, kovarek çandî û edebî ye. Li Amedê derdikeve. Em dê li ser kovara Govendê jî nivîsek danasînê di hejmarên kovara Helwest yê pêşerojê de biweşînin. Kovarên din jiyandina xwe ya weşanê didomînin. Ez dê bi kurtayî li ser van kovaran bisekinim û li ser van kovaran nivîsên danasînê binivîsînim. Ev kovarên ku min li jor bi nav kirin

kovarên çandî edebî ne. Gelek kovarên Kurdan yê lêkolînî û meslekî jî hene. Kovarên Jin û Xortan hene. Ez dê di hejmarên pêşerojê de li ser van kovarên din jî nivîs binivîsînim, kêmanî û xeletiyên wan û tiştên wan yê serketî, yanê hem aliyê wan yê pozîtîf û hem jî yê negatîf binivîsînim. Di her hejmarê kovara Helwestê de ez dê li ser kovarek bisekinim. Di vê hejmarê Helwestê de ez bi kovara Şano û Sînema dest pê dikim.

Kovara Şano û Sînema

“Şano û Sînema” kovara şanoyî û sînemayî ye. Kovara “Şano û Sînema” di beşa xwe de kovarek nû ye, kovarek taze ye. Ji bo nûhderketina vê kovarê min nivîsek danasînê nivîsand û ew nivîs di rojname Rojê de derket. Di hêla weşanê şano û sînemayî de valahiyek hebû. Bi weşandina vê kovarê pir hendik be jî dê ev valahî bê tijîkirin. Kovara Şano û Sînema li gor babetên şanoyî û sînemayîyê ji alî naveroka xwe ve başe. Ev kovar hetanî niha 3 hejmar derketiye. Ev kovar ji alî zimên ve jî baş in. Nivîsên ku di

Danasîna Kovarên Kurdî

kovarê de hatine weşandin li gor metoda tewandina rêzimanî hatine rastkirin û weşandin. Lê ji alî teknîkî û mîzampajê ve herdu hejmarên kovarê yên pêşîn gelekî qels in. Çapa herdu hejmaran (hejmar 1 û 2) jî baş nehatiye kirin. Nivîsên têde bi tîpên mezin hatiye nivîsandin û rûpelên kovarê hatiye wermandin. Kovara Şano û Sînema hejmara yekem 28 rûpel e, lê ku mirov teknîkek baş, bi mîzampajek xweş û bi tîpên normal kovarê amade bike, kovar dibe 20 rûpel. Wê gavê hîn zêde nivîs diçin pê(ku kovar tim 28 rûpel be).

Kovara “Şano û Sînema” kovarek xêzikî nîn e. Rûpelê wê ji hemû welatparêzî re vekiriye. Kijan nivîskarên welatparêz (endamê partî û rêxistinên, an jî yên serbixwe) bixwazin dikarin nivîsên xwe di vê kovarê de biweşînin. Kovar rê li ber tu nivîskarekî nagire. Kovara şano û sînema rûpelên xwe ji hemû nivîskaran re vekirî ye.

Kovara Şano û Sînema hejmara sêyem ji hejmarên çûyî çêtir e. Ji alî naveroka xwe ve ji hejmara 1 û 2 dewlemendtir e. Ji alî teknîk / mîzampajê ve ji yên berê baştir e. Ji alî çapê ve jî ji yên berê rindtir e. Bergê jimara sêyem jî ji bergê hejmarên çûyî baştir bû. Di berga pêşîn de wêneyek ji filma “Yol - Rê” heye. Li jêrê wêneyê jî navê nivîskar

û nivîsên ku di vê hejmarê de ne heye. Di berga paşîn de jî anonsa kovara çand û edebiyata Kurdî, kovara HELWESTê heye. Anonsa kovara Helwestê bi teknîka grafîkê gelek baş hatiye amadekirin.

Nivîsên ku di hejmara sêyem de ne evin:

- 1- Çend gotin li ser hunera şanoyê - Lokman Polat - (Rojnameya Ozgur Politika pesnê vê nivîsê da)
- 2- Fîlm û projeksiyona Fîlmê-werger - M. Yilmaz
- 3- Mem û Zîn û Pîremerdê Nemird - Mehabat Kurdî
- 4- Yên Revok - Werger - R. Rewşen
- 5- Text - Soranî - Saîd Çiyan
- 6- Şivonê Bizêkon - Z. Şêxmûs
- 7- Şano jî Xebateke Netewî û Civakî Ye - Îsa Kaya
- 8- Çend Peyvên Yûnanî û Wateya wan a Dîrokî
- 9- Verg û Hot Bizêkî - Zazakî
- 10- Mela Yusifê Silopî - Mela Beşîr

Kovara “ Şano û Sînema ” bi çerçeva hunerê ve sînorkiriye. Weşandina kovarên weha bi sînorkirî gelek zehmet e. Hemû nivîsên kovarê divê yên şanoyî û sînemayî be.

Ji weşandina kovarên weha re gelek kadroyên teknîkî û hunerî pêwîst e. Divê ew kesên ku bi hunera şano û sînema re mijul dibin kovarên weha biweşînin, ne kesên amator.

ANONSA PIRTÛKÊN KURDÎ

Lokman Polat

EVÎNDAR

Weşanên
ÇANDA NÛJEN
* * * *

Mehmed Uzun

BÎRA
QEDERÊ

Weşanên
AVESTA

Rohat Alakom

General
ŞERÎF PAŞA

Weşanên
APEC

Ferhad CAN

GULA ÇILE

Weşanên
DENG

A. GERNAS

ZEMBÎLFIROŞ

Weşanên
ROJA NÛ

Firat Cewerî

GIRTÎ

Weşanên
NÛDEM

Adîl Duran

DÊRSÎM
Destan

Weşanên
Çanda Nûjen

Îhsan Çûlemergî

CEMBELÎ
(Kurê Mîrê
Hekaryan)

Weşanên
APEC

Dr. Abdulla
Ghafor

Bîbliyografya
KURDISTANÊ
1903 - 1995

Amadekar
Xelîl Duhokî
ANTOLOJÎYA
ÇIROKA NÛ YA
KURMANCÊN
BAŞÛR
Weşanên
NÛDEM

Beşîr Botanî

HEYRANOK

Weşanên
APEC

Lokman Polat

MÊRXAS
(serpêhatiyên
Kurdî)
Weşanên
ÇANDA NÛJEN
* * * *

Pirtûkên Kurdî Bixwînin! Ji bo jiyandina çand û edebiyata
Kurdî bixebitin, berhemên Kurdî biafrînin.

HELWEST — Kovara Çand û edebiyata Kurdî

Dostoyevskî
MERIVÊN REBEN

Þirtûkên wergerê

**Bi zimanê Kurdî xwendina nivîskarên cîhanê
gelek başe û pêwîst e. Hûn jî bixwînin!**

BIYANÎ – Albert CAMUS - Roman

ŞEVÊN SPÎ – Dostoyevskî – Roman

BEXÇEYÊ VÎŞNE – ÇEXOV – Piyes

MIŞK Î MIROV – John Steinbeck –

LI BENDA GOGOT – Samuel Becket

KEÇA KAPÎTAN – Pûşkîn - Roman

KURTEÇÎROKÊN BIJARTE – Çexov

ZAROKÊN ŞEVÊ – Jack LONDON

MÎRZAYÊ BIÇÛK – A. S. Exupêry

Hûn van pirtûkan dikarin ji weşanxaneya

ÇANDA NÛJEN bixwazin.

Navnîşana Xwestinê : Tensta Alle 43-2tr. 16364 Spanga /Sweden

Tel / Fax : 08 - 7618433

HELWEST

Kovara Çand û Edebiyata Kurdî
Hejmar / No: 3 – Sal / Year - Adar - 1996

**DASTANA NETEWEYÎ YA KURDÎ
MEM Û ZÎN**



Helwest = ISSN – 1400 - 9404

Helwest - Hejmar / No: 3 Sal / Year - Adar - 1996